## JIYAN



### Tenê li vê dêrê ayîn tê kirin

**LI** Diyarbekirê niha tenê dêreke Suryaniyan a bi navê Dêra Qedîm a Dayika Meryem maye ku bi awayekî aktîf cemeata Suryaniyan her hefte ayînên xwe li wir pêk tîne. Ev dêr li navçeya Sûrê li taxa Lale Bey e û dîrokeke wê ya gelekî kevn heye. Keşeyê vê dêra qedîm ji Basê re axivî. **RÛPEL 06**

## KIRMANCKÎ



### Çekuyê Veşayeyî

**NIKA** Dêrsim de dar-ber, kemer-kuç jîveno û kes nêeş-naweno. O cayo ke kitabê şima yo muqeddesî de ci ra sey cenet behs keno, Uca Dêrsim o. Dêrsim cenetê ma yo. Cayê her kesî, cayê her rûhî Dersim de esto. Şima ke rûhê şima zereyê adirî de veşeno; şima nêzanenê ruh çî yo, veşayîş senîn o. **RÛPEL 10**

## EDEBIYAT




### Keda 11 salan: Weşanxaneya Do

**WEŞANXANEYA** Do jî ku ev heyameke dirêj e xebat û xizmeta xwe ya ji bo ziman, wêje, çand û hunera Kurdî berdewam dike, ji ber rewşa heyî pirsgirêkên aborî dijî û di rojên zor û zehmet re derbas dibe. **RÛPEL 13**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 32
24 TEBAX 2017
www.basnews.com




TÊKILIYÊN HEWLÊR - TEHRANÊ R2

# ÎRAN NIKARE SÎNORÊN XWE BIGIRE

### > HERDU ALÎ WÊ OFÎSÊN XWE YÊN BAZIRGANIYÊ VEKIN

Ev heyameke dihat îdîakirin ku Îran wê sînorên xwe yên li gel Kurdistanê bigire û wê ambargoyê bi ser Kurdistanê de bisepîne. Lêbelê bi nêzîkbûna roja encamdana referandûmê re jî tê dîtin ku pêwendiyên di warê aborî û bazirganiyê yên di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de berovajî angaştan her ku diçe xurt dibin û protokolek jî hatiye îmzekirin.

### > "ÎRAN NIKARE SÎNORAN LI SER KURDISTANÊ BIGIRE"

Li gor zanyariyên berdest eger Îran ku niha weke li dijî referandûmê ye tê dîtin, deriyên xwe yên sînorî li ser Herêma Kurdistanê bigire ji her du aliyan zêdetirî 5 milyon kes wê bê kar û xebat bimînin. Pispor radigihînin ku Îran nikare sînorên xwe yên bi Kurdistanê re bigire û bazirganiya di navbera her du aliyan de her ku diçe zêde dibe û qut nabe.

Rojnameger Nevzat Çiçek:

## Tirkiye û Kurdistana serbixwe wê bibin du cîranên baş

Rojnamegerê nêzîkî Hikûmeta Tirkiyeyê Nevzat Çiçek, li ser referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê, helwesta Tirkiyeyê ya li hember referandûmê, polîtîkayên Tirkiyeyê ên li hember egera dewleteke serbixwe ya Kurdan û kêşeya Kurdî li Tirkiyeyê bersiva pirsen me da. Çiçek destnîşan dike ku Tirkiye li hidûdê xwe li hember dewleteke Kurdî dernakeve û wiha didomîne: "Tirkiye nikare Herêma Kurdistanê ji dest bide. Nikare vê yekê bide berçavan. Wê nexwaze herêm têkeve bin bandora Îran, Brîtanya û DYAyê. Hikûmeta navendî ya Iraqê jî bertekên tund nîşan nade."



R3



**EKREM ÖNEN** >02

Serdana serokerkanê Îranê a Tirkiyê: 3 Qolî dibe 2+1?



**HOŞENG OSÊ** >03

Dema PKK-PYDê kirasê Erdoğanizmê li rikberên xwe dikin



**FIRAT CEWERÎ** >06

Ez dinivîsim loma ez heme

BAJARÊ QEDÎM HESKÎF R04



### Dîrokeke 12 hezar salî ji holê tê rakirin

Heskîfa ku bi vegûhestina bermamiyiyên dîrokî ketibû rojevê niha jî ji bo zinarên ku ji cihê xwe liviyane bînin xwarê dînamîtan dikin bin van deran û bi vî awayî li aliyekî zinaran xira dikin û li aliye din ew cihên dîrokî ji ber van teqemeniyan xisareke mezin dibînin. Heskîf xwedî dîrokeke 12 hezar salî ye û daxwaz tê kirin ku ev warê qedîm bê parastin.

HAYA WE JÊ HEYE? R05



### Temenê bikaranîna madeyên hişber daketiye 10an

Li gor daneyên dawî yên Neteweyên Yekbûyî li cîhanê hejmara kesên madeyên hişber bikartînin giheştiye 29 milyon û nîvan. Li Tirkiyê jî di heyama 6 mehên dawîn de tê dîtin ku temenê bikaranîna van madeyan gelek daketiye û di nava zarokan de belav dibe. Li bajarên Kurdan jî hejmara kesên ku van madeyan bikartînin her ku diçe zêde dibe.

KURSIYA AZAD R12



### Ji her aliyî ve referandûma serxwebûnê

Eger referandûma serxwebûnê pêk neye, metirsiya herî mezin ew e ku Herêma Kurdistanê dibe ku careke din konjonktûreke guncav nebîne. Siyaset gelek caran pragmatist e û pirsa "wext" gelekî muhîm e. Ji destdayîna derfetekê dibe ku bibe windakirina sedsalekê. Lewre, referandûm îro zêdetir muhîm e û konjonktura Rojhilata Navîn îro ew derfet aniye pêşiya Kurdan.



EKREM ÖNEN

## Serdana serokerkanê Îranê a Tirkiyê: 3 Qolî dibe 2+1?

Weke em dizanin. Hîn beriya Astana Rûsya israr dikir ku kurd jî beşdarî civînên Cenêv bibin. Ji ber muxalefata şovenîst a radikal ya Sûriyê ku li dijî bû û DYA ku piştgirtî dida muxalefeta radîkal ya Sûriyê, DYA jî di destpêkê de ne teref bû ku kurd beşdarî civînan bibin. Ew ne ji ber dijberiya kurda bû. Ji ber hesabê geopolîtîk bû. Paşê ku muxalefeta Sûriyê ya radîkal zeîf bû, têkiliyên DYA bi kurda re xurt bûn. Protsesa Astana destpêkir ku di destpêka Astana de jî Rûsya israr dikir ku kurd beşdarî civîna Astana bibin (li vir em dikarin bêjin kurda li hev nekir). Ev guhertin tev û ya esasî ku Rûsya û DYA li Sûriyê bi tevayî û bi teybet li ser çêkirina herêmên aram li Sûriyê li hev kirin. Bû sebeb ku DYA jî weke Rûsya niha qebûl kir ku kurd beşdarî civînên Cenêv û Astana bibin. Evê ya wek em dizanin beriya heftiyekê wezîrê derve ê Rûsya Federal Lavrov di 6ê tebaxê de li paytextê Fîlîpîn Manîlya di civîna ASEAN (Forûma welatên başûrê rojavayê Asya) ku hevdîtin ligel wezîrê derve ê Tirkiyê Çavuşoğlu pêk anî da diyar kirin. Li Manîlya lazim bû tarîxa civîna Astana bidana diyar kirin lê ji ber beyana Lavrov Çavuşoğlu da diyar kirin ew; "ne bi helwesta Rûsya re ne û nabe kurd beşdarî civînan bibin". Ji ber vê diyar kirina tarîxa civîna Astana hiştin civîna ku li Tehranê a ku di 8-9ê tebaxê de di navbera wezîrê derve yên Rûsya, Îran û Tirkiyê de pêkhat. Weke eşkereye di vê civînê de pirsên herêmê bi tevayî hatine guftûgo kirin lê yek ji pirsa esasî pirsa beşdarbûna kurda li civîna Astana û Cenêv her weha pirsa referandûma serxwebûna başûrê Kurdistanê bû ye. Di vê civînê de jî tarîxa civîna Astana nehate diyar kirin, her weha piştî civîna Tehranê wezîrê derve Lavrov du beyan dan, yek teyîd kir ku Rûsya û DYA li hev kirine ku kurd wê niha beşdarî civîna Cenêv bibin her weha beyanek di derbarê referandûma serxwebûna Kurdistanê de da ku beyanek pozîtîv bû got; "Referandûma serxwebûna Kurdistanê îfada hêviyên kurda ne". Gotinên dijberiya referandûmê hîç nebûn. Piştî civîna Tehranê bi çend roja serokerkanê Îranê Baqirî bi lez serdana Tirkiye kir. Ev tev ji me re dide rêdan ku Rûsya di civîna Tehranê de di pirsa beşdarbûna kurda di civînê Astana û Cenêv de her weha di pirsa referandûmê de "ço di ber îraniya û tirkan de dakir." Ji ber wê Baqirî pir bi lez serdana Tirkiye kir. Pir eşkereye her çiqas di medyayê de weke ku wê di hevdîtinên xwe de pirsa şerê bi terorê re pirsên hudûd (Bi serhildana Araratê 1930 pirsa sînor wek niha hate çareserkirin, lê Îran doza heta dora Konyayê dike û Mewlana jî wek ku îraniye dihesibîne) û bûyerên herêmê guftûgo bikin, lê di rastiya xwe de pirsa esasî pirsa Kurdistanê ye. Diyare Îran wê ji Tirkiye daxwaz bike; "Em her du tenê man, em bi çi awayî dikarin rê li ber kurda bigrin" ji ber wê sê qolî Tirkiye, Îran û Rûsya bû Tirkiye, Îran + Rûsya. Bi ya min tiştekî nikarin bikin. Ji ber tişta ku dixwestin bikirina ku ew bi ordiyên xwe ve mudaxele bikin çû. Heger ne Rûsya û DYA li herêmê bana wê mudaxeleyî rojava û başûrê Kurdistanê bikirina, lê eşkere bû nikarin. Dikarin çi bikin? Dikarin bi destê hinekî din çi li ser navê "kurda" çi li ser navê "ûmmetê – îslamê" provakasyona di nava kurda de bikin, pevçûn û tevlîheviyê derxin. Vê ya jî heta ne taluke be DYA û Rûsya wê serê xwe bi wan re neêşîne ku bû taluke DYA û Rûsya wê qebûl nekin provakasyona jî bikin. Ji ber wê divê kurd netirsin referandûmê bikin û li Rojava jî kurd sefê xwe xurttir bikin, xwe bi ser hevdin li hev bikin. Hemû zuruf ji kurda re amadeye û dinya li pişt kurda ye bi teybet DYA, Rûsya û YA. Divê kurd li hember dostên xwe empatî bikin û bi tolerans bin. Wek mînak ji beyanên konjukturel yê DYA ku formel ne bi dilê kurda be jî. Ew ne ji ber DYA li dij referandûmêye ew ji ber rewşa DYA a zehmet li herêmêye dixwaze balansê li hember Tirkiye û Iraqê çê bike. Ya din Em tev dizanin niha siyaseteke DYA yekgirtî nîne heta niha Trump hîn bi tevayî hikum li DYA nake, hin jî nakokî di navbera Pentagon, CIA û Qesra Spî de hene. Ev ne bes di derbarê pirsa kurd de her weha di derbarê herêmê bi tevayî, di derbarê Rûsya, Çîn, YE û her wekî din de. Ji ber wê kurd dijberiya DYA, Rûsya û YA. Medya kurd jî divê êdî bes her carê wê li DYA, Rûsya û YA ku bi hinek kesên ku tu eleqa wan bi siyaseta resmî a van dewleta ve nîne, lê ji kurda re wek ku helwesta van kesan a van welata ye bidin rêdan û gelek kurd jî li ser vê ya siyasetê dikin. Ev manîpulekirina kurda ye. Gelek caran ev kesê ku medya kurd wan wek ekspert an serokên enstîtûtê lêkolîner didin rêdan, li van welatan jî kes wan nas nake ku kî ne. Diyare yek jê medya kurdî bêkêre nikare înformasyona rast bi destxe dudu beyanê van kesa gelek caran ji medya welatên Kurdistan perçe kirine tercume dikin ku ew jî di berjewendiyê van welatên Kurdistan perçekirine de ye.

Têkiliyên Hewlêr - Tehranê

# Îran nikare sînorên xwe bigire





■ MURAT ÖZDEMİR

Herêma Kurdistanê ji roja damezirandina xwe heta niha bi welatên cîran re her tim di nava pêwendiyên baş û aşitiyane de ye û nebûye gef ji bo tu aliyan. Her wiha welatên derdorê jî bi demê re dîtin ku Herêma Kurdistanê di Rojhilata Navîn de weke stêrkekê geş dibe û di nava geşepêdanekê de ye. Tevî hin kiryar û fikrên xwe yên neyînî jî neçar man ku xwe bavêjin bazara Kurdistanê û bi Hewlêrê re di warê aborî û bazirganiyê de peyman çêkirin, têkîlî danîn. Ji wan welatên ku bi Herêma Kurdistanê re ketiye têkiliyên xurt ên bazirganiyê jî Îran e.

Bi diyarbûna roja pêkanîna referandûma serxwebûnê ku wê 25ê Îlonê pêk were, li ser pêwendiyên Herêma Kurdistanê û cîranên wê gelek tişt hatin gotin, nivîsîn û niqaşkirin. Jibilî Tirkiyeyê di navenda van niqaşan de Îran jî hebû. Dihat îdîakirin ku Îran wê sînorên xwe yên li gel Kurdistanê bigire û wê ambargoyê bi ser Kurdistanê de bisepîne. Lêbelê bi nêzîkbûna roja encamdana referandûmê re jî tê dîtin ku pêwendiyên di warê aborî û bazirganiyê yên di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de berovajî angaştan her ku diçe xurt dibin.

Li gor zanyariyên berdest eger Îran ku niha weke li dijî referandûmê ye tê dîtin, deriyên xwe yên sînorî li ser Herêma Kurdistanê bigire ji her du aliyan zêdetirî 5 milyon kes wê bê kar û xebat bimînin. Dihat îdîakirin, Îran ku beriya niha ava ji bo Herêma Kurdistanê diçû birî bû, wê sînorên xwe jî bigire. Lêbelê geşedanên ku rû didin bihêzbûna têkiliyên bazirganiyê yên her du welatan nîşan dide. Pisporan ji Basê re ragihandin ku Îran nikare sînorên xwe yên bi Kurdistanê re bigire û bazirganiya di navbera her du aliyan de her ku diçe zêde dibe û qut nabe.

Berdevkê Odeyên Bazirganiyê yên Kurdistanê Karwan Surchî, Qayimeqamê navçeya ser sînor Çomanê Ahmed Qadir û Berdevkê Yekitiya Veberdên Kurdistanê Mela Yasîn Mehmûd ji Heftenameya Basê re axivîn.

**"Bazirganiya Hewlêr û Tehranê zêde dibe û qût nabe"**

Berdevkê Odeyên Bazirganiyê yên Kurdistanê Karwan Surchî di derbarê têkiliyên bazirganiyê yên Herêma Kurdistanê û Îranê de dibêje, têkiliyên di navbera Herêma Kurdistan û Îranê de wê her berdewam bin. Surchî serdan û civîna şandeya baziranî ya Kurdî bo Îranê bi bîr dixe û axaftina xwe wiha didomîne: "Têkiliyên di navbera Herêma Kurdistan û Îranê de wê her berdewam bin, taybet di warê bazirganiyê de beriya demekê şandeyeke bazirganiyê ya Hewlêrê, serdana Îranê kiribû û protokolek di navbera Kurdistan û Îranê de hatibû îmzekirin. Li gor protokolê Îran wê ofîsa xwe ya bazirganiyê li Hewlêrê veke û di heman demê de ofîsa bazirganiyê ya Herêma Kurdistanê jî wê li Îranê were vekirin. Ji ber wê yeke em pêşbînî dikin ku bazirganiya di navbera Herêma Kurdistanê, tevî encamdana referandûmê jî wê berdewam bin, ji ber ku herdu aliyan jî hewcedarî bi hev heye. Em pêşbîn dikin ku wê qet rêgiriyek nebe û bazirganiya di navbera Herêma Kurdistan û Îranê her ku biçe wê zêde bibe û qut nabe."

**"Têkilî xera bibin jî bazirganiya her du aliyan wê berdewam be"**

Berdevkê Odeyên Bazirganiyê yên Kurdistanê Karwan Surchî di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku têkiliyên her du aliyan xera bibin jî aborî wê berdewam be û wiha pê de çû: Berjewendiya her du aliyan di vê bazirganiyê de heye. Ev ne mijarake yek alî ye. Îran ji bo Iraqê û deverên din jî di ser Herêma Kurdistanê re bazirganiya xwe pêk tîne. Ji sedî 70-80ê bazirganiya Îranê ya bi Iraqê re di ser Kurdistanê re pêk tê. Rojane li deriyê sînorî yê Hacî Omeranê rêjeyeke zêde ya bazirganiyê pêk tê. Têkiliyên herdu aliyan bi her awayî tu caran qut nabin. Eger niyeteke din hebûya bo girtina sînoran ew protokol îmze nedikirin û ofîsên bazirganiyê nedihatin vekirin.

**"Îran sînorên xwe nagire"**

Qayimeqamê navçeya sînorî Çomanê Ahmed Qadir jî li ser vê mijarê û kar û barên sînorî yên di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de ji rojnameya me re ragihand ku heta niha li ser sînor kêşeyekê rû nedaye û kar û xebatên li ser sînor bênavber berdewam kirine. Qadir wiha dibêje: "Kar û barên li ser sînor baş dimeşin. Bazirganiya li ser sînor berdewam dike. Em ne li bendê ne ku kêşeyek jî derkeve. Ji ber ku ev sînorê me heyameke dirêj e fermî ye û bazirganiyeke zêde li wir pêk tê. Ji bo roja me kêşeyek li holê nîn e. Ji bo pêşerojê jî em ne li bendê ne ku Îran têkeve nav kiryareke wisa ku sînorên xwe bigire. Sînorekî fermî ye. Zanyariyek jî nehatiye ku Îran wê sînorên xwe bigire. Kar û bar bêyî kêşe dimeşin."

"Berjewendiyên hevbeş hene"

Qayimeqamê Çomanê radigihîne ku di warê xwarin, şîremenî, seyare û tiştên cûr be cûr ên din de bi rêjeyeke zêde bazirganî berdewam e û wiha dirêjiyê dide gotinên xwe: "Berjewendiyên hevbeş hene. Hejmareke zêde ya xelkê debara wan li ser vî karî ye. Ev ne mijareke yek alî ye. Siyasetê heta niha qet bandor li bazirganiyê nekiriye."

**"Koordînasyoneke baş heye li ser sînor"**

Ahmed Qadir di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, beriya du salan qaymiqamiyên Çoman û Pîranşarê ew bi hev re rûniştin û gotinên xwe wiha bi dawî dike: "Em bi hev re rûniştin û kom bûn. Şandeya wan hat li gel me kom bû. Li gor axaftin û têgihiştinên wê deme diviyabû em biçûna wê derê lê heta niha serdana me pêk nehatiye. Konsolê Îranê yê Hewlêrê jî serdana me kir. Koordînasyoneke baş heye li ser sînor û ji her du aliyan xelkekî zêde debara xwe bi rêya kar û barên sînorî pêk tîne. Sînorên her du aliyan ku berjewendiyên hevbeş tê de hene, nayên girtin û wê her berdewam bin li ser karê xwe.

## Zêdetirî 10 deriyên bazirganiyê...

Rayederekî ji Wezareta Bazirganiyê ya Îranî jî dibêje, 'Me tu carî fikra ku em ê sînorên xwe yên Herêma Kurdistanê bigirin nekiriye. Bi tenê tirsa me heye, dema ku Kurdistan bibe dewlet dibe ku berhemên Îranê neyên firotin.' Deriyên sînor ên sereke; Deriyê Îbrahîm Xelîl, Perwêzxan, Başmax, Hecî Omeran in. 10 deriyên din jî dîsa hene. Kêfxweşiya me ew e ku Îran û Tirkiye hewcedariyên xwe yên rojane bi tenê di ser Herêma Kurdistanê re dikarin bişînin."

## "Kurdistan bo her rewşeke nebaş jî amade ye"

Surchî di dirêjiya axaftina xwe de diyar dike ku Kurdistan ji bo her rewşeke nebaş jî amade ye û wiha pê de diçe: "Kurdistanê ne tene li gel Îranê li gel gelek welatan pêwendî hene. Helbet eger sînor bên girtin ku îhtîmaleke kêm e û her wiha Kurdistan her amade ye bo her kêşe û rewşê. Wê bandoreke neyînî hebe eger sînor werin girtin lê ev bandor ne tene li Kurdistanê wê li Îranê jî hebe. Niha em îhtîmalê nadin wê yeke ku wê derî û sînor werin girtin."

## Her du welat wê ofîsên xwe yên bazirganiyê vekin

Heftiya borî Konferansa Aborî ya Cîhanê li Îranê bi rê ve çû. Herêma Kurdistanê jî yek ji 24 beşdarên konferansê bû. Di konferansê de ku şandeyên Kurdistan û Îranê li ser maseya protokolê bûn bal kişand. Li gor agahiyên hatine bidestxistin di konferansê de di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de rêzeprotokolek hatiye çêkirin li ser berdewamiya têkiliyên her du aliyan. Di civînê de ku şandeya Kurdistanê bi awayekî baş hat pêşwazîkirin, biryar hat girtin ku li paytextên her du welatan nivîsgehên bazirganiyê bên vekirin û xebatên ji bo vê yekê jî dest pê kirin.

> "Îran ji bo Iraqê û deverên din jî di ser Herêma Kurdistanê re bazirganiya xwe pêk tîne. Ji sedî 70-80ê bazirganiya Îranê ya bi Iraqê re di ser Kurdistanê re pêk tê. Têkiliyên her du aliyan bi her awayî tu caran qut nabin."

**"Dema ku Kurdistan bû dewlet wê bazirganî jî zêdetir be"**

Mehmûd dibêje, "Veberdarên ku welatê xwe difikirin û dilsoz in zêde ne. Gelek veberdar ji bo ku piştgiriya madî bidin referandûmê, bi Yekîtiya Veberdarên Kurdistanê re ketin têkiliyê. Ji sedî 90ê veberdaran, bi taybet jî dema ku bo referandûmê kampanyaya dengdayînê dest pê bike wê piştgiriyê bidin. Aliyên sermeyedar û tacirên ku xwedî proje, mal û milk in wê herî zêde ji dewleta Kurdistanê sûdê bibînin. Eger Herêma Kurdistanê bibe dewlet wê malê wan 10 qat zêdetir bi qîmet be. Ji ber ku Iraq di nav welatên ku herî zêde bertîl û gendelî tê de heye de ye û em jî di çarçoveya vî welatî de tên dîtin. Berî ku Ermenîstan serxwebûna xwe bi dest bixe rewşa wê ji ya Herêma Kurdistanê xirabtir bû. Lê belê di nava du salan de hat asteke baş. Hatiye rewşeke wisa ku hin welatên Rojhilat, ji Ermenîstanê mexsûlên cotkariyê dikirin. Hin veberdarên me hene sermayeyên hinek ji wan 3 mîlyar e, ya hinekan mîlyarek dolar e. Ji ber vê yekê peywira veberdarên me ye ku piştgiriyê bidin referandûmê da ku bi ser bikeve."

**"Îran rojekê jî sînorê xwe bigire, wê 5 milyon welatiyên wan bêkar bimînin"**

Tê îdiakirin ku Tirkiye û Îran li dijî referandûma serxwebûnê ji bo ku bertekên xwe nişan bidin wê deriyên xwe yên sînor li ser Herêma Kurdistanê bigirin. Mehmûd di derheqê vê mijarê de wiha dibêje, "Li Îranê 800 navendên sanayiyê hene û li vir bo 16 mîlyon kesî derfetên karkirinê hene. Ger Îran deriyên xwe yên sînor rojekê jî bigire 5 mîlyon kes wê bêkar bimîne û bi mîlyon dolaran wê bikeve zirarê. Ji ber vê jî Îran nafikire ku sînorên di navbera xwe û Herêma Kurdistanê de bigire. Îranê di vê pêvajoyê de, ji Hikûmeta Iraqê daxwaz kir ku xalên sînor ên Kêlê û Seyranbendê jî bi fermî bên vekirin."

**"Îran û Tirkiye, di ser Kurdistanê re bi Iraqê re îxracatê dikin"**

Mela Yasîn dibêje, "Kurdistan bo Îran û Tirkiyeyê bazara herî baş e" û axaftina xwe wiha didomîne, "Par Wezirê Bazirganiyê yê Tirkiyeyê gotibû, 'Herêma Kurdistanê di bazirganiyê de bo Tirkiyeyê bazara yekemîn e. Kapasiteya bazirganî ya salane ya Tirkiyeyê bi Kurdistanê re 11 mîlyar dolar e, bi Îranê re jî 11 mîlyon dolar e.' Me pewendî bi konsolosxaneya Silêmaniyê ya li Îranê re danî. Gotin ku, 'Tu planên Îranê ku deriyên xwe yên Herêma Kurdistanê bigire tune ye.' Ji sedî 80 îxracata Iraqê di ser Herêma Kurdistanê re tê kirin. Eger Îran û Tirkiye bifikirin ku bi riya balafirê îxracatê bi Iraqê re bikin, divê vê yekê jî li ber çavan bigirin; wê bazirganên Iraqê van berheman li ku bifiroşin?"

> "Têkiliyên di navbera Herêma Kurdistan û Îranê de wê her berdewam bin, taybet di warê bazirganiyê de beriya demekê şandeyeke bazirganiyê ya Hewlêrê, serdana Îranê kiribû û protokolek di navbera Kurdistan û Îranê de hatibû îmzekirin."



Rojnameger Nevzat Çiçek:

# Tirkiye û Kurdistana serbixwe wê bibin du cîranên baş





> “Tirkiye nikare Herêma Kurdistanê ji dest berde. Wê nexwaze herêmê ji Îran, Brîtanya û ji DYAyê re bihêle. Hikûmeta navendî ya Iraqê jî bertekên tund nîşan nade.”

RABIA ÇETIN

**Kurd, ber bi serxwebûnê ve diçin...**

Divê pêşî mirov li sedema biryarstandina serxwebûnê ji ku û çawa derket binêre. Eger para Kurdistanê ya ku ji sedî 17 ye bihata şandin, dê diyalogên li gel Hikûmeta Iraqê bidomiyana. Kurd, di warê leşkerî û siyasî jixwe cuda bûn. Tenê di warê aborî de girêdayînek hebû. Hikûmeta navendî dema ev girêdan jî qut kir, ji neçarî berê xwe dan serxwebûna aborî. Rêkeftinên neftê û yên din kirin. Dema ku ev pêk hatin jî referandûm di rojevê de bû. Paşxistina vê biryarê ji ber êrîşên DAIŞê bû û niha jî biryara pêkanînê ji bo 25ê Îlonê hat standin. Li gor min eger êrîşa Heşdî Şabî an jî DAIŞê li ser herêmê çênebe ev referandûm bêguman wê pêk were. Bi awayekî vekirî Goran û Komel li hember derdikevin. Lê ev dijderketin ne li gor ku ji Tirkiyeyê tê dîtin û li hember serxwebûnê ye. Ew wisa dibînin ku ev destkeftî dê weke ya malbata Barzaniyan bê nirxandin. Ji vê yekê jî bi awayekî vekirî vê aciziya xwe bilêv dikin. Li gor vê yekê jî dê piraniya van kesan jî di 25ê Îlonê de dengên ‘Erê’ bidin. Li aliyê din DYA dibêje “Referandûmê paş bixin.” Ne ji ber ku li hember vê yekê ye. Ji ber ku Kurd li Iraqê xwedî roleke girîng in û sala bê wê hilbijartin li Iraqê pêk bên. DYA Kurdan jî di van hilbijartinan de weke hevsengiyekê dibîne. DYA ji bo ku ewlehî têk neçe daxwazê ji Herêmê dike ku referandûmê piştî hilbijartinên Iraqê pêk bîne. Li aliyê din helwesta Tirkiyeyê ne li gor a Îranê ye. Tirkiye dixwaze li bendê be û binêre ka di dahatûyê de çi heye. Lêbelê rewşa Tirkmenên Iraqê jî ji bo Tirkiyeyê pir girîng e. Li wir Tirkmen bûne 3 beş. Partiyên Tirkmenên ku navenda wan Hewlêr e piştgiriya referandûmê dikin. Tirkmenên Kerkûk û Mûsilê jî dibêjin divê herêmên wan tevlî referandûmê nebin. Tirkmenên Şia jî li gor helwesta Îranê tev digerin. Ev referandûm dê pêk bê û ev kart dê dest de be. Dibe ku ev kart li ser maseyê ji aliyê Kurdan ve were bi kar anîn û di demeke dirêj de serxwebûn neyê îlankirin jî.

**Li gor we armanc ne serxwebûn e lê ji bo anîna hikûmeta navendî bo ser maseyê ye?**

Ev, yek ji sedeman e. Eger hikûmeta navendî bi edelet bûya di demeke wisa nêz de referandûm xuya nedikir. A duyem jî, ne diyar e ka wê sibê li Iraqê çi biqewime. Ji bo destkeftiyan Herêma Kurdistanê kartê referandûmê dixe destê xwe. Rûdanên li Sûriyeyê jî bandorê li vê yekê dikin.

**Demeke kin? Li holê dozeke 40 salî û kêşeya 100 salî ya Kurdî heye di ser de jî...**

Belê Herêma Kurdistanê ev 40 sal e li benda vê derfetê ye. Di konjoktûra siyasî de jî rewş amade ye, ji ber vê referandûmê pêk tînin. Lê divê meşrûiyeta navnetewî jî hebe. Di dîplomasiyê de cihê hestiyariyê tune. Belê sed sal e li bendê ne, gav tên avêtin. Herêma Kurdistanê van hemûyan difikire û gav davêje. Lêbelê, erê dibe ku dem, dema herî nêzîkî serxwebûnê be. Di demeke nêz de dibe ku serxwebûn neyê îlankirin lê wê statûya herêmên di bin benda 140î de diyar bibe.

**Tirkiye dê cîranê xwe, dewleta Kurdan qebûl bike gelo?**

Eger refleksên dewleta berê hebûna dê qebûl nekira lê di vê rewşa heyî de “Tirkiye li hidûdê xwe di navbera Kurdistaneke di destê PKK/PYDê û Barzanî de bimîne wê bijarteya duyem hilbijêre. Di warê aboriyê de jî Herêma Kurdistanê cihê herî nêzîk e ji bo Tirkiyeyê ye.” Li aliyekî jî êdî wê nexwaze vê herêmê ji dest xwe winda bike. Dibe ku li hember raya giştî bertekên tund nîşan bide lê ez di wê baweriyê de me ku dê bibe cîranekî baş. Mijara sereke rewşa Tirkmenan e. Eger Mûsil û Kerkûk nebûna dê bi hêsanî qebûl bikira lê mijara Mûsil û Kerkûk di bazara navnetewî de xwedî cihekî girîng e. Ji ber vê yekê jî her du alî dê di dahatûyê de nêzîkî hev bibin.

**Hejmara Tirkmenên li Herêma Kurdistanê ji yê Kurdên Tirkiyeyê hindiktir e. Gelo Kurdên li vir...**

Tirkiye ji bo Kurdên xwe gavek avêt bi rastî. Lê pergalake Tirkiyeyê ku ji berê ve mayî heye. Li hember wan hêzeke çekdar heye. Eger wê hêzê çek ji destên xwe derxista dibe ku her tişt bi şêweyeke din bimeşiya. Me di dema proseya çareseriyê de dît; Serê sibehekê em rabûn û me dît ku her tişt guheriye. Yanê dîsa dibe ku her tişt bibe. Lê heta ku li Sûriyeyê hemû rewş diyar nebin zehmet e ku bikevin rêyeke nû. Eger Sûriye nebûya Tirkiye dê bi hêsantir referandûma Herêma Kurdistanê qebûl bikira. Mijara navxwe ya Kurdan jî dê bi hêsanî çareser bikira. Di van demên dawî de vegera polîtîkayên leşkerî ji ber rûdanên li Sûriyeyê bû. Heta rûdanên li Sûriyeyê bidomin wê ev mijar jî weke mijareke ewlekariyê bê dîtin. Piştî 15ê Tirmehê jî ev polîtîka hene. Di nav dewletê de fikrek heye, ew kes di wê baweriyê de ne ku PKK jî xizmeta vê yekê dike. Lê li gor min divê di her rewşê de pirsgirêk bi rêyên demokratîk bê çareser kirin. Helbet divê PKK jî dev ji çekan berde. Lê ew ji dewletê bawer nakin. Dewlet jî ji wan. Ji ber vê yekê jî di demeke nêz de çareseriya vê pirsgirêkê ne pêkan e.

**Lê beriya 15ê Tirmehê bi qasî salekê her tiştî dest pê kiribû..**

Di nav dewletê de fikra ‘Siyaseta Xendekan ne biryara PKK bû’ heye. Ew fikir di wê baweriyê de ye ku armanca xendekan dirûstkirina şertên Cenevreyê bû.

**Şertên Cenevreyê?**

Eger li deverekê hişmendiya dewletê hebe, dewlet wisa bawer dike ku li deverekê kesên bi cil û berg hebin û ew herêm rastî êrîşê bê, midaxaleya navnetewî wê bê kirin. Bidestxistina 81 parlementerî ya ji aliyê HDPê ve di me hemûyan da hêvî afirandin. Eger protestoyên demokratîk, ji tundrewiyê dûr bihatana ceribandin dibû ku encam bistanda. Mijara sereke ew e ku PKK armanca hin aliyan dîsa bixe dewrê. Her du alî jî hevdû sûcdar dikin, 11 bajêr wêran bûn. Di proseya aştiyê ya Filîpînê de agirbest di navbera Eniya Rizgariya Îslamî ya Moro û (MILF) û hikûmetê de hebû; îtîbar, gavavêtin û proseya siyasî hebû. Di proseya çareseriyê ya Tirkiyê de yek ji van jî tunebû, ji ber ku bawerî di navbera aliyan de tunebû. Ji ber vê yekê jî divê polîtîkayên ewlekariyê. Ji bo vegera vê rewşê biryara dewletê bi giştî heye. Televîzyon hatin bêdengkirin, siyasetmedar xistin zindanê, qadên ku piştgirî didan PKK hatin valakirin. Dewletê dema ku ev yek dikirin siyaseta xendekan a PKK weke amadekariyê nirxand. Lê ji bo her du aliyan jî ev yek demeke dirêj nayê domandin. Dema mijara Sûriye qediya PKK jî li vir çalakiyên bi çek nameşîne. Di mijara navxwe de mijara Sûriye girîngtir e.

Gel dê van tiştan jî bîr bike?

Niha gelekî ku xeyalên wan têk çûne heye li holê. Him ji dewletê him ji PKKê xeyidiye gel. Ew kesê ku li Sûrê mala wî hatiye valakirin bi rastî ji ber ku li devereke din mala wî hatibû valakirin li Sûrê bû. Niha ev mirov bi hêrs in. Divê ev hêrs bê kontrol kirin. Lê li gel vê yekê jî hêviya aştiyê her heye.

Dema em li mînakên proseya aşitiyê yên cîhanê dinêrin di demên herî dijwar de jî hevdîtin pêk hatine. Li Tirkiyeyê niha tiştekî wiha heye?

**Li Tirkiye di dema proseya çareseriyê de ev yek hebû.**

Lê di wê demê de pevçûn tunebûn...

Na hebûn. Her du alî derbasî qonaxa bê pevçûn bibûn lê ji ber bêbaweriyê cî bi cî pevçûnan rû dida. Lê divê neyê jibîrkirin ku di dawiya hemû şeran de aştî rû dide. Bi kê re şer dikî bike di encamê de hûnê li hev werin. Bêsiûdiya Tirkiyeyê ev e; aliyên wê qadên bi mayin in. Mijara Kurdî ne mijareke navxweyî ya Tirkiyê tenê ye. Li Sûriye, Îranê û Iraqê jî kêşeya Kurdî heye. Yanê mijara Kurdî hidûd derbas kirine êdî. Avêtina gavên li hundir têrê nakin. Ji ber vê jî li hundir jî hin tişt wê biqewimin. Rewşa Herêma Kurdistanê dê bandorê li vir jî bike. Dema em li aktorên proseya çareseriyê dinêrin Herêma Kurdistanê jî aktoreke sereke bû. Eger herêm normalîze bibe dê ev der jî normalîze bibe.

## Dewleteke Kurdan a serbixwe dê bandorê li kêşeya Kurdî ya Tirkiyeyê jî bike...

Eger li wir normalîze bibe, belê dê bandorê lê bike. Eger têkiliyên Tirkiye û Herêma Kurdistanê bi awayekî dostane bidomin dê ev der jî normalîze bibe. Bi rastî jixwe dostaniyeke dîplomatîk û bazirganiyê heye.

Em cardin vegerin Herêma Kurdistanê, mînaka Îsraîlê heye. Tirkiye di serî de li hember serxwebûna Îsraîlê derketibe jî di nava salekê de, bû yekem welatê misilman ku serxwebûna Îsraîlê pejirandiye. Eger serxwebûna Herêma Kurdistanê nepejirîne?


Meriv di demeke kin de tê dernaxe bê ka siyaseta navnetewî çi derxe pêşberî meriv. Bo tiştinan dem divê... Belkî nas neke lê dijminiyê jî nake. Îro li Efrînê bi YPG re şer dike lê TIRên Tirkiyê yên hesin û pola ku dişîne Sûriyeyê di ser Efrînê re diherin. Û heqê gumrikê jî dide. Yanê dijminî tiştekî cuda ye. Ez îdîa dikim ku eger mijara Sûriyeyê tunebûya wê helwesta Tirkiyeyê li hember serxwebûna Herêma Kurdistanê cuda bûya. Lê dîsa jî Tirkiye nikare Herêma Kurdistanê ji dest berde. Nikare vê yekê bide berçavan. Wê nexwaze herêm têkeve bin bandora Îran, Brîtanya û DYAyê. Hikûmeta navendî ya Iraqê jî bertekên tund nîşan nade. Yanê ev tên guhertin. Dibe ku Îdareya Kurdistanê, ji dêvla serxwebûnê, di destê xwe de weke kartekê jî bihêle.

## Gelo Tirkiye dê bikeve Efrînê, îdia hene...

Piştî meha Îlonê dibe ku tiştekî wisa bibe. Polîtîkaya hişmendiya dewletê naguhere. Pirsa “Efrîn an Îdlib” pir tê pirsîn. Heke dewlet di demeke nêz de navbera xwe û Kurdan baş bike dê li gor berjewendiyên dewletê û Kurdan be. Dê planên li herêmê tarûmar bike. Lê belê di demeke nêz de ne pêkan e. Eger em li hêza ku de Efrînê biparêze binêrin DYA û Rûsya li vir nayên hember hev. Eger Kurdên li Efrînê wir ji rejîmê re bihêlin, Tirkiye dê vê yekê bike ku ew jî pirseke din e. Lê li gor daxuyaniyên Serokkomar eger ev polîtîka bidome dê Tirkiye bikeve Efrînê. Yanê berfirehkirina Mertala Firatê dê ber bi Efrînê ve here.

**Li gor we Tirkiye ji Mertala Firatê bi serkeftî derket?**

Li gor min herkesî Mertala Firatê xelet nirxand. Tirkiye ji xeta hidûdê xwe neborî. PYD ji dûr ve pêşwazî kir. Dema em li hevdîtinên Siûd, Îsraîl, DYAyê dinêrin yek ji hêzeke Sûriyeyê jî Tirkiye ye. Armanca Tirkiyeyê rawestandina kantonan bû. Bi vê operasyonê jî di navbera kantonan de bendek afirand.



## NEVZAT ÇIÇEK

Rojnamegerê nêzîkî Hikûmeta Tirkiyeyê Nevzat Çiçek, li ser referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê, helwesta Tirkiyeyê ya li hember referandûmê, polîtîkayên Tirkiyeyê ên li hember egera dewleteke serbixwe ya Kurdan û kêşeya Kurdî li Tirkiyeyê bersiva pirsen me dan. Çiçek destnîşan dike ku Tirkiye li hidûdê xwe li hember dewleteke Kurdî dernakeve û wiha didomîne: “Tirkiye nikare Herêma Kurdistanê ji dest berde. Nikare vê yekê bide berçavan. Wê nexwaze herêm têkeve bin bandora Îran, Brîtanya û DYAyê. Hikûmeta navendî ya Iraqê jî bertekên tund nîşan nade.”

---

HOŞENG OSÊ



## Dema PKK-PYDê kirasê Erdoğanizmê li rikberên xwe dikin

Bi hezara belge hene ku serokê PKKê birêz Abdullah Öcalan ji sala 1999an û heta niha, bang li dewleta tirk û AKPê dike ku; “Eger pirsa kurd çareser bikin, dê kurd û PKK di xizmeta dewletê de bin”, lê dewlet, mixabin bi şêweyekî baş û erênî bersiva Öcalan nedaye. Ev serê 18-19 salan e û Öcalan “tawîzan” dide dewleta tirk û dike hawar, gazî û dibêjê; “Ka werin em pirsa kurd çareser bikin berî PKK ji bin kontrola min derkeve”, lê mixabin ne AKPê ne dewlet, bang, hişyarî û sozên Öcalan cidî nagirin! Ev serê 18-19 salan e Öcalan dixwaze PKKê û Kurd û Kurdistanê têxe xizmeta dewleta tirk û dibêje: “Eger Kurdistana Başûr bibe dewlet dê xeterî û metirsiyên mezin li Tirkiye çêbike!” Lê digel vê jî, PKK serokatiya Kurdistana Federe a Iraqê û PKDê bi “sîxurî” û girêdana Tirkiye tawanbar dike!

Serokê PYDê Salih Muslim di tirmeha 2013an de li ser daxwaza MÎTê serdana Tirkiye kir û bi berpisên îstixbarata Tirkiye re rûnişt û axift, lê ragihandina PYDê, partiyên din yên rojavayê Kurdistanê bi girêdan û sîxuriya Tirkiye tawanbar dike! Heta niha, ne gelê kurd, ne jî dost û hevalên PKK-PYDê dizanin bê di civînên di navbera serokê PYDê û berpirsên MÎTê de çi hatin gotin? Û çima li hev nekirin?

Ji 2009an û heta tirmeha 2011an PKK û MÎT li Osloyê di nava hevdîtinan de bûn, lê PKK û medya wê Mesud Barzanî bi ajantî û sîxuriya Tirkiye tawanbar dikir.

“PYD ku baskê siyasî yê rêxistina terorê PKKê ye û dixwaze gelê kurd ber bi dahatûyeke nepenî ve bikşîne. Amerîka û Rûsya dibêjin dixwazin li Tirkiye bixin. Û dema armanca xwe pêkbînin dê dest ji alîkarî û piştgiriya kurda berdin. Divê kurd li gel misilmanên li Tirkiye, Iraq, Îran û Sûriye ku mafê wan nasdikin tevbigerin. Gereke kurd elfebeya xwe ji tîpên erebî nekin latînî”. Ev daxwiyanî a birayê serokê PYDê Salih Muslim, Mustefa Muslim e û di ajansa Anadolê a dewleta tirk de û di roja 10.05.2016an de hatiye belavkirin. Mustefa Muslim ku li Erebîstana Siûdî dima û niha li Tirkiyê ye, serkirdeyekî payebilind yê cemaeta “Uxwan elmuslimîn (birayên misliman)” e û dostê AKPê ye, tenê bese ku mirov navê Mustefa Muslim têxe pencereya lêgerînê ya Google, dê gelek lînkên hevpeyvîn û daxwiyaniyên wî derkevin û were naskirin bê ew kî ye? Û çi ye? Û dost û heval û aligirê kê ye?

Dibe ku têkiliyên vî kesî bi rêxistinên radîkal û tundrew re hebin yan tunebin, lê teqez û li gorî daxwiyaniyên wî; dibistan, peymangeh û zankoyên wî yên olî li Kurdistana Bakur hene û heta niha, ne PKKê, ne PYDê, ne Salih Muslim û her wisa ne medya û derûdora PKK-PYDê tiştek derheqê vî camêrî de negotine û tu daxwiyanî dernexistine! Ev tê çi wateyê? Gelo newêrin? Çima PKK-PYDyî dikarin hemû kes û rêxistinan bikin xayîn û “Erdoğancî” û “AKPecî”, lê heta niha du gotin di derbarê rewş û rola Mustefa Muslim de negotine!

Lê mirov dikare tiştekî baş di medya û ragihandina PKKê de bibîne û peyda bike, ku rikberên xwe bi girêdan û sîxuriya rejîma Esed û a Xameneyî tawanbar nake, ji ber ku PKK-PYDê bi xwe, xwe kiriye yek ji alavên van herdû rejîman!


Berî çend rojan, hin wêneyên Mîhraç Ural ku yek ji serok-çeteyên rejîma Esed e û bi eslê xwe elewî ye û hemwelatiyê Tirkiyê ye, wêneyên vî kujerî û tawanbarê şer, bi hin kadroyên jin yên PYD-PKKê re di facebookê de belav bûn. Di cih de, dost û alîgirên PKK-PYDê dîn bûn û dest bi gotinên xwe kirin: Ne rast e. Ev wêne fotoshop e, ji bo reşkirina PKK-PYDê, ajanên Tirkiye di nav rikberên rejîma Esed de belav kirine, ev kes Erdoğancî ne... hwd. û aligirên PKKê çûn bi wêne lîstin û gotin wêneyê rast ev e.

Lê dema vîdeo ya hevdîtinê derket û navên kadroyên jin ku destên xwe xistibûn destê Mîhraç Ural, eşkere bû, wê çaxê derewên dost û aligirên PKKê derket holê. Û ji bo rûreşiya xwe piçek veşêrên êdî dest bi bihaneyan kirin, mînak: “Mîhraç Ural kurd ne kuştine! Rejîma Esed ji opozisyonên çêtir e”. Ne tenê wisa jî, ji bo têkiliyên xwe yên qirêj bi rejîma Esed re rewa bikin, gotin: “Ma Mesûd Barzanî neçû cem Seddam Husên?” Ev aqilmend, jibîr dikin ku çûna Barzanî sala 1991ê a Bexdayê û hevdîtinên bi Seddam re çêkir, ji bo çareserkirina pirsa kurd li Iraqê bû, ne ku çû ji bo bibe xulam û zilamê Seddam! Ya din, Mesud Barzanî bi serê xwe neçû Bexdayê, lê li gel Celal Talabanî û bi biryara hemû partiyên kurd yên Iraqê çûn. Lê PKK, mixabin, li dijî partî û doza Kurdistana Rojhilat, peywendî bi rejîma Îranê re çêkirin û li dijî berjewendî û doza kurdê rojava, PKKê peywendî bi rejîma Hafiz Esed û kurê wî Beşar Esed re çêkirin. Vêca gelî aqilmendên Apocî: “Tir li ku û das li ku?”

Bi kurtî, dema di gengeşiyan de li PKK-PYDê teng dibe, di cih de, kirasê xwe li kes û partiyên din dike!

# “25ê Îlonê ji bo Kurdan rojeke pîroz e”





CESIM İLHAN

Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê her ku nêzîk dibe ewqas di dilê Kurdan de kelecanî zêde dibe. Em serî li nêrînên kê dixin, di derheqê pêkanîna referandûmê de diyar dikin ku dema herî guncav û baş ev dem e. Jinên Kurd ên Îslamî destnîşan dikin ku divê hemû Kurd piştgiriya vê proseya ber bi dewletbûna Kurdan ve bikin û dibêjin; ‘25ê Îlonê ji bo Kurdan rojeke pîroz e.’

**“Roja pêkanîna referandûmê rojeke dîrokî ye”**

Nivîskar Nurcan Aktay dibêje referandûma serxwebûnê ne tenê mijara Kurdên Herêma Kurdistanê ye, ew mijara hemû Kurdan e. Aktay referandûmê, wek nasîna hebûna Kurdan di nav malbata netew–dewletan de dinirxîne û wiha pê de diçe: “Roja referandûmê rojeke dîrokî ye. Herî baş Kurd dizanin bê ka çawa û bi çi berdêlî hatine vê roja dîrokî. Dîroka Kurdan her wiha dîroka komkujiyan e jî. Kurdên ku li Helebçeyê, Zîlan, Dêrsîm û Roboskî hatin kuştin ne ji ber ku Misilman an jî sosyalist bûn her wiha tenê ji ber ku Kurd bûn hatin qetil kirin. Îslamiyên Tirk ku bi baweriya senteza Tirk–Îslamê tevdigerin di her fersendê de Kurdan bi dabeşkirina ‘Ummetê’ sûcdar dikin. Tu wateya vê sûcdariyê tune ye. Bêguman ev tişta ku ez dibêjim ji bo çepgir û sekûlaran jî derbasdar e.”

**“Êdî Kurd bê statû nikarin bijîn”**

Perihan Yoğurtçu amaje pê dike ku pêkanîna referandûmê di roja ku hatiye diryarkirin de girîng e. Yoğurtçu dibêje “Dê Kurd di dîroka ku ji nû ve tê nivîsandin de cih bigirin” û wiha didomîne: “Mirov divê xwediyê milkekî be û ji bo dahatûya zarokên xwe wî milkî bixemilîne weke dayîkekê, weke bavekî jî divê wî milkî bi kar bîne û pêş bixîne da ku zarokên wî rehet bikin. Serxwebûn jî dişibe vê yekê. Wê hemû zilmên li Kurdan hatine kirin dê bişikên. Siyaseta Kurdan û saziyên sivîl divê bê şik piştgiriya vê proseyê bikin. Eger siyaseta Kurdan li hember serxwebûnê bisekine ev întîhareke sinsî ye. Serwerên Kurdistanê dixwazin careke din Sykes–Picotê dirûst bikin. Ew kesên daxwaza yekîtiya umeta Îslamê dikin bila vekin li nexşeyê binerin, gelo yekîtiya Umetê heye? An jî her beşek ji wê li deverekê ye? Bila ji daxwazên serxwebûnê yên ji bo Filîstînê vekişin da ku di gotina wan de îtîbar hebe. Em Kurd jî ji wan bawer bikin.”

**“Referandûm dê Kurdan bide nasîn”**

Hatice Kavran jî di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de dibêje, nebûna statûya Kurdan heta niha kêmasiyeke mezin bû. Di encama vê referandûmê de wê Kurd li cîhanê bên nasîn û axaftina xwe wiha didomîne: “Dema Kurd û Kurdistan dikeve mijarê ji bo neteweperestên çep û rastên Tirkan cudahiya çep û rastê namîne. Li gor wan ne tenê li ser erdnîgariya cîhanê, li fezayê jî ji bo Kurdan bila statû tunebe. Fikra xwe ya neteweperstiyê di bin sîwana dê welat perçe bibe, umet parçe bibe de vedişêrin. Lê jixwe xwediyên van tezan him Kurdistan him jî umet parçe kirine.

**“Kurd piştgiriya referandûma serxwebûnê dikin”**

Nivîskar Rojbin Özkan roja referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê weke





rojeke pîroz bilêv dike û axaftina xwe wiha didomîne: “Ez roja 25ê Îlonê rojeke girîng û pîroz dibînim. Ew roj gelê mezlûm ê Kurd dê wasiyetnameyên Şêx Ubeydullahê Nehrî, Şêx Seîdê Kal, Pêşewa Qazî Mihemed, Seyîd Riza û Mele Mistefayê Nemir pêk bîne. Wê rojê dê rihê hemû şehîdên Kurdistanê şad bibe. Naskirina dewleta Kurdan ji aliyê Tirkiyeyê ve di pêşerojê de, neteweperest ne di nav de wê ji Îslamiyên Tirk û çepgirên Tirkiyeyê re jî tesîreke erênî derxe holê. Lihemberderketina hin Kurdan jî ji bo piştgiriya propagandaya serwerên Kurdistanê ye. Hin alî jî ji bo berjewendiyên partiyên siyasî tevdigerin. Lê belê elhemdûlîllah piraniya Kurdan piştgiriya referandûma serxwebûna Kurdistanê dikin.”


**“Yekîtiya neteŵî ferz e”**

Parlementera HDP ya berê Hatice Kocaman jî wiha diaxive: “Divê Kurd siyaseta îro ya cîhanê, ya Ewropa û Rojhilata Navîn li ber çavan bigirin, ji bo dahatûya Kurdan weke gaveke kişikê, bêhnfirehî û maqûl tevbigerin. Yekîtiya netewî ji bo Kurdan ferz e. Divê teqez bê avakirin. Divê Kurd li gor 4 parçe û ew dewletên serweriya çar perçeyên Kurdistanê dikin, li gor rejîm û siyaseta wan bên nirxandin. Ji bo Kurdan di vê rewşê de divê her parçe li gor siyaseta xwe ya hundir, civakî, aborî û çandî bijîn, xweseriya demokratîk û ji bo seranserê Kurdistanê jî Konfederaliya Demokratîk bijarteya herî baş e”

> “Referandûm, li Tirkiyê, Îranê û Suriyê jî dê guhertinên mezin bi xwe re bîne. Dewleta serbixwe ya Kurdistanê dê bibe nimûneya pêkvejiyana aştiyane ya hemû netewe, etnîsîte, ol û mezheban.”

## “Biryara gelê Kurd dê meşrû be”

Rawijkara Karûberên Derve ya Huda-Parê Zeynep Bozdaş: “Gelê Kurd dê di 25ê Îlonê de, di referandûma serxwebûnê de di derbarê dahatûya xwe de biryarekê bide. Di serî de welatên cîran û hemû cîhan divê rêzê ji biryar û îradeya gelê Kurd re bigire. Biryara ku wê gelê Kurd bide, meşrû ye û divê hemû cîhan qebûl bike. Li dijderketina proseya referandûmê ya bi boneya dê umet parçe bibe ne rast e. Her wiha herêma ku ji ber şerên navxweyî û nakokiyên mezhebî dikele, di mijara Filîstînê ku mijareke bingehîn e de jî yekîtiya umetê peyda nabe. Ew nêrîna ku dê ‘Umet parçe bibe’ û bi wê hincetê li dijderketina referandûmê jî ne rast û dirûst e. Hemû dewletên misilman hatin cem hev û gelo Kurdên ku dixwazin bibin dewlet bûne asteng? Mijara emperyalîzmê jî bê wate ye. Hemû plan û projeyên emperyalîzmê li herêmê hatin sekinandin, tekbirin û niha jî dor hat referandûmê gelo? Li dijderketina hin Kurdan jî ji ber windakirina kursiyên ku niha lê rûniştîne. Tirsa wan îlankirina dewleteke Kurdan a meşrû ye.”



Karîkator - - - - - - - - - - Dijwar Ibrahim

Bajarê dîrokî Heskîf:

# Dîrokeke 12 hezar salî roj bi roj tê wêrankirin



JÎN MAZÎ

Heskîfa ku xwedî dîrokeke 12 hezar salî ye bi çêkirina bendava Ilısuyê ketibû rojevê. Bi çêkirina vê bendavê dê ev bajarê dîrokî di bin avê de bimîne. Heskîfa ku bi vegûhestina bermamiyiyên dîrokî ketibû rojevê niha jî ji bo zinarên ku ji cîhê xwe liviyane bînin xwarê dînamîtan dikin bin van deran û bi vî awayî li aliyekî zinaran xira dikin û li aliyê din ew cîhên dîrokî ji ber van teqemeniyan xisareke mezin dibînin. Li gor hin lêkolînan eger ev proje biçe serî zêdetirî 55 hezar kes wê bi awayekî neyênî xisarê ji vê projeyê bibine. Dê bandorê li 199 gundên Diyarbekir, Batman, Sêrt û Şirnexê jî bike. Li gor texmînan eger ev bendav xilas bibe tevî kesên ku di salên 90î de koçberbûne ev bendav bidawî bibe dê 78 hezar kes ji cih û warên xwe koçber bibin. Li gel kampanyayan û li hemberderketina vê bendavê, dîsa jî ev proje nehat betal kirin û roj bi roj bi sedan şikeft, mizgeft û dêrên li bajarê antîk bi xerabûnê re rû bir û mane. Parlementerê HDPê yê Batmanê Mehmet Emin Aslan ji bo rê li ber wêrankirina Heskîfê bigire û balê bikişîne ser wê derê, çalakiyek bi serê xwe pêk anî û xwe bi zinarekî Heskîfê ve bi zincîran girê da. Derbarê wêrankirina Heskîfê, bendava Ilısuyê û teqemeniyê ku di xerakirina zinaran de tê bikaranîn Serokê Komeleya Dildarên Hawirdorê yê Batmanê Recep Kavuş û Serokê Baroya Diyarbekirê Ahmet Özmen ku bi Baroya Batmanê re piştî xerakirina zinaran serdana Heskîfê kiribûn, ji Heftenameya Basê re axivîn.

**‘’Rêbazên ku bikar tînin xisarê didin bermayiyên dîrokî”**

Serokê Komeleya Dildarên Hawirdorê yê Batmanê Recep Kavuş di derbarê bendavê û xerakirina zinaran de wiha axivî: ‘’Beriya ku Heskîf were vê rewşê divê tiştên ku berî niha qewimîne jî mirov baş bixwîne. Ewil di bin navê restorasyonê de dest bi xebatan kirin û bi vî awayî rêbazên ku bi kar anîn xisar dan bermayiyên dîrokî. Pişt re bi xurtkirina bermayiyan û vegûhestinê xisar dan wan. A niha jî bermayiyên dîrokî yên ku nikarin vegûhêzin bi awayê tijîkirin û sewaqkirina dîwarê beton dixwazin biparêzin. Wek hûn jî dizanin Heskîf xwedî avahiyeke hesas e, bêhtir bi kevirê kilsê hatiye çêkirin. Mebesta wan çi ye, dixwazin zinar û kevirên ji cihê xwe dilivin bi teqemeniyan bînin xwar. Li gor nêrîna min vegûhestin û restorasyona heta niha hatiye kirin li şûna ku rewşa wan bermayiyan baştir bikin xerabtir kirine.”

**‘’Heskîf ji 3-4 bermayiyên dîrokî pêk nayê”**

Recep Kavuş nerazîbûna xwe tîne ziman û wiha pê de diçe: ‘’Em rêbazên bi vî awayî pesend nakin û rast nabînin. Eger dixwazin başiyekê bi Heskîfê bikin bila zirarê nedin avahiyên dîrokî. Eger wiha tevbigerin nikarin bi vî awayî xwedî li Heskîfê derkevin û wê xelas bikin. Daxwaza me ev e ku divê Heskîf bi xwezaya xwe ya niha bê parastin û ji bo nifşên nû vê mîrateyê bihêlin. Eger rêbazên bi vî awayî berdewam bikin, dê Heskîf ji holê rabe. Bi vegûhestin û barkirina du bermayiyan Heskîf ji xerabûna xelas nabe. Em ji xebatên wan ne memnûn in û em baweriya xwe jî bi wan nayînin. Mesela Serokê Vekolanê Heskîfê di zîndanê de ye, bila biçin li envanter û qeydên wî binêrin, Heskîf ji 3-4 bermayiyên dîrokî pêk nayê.”

Serokê komeleyê Recep Kavuş li ser girîngiya bajarê antîk Heskîfê wiha dibêje: ‘’Ev bajarê antîk xwedî dîrokeke 12 hezar salî ye, bi hezaran bermayiyên dîrokî hene. Li bin erdê bi hezaran bajarên ku hê kişf nebûne hene. Bi taybetî li Heskîfê bajarên dimatî yên veşirtî hene, divê ev bajar derkevin holê, lêkolînên zanistî li ser bên kirin. Ji bo van lêkolînan 50 sal jê re pêwist e, vê yekê ez nabêjim, arkeologên di vekolîna Heskîfê de cih girtine dibêjin. Lê du salên din dê Heskîf di bin avê de bimîne ev pirsgirêkeke gelekî girîng e. Ev bermayiyên ku tên wendakirin ne tiştên ji rêzê ne. Heskîf mîrateya hevpar a mirovahiyê ye. Hikûmeta ku herî pir balê dikişîne ser nirxên hevpar jî ev hikûmet e. Ji bo ev tiştên tên kirin bi dawî bibin divê dev ji van projeyan berdin û xwezaya dîrokî ya Heskîfê xira nekin.’’

**‘’Daxwaza me ew e ku dev ji çêkirina bendavê berdin”**

Serokê Baroya Diyarbekirê Ahmet Özmen li ser îdîaya teqandina dînamîtan dibêje: “Em çûn Heskîfê, me bi xelk û bazirganên li wê derê dijîn re hin hevdîtin kirin. Li gor gotinên wan, teqemeniyên ku li wir hatine teqandin ne dînamît bûye lê tiştekî ku ji wê biçûktir hatiye teqandin. Ji bo zinarên ji cihê xwe liviyayî bînin xwar. Ji ber ku dibêjin dema ew zinar hatine xwar dengê teqînê

> “Mixabin bermayiyên dîrokî bi bendavan, bi xebatên teknîkî bi destên mirovan ji holê radibin. Em dîsa daxwaza xwe tînin ziman û dibêjin ji bo bendavekê, nabe ku dîrok ji holê rabe. Daxwaza me ev e ku dev ji çêkirina bendavê berdin.”




hatiye bihîstin.”

Serokê Baroya Diyarbekirê, naveroka hevdîtina xwe ya li gel parêzgarê Batmanê re jî wiha vedibêje: ‘’Piştî ku me li Heskîfê çavdêrî û tespîtên xwe kirin ji bo em van tiştan bigihînin aliyê fermî, me bi parêzgarê Batmanê re hevdîtinek pêk anî. Parêzgar di derbarê îdîayên dînamîtan de got; ‘Di xerakirina zinaran de dînamît an teqemeniyên din nehatine bikaranîn’ û herwiha got ew ê li ser îddîayên dengê teqînan jî lêkolînê bikin. Em dîsa daxwaza xwe tînin ziman û dibêjin ji bo bendavekê, nabe ku dîrok ji holê rabe, daxwaza me ev e ku dev ji çêkirina bendavê berdin.”

**“Dozên hatine vekirin bêencam dimînin”**

Serokê Baroya Diyarbekirê projeya bendava Ilısuyê ji aliyê hiquqî ve nirxand û ragihand: ‘’Berê jî weke mînakên Heskîfê, ji bo projeyên wiha betal bibin gelek doz li dadgehên îdarî hatine vekirin. Dema em lê dinêrin ji ber kiryarên giştî yên li Tirkiyeyê dozên wiha encam nadin nakeve merhaleya encamdanê. Li gel biryarên darazê û li gel mevzuatê dîsa jî projeyên ku ji aliyê dewletê an ji aliyê şîrketan ve hatine amadekirin pêk tê, Heskîf jî yek ji wan mînakan e. Li gel ku ev der ji aliyê parastinê ve di asta yekem de ye û di bin parastinê de ye jî û ji aliyê dîrokî ve yek ji cîhên dîrokî yê Mezopotamyayê ye jî dîsa ev proje pêk hat.”

## ‘’Ji bo bendaveke 50 salî, dîroka mirovahiyê ji holê radikin”

Serokê Baroya Diyarbekirê Ahmet Özmen destnîşan dike ku Heskîf xwedî dîrokeke 12 hezar salî ye, di heman demê de mîrateya hevpar a mirovahiyê ye û axaftina xwe wiha didomîne: “Yek ji cihên niştecîhbûna herî kevnar e û her wiha pêşeroja mirovahiyê jî ronî dike. Li Heskîfê şopên bi hezaran şaristaniyan hene. Her şaristaniya ku li vî bajarê antîk hatiye ser hikûm tiştek li vî bajarî zêde kiriye û ev mîrate anîne heta vê rojê. Ez li ser navê xwe û li ser navê Baroya Diyarbekirê dibêjim; Em bi salan e vê fikrê diparêzin û em li hember çêkirina bendava Ilısuyê ne. Ji bo bendaveke ku temenê wê dê 50î salî berdewam bike, divê dîroka mirovahiyê neyê tune kirin. Li gel hemû tiştî jî ev bendav hat çêkirin. Li her bajar û bajarokê Tirkiye raboriyek dîrokî heye. Ji aliyê parastin û derxistina dîrokê ve kêmasiyên mezin hene. Mixabin bermayiyên dîrokî bi çêkirina bendavan, xebatên teknîkî, bi destên mirovan ji holê radibin. ‘’

## Erdhej li ber derî ye;

# Ne li Stenbolê ne jî li Wanê tu amedekarî nîne



Li Tirkiyeyê veguhestina bajaran wek 'Xwezayî' bê nîşandin jî bobelatên nexwezayî jî bi xwe re tîne. Stenbola ku beriya çend heftiyan di bin bandora ba û bahozan de mabû, li hember bobelatên nû bê star e. Pisbor li benda erdhejeke nû ne. Li Wanê jî 6 sal di ser erdhejê re derbas bûne lê hê jî cihekî lê kombûnê tune ji bo piştî erdhejê.

### Sekreterê Şaxa Odeya Plansazên Bajaran a TMMOBê Akif Burak Atlar:

"Polîtîkayên zanistî ji bo veguhestina bajaran pir girîng in"

Sekreterê Şaxa Odeya Plansazên Bajaran a TMMOBê Akif Burak Atlar, di derheqê mijarê de ji Heftenameya Basê re axivî. Atlar, "18 sal di ser erdheja mezin a Stenbolê re derbas bûn ku karesata serdema 20. de ya herî mezin bû. Ev 18 sal e gavên divê bên avêtin ji aliyê odeyên pîşesazan ve, bi xebatên zanistî û profesoran re, bi berpirsyaran re hatine parvekirin. Lê belê wezaret û berpirsyar di vê mijarê de ji bo çareseriyeke mayînde sersar in û mixabin bajarên me di bin metirsiyeke mezin de ne. Erdheja di 23ê Cotmeha 2011an de li Wanê pêk hat û di encamê de me gelek windayî dan. Ev yek jî nîşanî me dide ku di vê mijarê de gavên pêwîst nehatine avêtin. Ji 1999an bigirin heta îro erd û axên di bin îdareya xizmeta gel de ne yek bi yek ji avahiyan re tên vekirin. Dema bobelatek rû da li bajêr tu cih tune ku em lê kom bibin. Li gel vê yekê jî di dahatûyê de ev erd û axên ku pêdiviya me pê heye dê qet nemînin. Her wiha me gelek caran rapor amade kirin bo wezaretê lê wezaretê tu carî li van raportên me nenêriye û li gor Qanûna Bobelatê ya bi hejmara 6306an cih û warên di bin riskê de tên hilweşandin û ji nû ve tên ava kirin. Ji bo jiyaneke arestayî, ewlehî û tendûristî divê cih û warên zanistî, bi plan û rêgezên li hember bobelatan xurt bên avakirin. Birêvebirina van polîtîkayan him ji bo Stenbolê him jî ji bo bajarên me yên din pir girîng in."

HİLAL YAĞIZ

Em li erdnîgariyeke wisa dijîn ku ji sedî 97ê wê di bin metirsiya erdhejê de ye. Tenê li Wanê, li gor daneyên AFADê ji sala 1950î û vir ve heft erdhejên pileya wan di ser 7.0 ê re rû dane. Erdheja 1999an a Îzmîtê, ya 1999an a Duzceyê û ya 2011an a Wanê li pey hev çêbûbûn.

Erdhejên herî mezin ên herêmê jî di salên 1930 û 1976an de, bi pileya 7.2 rû dabûn. Li gor daneyên giştî li Wanê di deh salan carekê de erdhejên bi xisar pêk tên.

Beriya 6 salan, di 23ê Cotmeha 2011an de li navenda Ercîşa (Elbak) navçeya Wanê erdhej çê bû, piştî wê di 9ê Mijdarê de jî yeke din rû da. Di encama erdhejê de 644 mirov mirin û nêzîkî 2 hezaran mirov jî birîndar bûn.

Li Wanê îro jî di pileyên cuda de erdhej rû didin. Gelo piştî ku erdheja mezin a Wanê rû da û di encamê de gelek kes mirin û bi salan di konan de man, çi tevdîr hatin stendin? Îro erdhejeke di heman pileyî de rû bide gelo dê heman encam rû bide?

**Li Wanê deverên kombûna piştî erdhejê tune ye**

Berpirsê TMMOBê yê Wanê Şemsettin Bakır dibêje, ji wê rojê ve tu guherîn li Wanê çênebûne. Bakır kêmasiyên avahîsaziyê yên li Wanê wiha bilêv dike: "Tirkiye li gor daneyên zanistî li ser nexşeya ji sedî 97 di bin metirsiya erdhejê de ye. Erdhej mijareke xwezayî ye û ku dema wê were dê rû bide. Rojên derbas bûyî 18. salvegera erdheja Marmarayê bû. Her çawa di ser erdheja Marmarayê re 18 sal derbas bûbin û tu tişt neguherî be li Wanê jî tu tişt neguheriye. Mirovan, wê deme ji bo konekê bidest bixe bi mehan li ber deriyê AFADê sekinîn. Kon piştî çend mehan hatin. Avahî gelek jê şûn de hatin çêkirin. 340 hezar avahiyên ku hatin çêkirin têrê nekirin ji ber ku li Wanê mala gelek kesan ruxiyabû. Wê demê di xebatên destnîşankirina avahiyan de 147 hezar mal ketin bin raporê, ji 39 hezarî zaftir jî mal bi giranî hatibûn ruxandin, 72 hezar jî nîvenîv xisar dîtîbûn. Avahiyên ku zêde xisar dîtine, hatin ruxandin lê di yên nîvenîv xisar dîtine de mirov hîn dijîn. Ji wan hinekan jî malên xwe dane îcareyê. Ev jî tê wê wateyê ku hê tu bergirî nehatine standin.

Li Wanê hê jî ji bo erdhejê cihê lê kombûnê tune ye. Hatibû gotin ku dê cihê Wezareta Karên Avê ji bo vî tiştî bê ava kirin lê ne ew der ne jî cihekî din nehat amadekirin. Hê jî avahiyên qeçax hene. Wê demê jî pirsgirêka herî mezin ev avahiyên ku xizmeta endezyariyê nabînin bûn. Avahî him jî ji aliyê şaredarî û berpirsyaran ve nayên kontrol kirin. Di vê rewşê de sibê eger erdhejek pêk were dê heman avahî xira bibin. Em ê jî bi heman êşan re rû bi rû bimînin.

**Divê veguhestina bajarwaniyê veguhestina di cî de be**

Ji bo veguhestina bajaran hinek xebat hatin kirin lê ev veguhestin ne li gor mirovan bûn. Em mirov in û têkiliyên me yên civakî hene. Gava ku hûn ji bo veguhestinê xaniyên me hilweşînin, hûn nikarin bibêjin em ê li ber çiyakî xaniyekî bidin we. Veguhestin wisa nabe. Divê veguhestina bajaran veguhestina di cî de be. Ev nayê kirin. Cî û warên mirovan didin TOKÎ yê. Û TOKÎ avahiyên pir biha çê dike. Hemwelatî jî nikarin di cihên xwe de, di avahiyên xwe de bijîn, diçin li ber çiyan dijîn. Piştî erdhejê 15 hezar û 340 heb avahî hatin çêkirin. Bi bihayên sala 2012 an xaniyên bi 50 hezar lireyî ji hemwelatiyan re bi 93 hezar lireyî hatin firotan. Kargehên Kontrolkirina Avahiyan jî derdekî din in. Gava ku li Wanê avahiyên bilind ên heyî hilweşin mirov nikare di wan kolanên teng re bigihêje devera bobelatê. Bi taybetî li Wanê wisa ye. Gava ku ev rewş neyên çareserkirin ne mimkûn e ku metirsiya erdhejê jî bê kêm kirin.

**Li Stenbolê veguhestina bajarwaniyê dibe sedema bobelatan**

Li Tirkiyeyê bajarê ku Kurd herî zede koç dikin Stenbol e. Sûriyeyiyên ku ji şer reviyane jî xwe dispêrin Stenbolê. Kêm derfetî û şer sedema sereke ya van koçan e. Li gor daneyên fermî li Stenbolê 15 milyon kes dijî ev jî ji sedî 18.5 nifûsa Tirkiyeyê ye. Veguhestina li Stenbolê dibe sedema bobelatan.

Piştî baran û bahozê li Stenbolê herkesî berê xwe da plansazî û warên şînayî yên Stenbolê. Şînahî panzehîra germê û lehiyan e. Li Stenbolê her ku diçe cihên şîn kêm dibin. Li Stenbolê cihên şîn ên nava bajêr li gor daneyên Wezareta Der û Ber û Bajaran 7.57, li gor Şaredariya Mezin a Stenbolê jî 8.41 metre çargoşe ye.

Di rapora nirxandina 5. a Panela Guherîna Av û Hewayê ya Hikûmetan (IPCC): " Li bajaran, rîska guhertina avûhewayê (Rêjeya behran, bahoz, stresa ji germê, baranên zêde, hêlanên navendî û derveyî, xela, zêdebûna bêaviyê, xeleya avê) zede dibe. Li gel van rîskan, aboriya herêman û ya navnetewî jî ji vê yekê bandor digire. Pisbor, bandora guherîna avahîsaziyên bajaran jî wek sedema vê yekê dibînin. Em weke Heftenameya Basê bi Sekreterê Şaxa Odeya Plansazên Bajaran a TMMOBê Akif Burak Atlar re axivîn.

**Nifûs û taybetmendiya Stenbolê**

Bi 15 milyon kesî, bajarê herî mezine Stenbol e. Erdnîgariya wê 5.313 km çargoşe ye. Li ser her km çargoşeyekê 2786 mirov dikevin. Nifûs li navçeyên weke Esenyurt, Bagcilar, Kuçukçekmece ku koçberî zêde li wan deran çêdibe pir qelebalix e. Hejmara kesan li van deran ji 700 hezarî derbas dibe. Stenbol di heman demê de xwedî nifûsa ciwanan a herî mezin e.

MURAD CIWAN



## Hilweşandina mîrekiya Canpolatan

"Ferman e, ferman e, fermana mîrên kurdan e!" (dewama hefteya bere)

Di hezîrana 1606an de Derwiş Paşa bû sedrezam ku dixwest careka din seferê bibe ser Îranê û erdên wendakirî vegerîne. Lê Sultan Ahmed ji ber hevrikiyên li paytextê, ew bi tuhmeta xayîntiyê idam kir, Kuyucu Murad Paşa anî şûna wî.

Sadrazam Murad Paşa devşirmeyekî sirbî yê 70 salî bû, yekî gelek muteesib û req, siyaseta wî, ''ya hemû, ya hîç" bû . Wî hedefên Derwiş Paşa ên derbarê sefera ser Îranê bi dizî rakir, dawîlêanîna serîhildanên Celaliyan û têkşikandina Canpolatiyan kir hedefa xwe. Sala 1607 orduya xwe ya ji 70 hezar eskeran pêkhatî weka ku sefera ser Îranê ye birêxist. Li ser rê, gelek serîhilderên Celalî idam kirin. Gelek caran efû derdixist, soza xelatkirinê dida, lê ku ew dihatin ber destê wî serê wan difirand.

Piştî giha Konyayê, eşkere kir ku mexseda wî ne sefera ser Îranê, lê binbirkirina desthilata Alî Canpolat e.

Kuyucu Murad, ji bo Alî Paşa nikaribe alîkariyê ji Celaliyan bistîne bi serokên wan Kalenderoğlu Mehmed re li hev kir, begêbegantiya Anqerê dayê. Li Tarsusê êrîş bir ser Cemşîd Beg, ew şikand.

Cemşîd qet li ber xwe nedabû û osmanî û Alî Paşa, ji texmînan zûtir hatibûn hemberê hev. Orduya osmanî li alî Edenê jî serîhilder pak kirin; 500 merivên Cemşîd hatin idamkirin.

Kuyucu Murad orduya begêbeganê Meraşê Zulfîkar Paşa jî girt û berê xwe da eyaleta Helebê. Alî Paşa jî, ji bo ku hê zû pêrgî lê bigire, orduya xwe anî li deşta rojhilatê çiyayên Amanosan xist amadebaşiyê, qerargeha xwe jî li rex Gola Awnikê danî. Orduya Kuyucu Murad tevî ya Zulfîkar Paşa 75 hezar esker bû, ya Alî Canpolat jî nîvê wê bû. Herdu ordu li geliyê ber devê Deşta Orucê di 24ê çiriya pêşîn (oktobera) 1607an de hatin hemberê hev.

Di destpêkê de orduya Canpolatan zora eskerê osmanî bir. Li ser vê, osmaniyan li herdu palên geliyê teng 50 topên osmanî, ne bi gulle, tenê bi barûdê dagirtin û danîn. Esker li herdu palan xwe kir beş û weka ku direve vekişiya. Orduya Canpolatan ket gelî, pêş da çû… û top teqiyan. Dengê topan gurmîneka wiha derxist ku hemû hesp veciniqîn, dumana topan gelî dagirt, tarî kir, çav çavan nedidît. Orduya Canpolatan bêserûber bela bû, her yek bi aliyekî de reviya, kontrol ji destê fermandaran derket, kesê nedizanî kî bi ku ve direve. Alî Paşa meydana şer terk kir, ber bi rojhilat ve çû.

Osmaniyan bi êrîş berê xwe da Canpolatiyên belabûyî, dest bi kuştin û girtinan kirin. Li ber xîveta Kuyucu Murad Paşa ya li meydana şer, dest bi serjêkirina êsîran hat kirin. Pîramîdeka ji 20 hezar seriyên jêkirî li ber xîveta Paşa bilind bû.

Kuyucu Paşa pişt re ordu kêşa ser Kilîsê, ew talan kir, dest danî ser xezîne, mal û milkên Canpolatan. Wî bi fermanekê mîrekiya Kilîsê hilweşand, ew li ser navê padîşah kir malê xezîneya dewletê. Ji wê rojê pê ve Kilîs êdî bû milkê padîşahan.

Kuyucu xwe gihand Helebê, dor lê girt. Helebî teslîm bûn. Xizm û malbata Alî Paşa ketin kelaha bajêr, li ber xwe dan. Murad Paşa nekarî bi şer zora wan bibe, doza lihevhatinê kir. Wî soz da ku ew kela bajêr teslîm bikin û bên bexişandin. Lê gava derî vebûn, Kuyucu esker û malbata Alî Paşa ji hev veqetandin û hemû endamê malbatê dan ber şûran, serê wan birrîn.

Alî Paşa, tevî apê xwe bi du hezar eskeran berê xwe da Stenbolê, li rê pevçûnên wan li gel Celaliyan bûn, ew êsîr ket, lê pişt re ji nav destê wan reviya, xwe gihand paytextê; dîwana Sultan Ahmed. Padîşah ew efû kir, xeftanê paşatiye lê kir. Ew bû begêbeganê Temeşwarê, çû wir. Lê yenîçeriyên wê derê û burokrasiya destê dirêj a paytextê li dijî wî bûn, wan nehişt ew deverê îdare bike, qasî salekê ma, tehdîda kuştinê hat serê, di 9ê nîsana 1609an de bi dizî reviya Belgradê. Li wê derê ne berpirs, lê azad bû.

Kuyucu Murad xwest esker bela bike û vegere Stenbolê, lê Sultan Ahmed daxwaz jê kir da here ser Celaliyan, wan tasfiye bike û pişt re seferekê derxe ser Îranê. Kuyucu bi pey Celaliyan ket, hin tasfiye kirin, lê serekên wan ên mezin wek Kalenderoğlu, Tewîl Xelîl, yên din bi 13 hezar siwar û piyadeyan reviyan Îranê xwe avêtin bextê Şah Abbas. Kuyucu neçû sefera Îranê, vegeriya Stenbolê. Sultan Ahmed aciz bû ku Kuyucu neçuye sefera Îranê û siyaseta wî ya li gel Celaliyan rêvekiriye ku serkêşên wan li gel beşeka mezin reviyane Îranê, bûne tehdîda paşerojê. Lê Kuyucu ji ber zaferên xwe li paytext wek qehremanan hat pêşwazîkirin.

Kuyucu ku pê hesiya Canpolat buye mîrêmîranê Temeşwarê, gelek hêrs bû, ferman şand Belgradê da ew bê girtin û bê şandin Stenbolê. Welê bû. Ku Alî Paşa derdestkirî gihaşt Stenbolê, hat idamkirin.

Mîrekî û paşatiya Canpolatan hilweşiya, her çendî li derûdora Kilîsê 10-15 salên din jî hin malbatên ji Canpolatan mabûn, lê pişt re ew jî ji Kilîsê derketin. Di salên 1630î de êdî ew hemû li Lubnanê li ba eşîra Faxreddînê benî Maanê durzî bicih bûbûn. Ew di nav durziyan de entegre bûn, heta bûn mîrên wan. Canpolatên Lubnanê yên niha, ji nesla wan in.

## Haya we jê heye?

# Temenê bikaranîna madeyên hişber daketiye 10an

SUDET KARAGÖZ

Li gor daneyên dawî yên Neteweyên Yekbûyî li cîhanê hejmara kesên madeyên hişber bikartînin giheştiye 29 milyon û nîvan. Li Tirkiyê jî di heyama 6 mehên dawîn de bikaranîna madeyên hişber 17 qatî bilind bûye, kesên ku temenê wan 10 e, van madeyan bikartînin. Dema em bala xwe didin bajarê Kurdan jî hejmara kesên ku van madeyan bikartînin ne kêm e. Hevserokê SESê yê şaxa Wanê Sezer Örenç dibêje, ''Temenê bikaranîna madeyên hişber daketiye 10an û dibêje bilindbûna rêjeya bikaranîna madeyên hişber paralelî daketina temen e jî.

Örenç balê dikişîne ser vê yekê û dibêje, "Lêgerîna maf û hiqûqê ji bo rêxistinên demokratîk ên girseyî tên asteng kirin, lê ev kesên ku madeyên hişber difiroşin bi awayekî serbest li kolanan digerin ev ne tesadûf e. Ev ne aqilane ye"

Örenç dibêje, bidestxistina madeyên hişber ji aliyê kesên berpirsyar ve nayê astengkirin û ji firotina van madeyan jî çavê xwe digirin. Di nav civakê de jî ev fikir heye. Örenç dibêje ji bo bi rajêriya madeyan têkoşîn bê dayîn divê navendên rehabilitasyonê yên ku her kes dikare xwe bigihînê vebin."





Li gor daneyên Neteweyên Yekbûyî li cîhanê bikaranîna madeyên hişber gihêştiye 29 milyon û nîvan. Dema em bala xwe didin bajarên Kurdan rewşa wan ji cîhanê ne cûdatir e.

**"Hêsanbûna bidestxistina madeyan rajêrîbûnê zêde dike"**

Örenç di dewama axaftina xwe de diyar dike ku gelek sedemên zêdebûna rajêriya madeyan hin ji wan; siyasî, civakî, aborî ye û wiha pê de diçe: "Gelek caran ji bo desthilatdaran takekesên maqûl ên apolîtîk û yên rajêrî madeyan e. Rewşa rajêrîbûnê kesan ji civakê dûr dixe û wan bi tenê dihêle. Sîstema kapîtalîst civakê parçe dike û takekesbûnê dadixîne asta herî jêr. Ev jî rêbazê hêsan dike."

Örenç diyar dike, li şûna ku eniyeke civakî-çînî hebe, kedxwarina takekesên rajêrî pratîktir e û wiha dibêje: "Asta pêşketina welatan, rewşa siyasî û tenduristî û mirovên rajêrî madeyên hişber e. Rêjeya van herdu tiştan paralel e û ev ne rasthatineke ji rêzê ye. Bi taybetî li cihêkî ku şer lê zêde ye, her wiha li cihê ku demokrasî û mafê jinan tune rêjeya kesên rajêrî madeyên hişber zêde ye. Ji ber rewşa siyasî jî û herêm jî rêgeha çûn û hatinê ye, li Wan û bajarên derdorê hejmara rajêrên madeyan zêde dikin. Madeyên hişber ên ji Rojhilata Navîn tên, ji wir bi ser Tirkiye re bi hêsanî derbasî Ewropa û Balkanan dikin, ev jî dibe sedem ku bidestxistinê hêsan dike. Hêsanbûna bidestxistina madeyan rajêriyê bi taybetî rajêriya ciwanan bilind dike. Ji ber wê li bajarên herêmê rajêrî zêde ye."

### "Rajêrî ne exlaqî lê rewşeke tibî ye"

Pisporê Xizmetên Civakî yê Şaxa Sesa Amedê ku di heman demê de Aktîvîstê Platforma Rajêriya Madeyan e Ümit Çetiner dibêje, "Li hemû bajêr, xebatên serwextkirinê tên kirin. Him malbat di van mijaran de tên serwextkirin him jî kesên rajêrî madeyên hişber in bi pisporan re tên cem hev û bi vî awayî tên serwext kirin." Çetiner amaje dike ku bikaranîna madeyên hişber li gor bajarên din li Diyarbekirê zêdetir e. Sedema vê erzanbûn e ku li ber mekteban jî bi rehetî tê dabîn kirin. Madeya ku herî hêsan tê dîtin û erzan esrar e. "

Çetiner şîretan li malbatan dike û dibêje, "Dê û bav divê bi awayekî vekirî hestên zarokan fêm bikin û bi wan re têkiliyeke li ser ewlehiyê deynin. Di dema balixbûna zarokan de guherînên psîkolojîk der tên û divê piştgiriya wan bikin û rê li ber wan bixin û ji îxmalkirin û ji tundeweriyê dûr bisekinin. Dema ji ciwanekî ku rajêrî madeyên hişber re gotinên weke 'bêexlaq, psîkopat, netebitî, zexel' bên gotin, tedawiya wan kesan asteng dikin. Divê em rajêrîbûnê weke tiştekî exlaqî bi nav nekin, weke tiştekî tibî bi nav bikin. Takekesên rajêrî madeyan bi bandora deximkirinê ji civakê dûr dikevin, kêm tên dîtin û biçûk dikin. Ev jixwe sedema rajêriyê ye. Ev dibe sedem ku rajêrî zêde bibe. Tişta ku divê bê kirin; divê bi kesên rajêrî madeyên hişber re têkiliyên nêz bên danîn, ew bên hembêz kirin û bi wan kesan bidin hîskirin ku ew her li gel wan in ji bo ku xwe di ewlehiyê de hîs bikin. "

Dêra Qedîm a Dayika Meryem:

# Tenê li vê dêrê ayîn tê kirin



■ MÎRA JÎN

Li Diyarbekirê niha tenê dêreke Suryaniyan a bi navê Dêra Qedîm a Dayika Meryem maye ku bi awayekî aktîf cemeata Suryaniyan her hefte ayînên xwe li wir pêk tîne. Ev dêr li navçeya Sûrê li taxa Lale Bey e û dîrokeke wê ya gelekî kevn heye. Avahiya wê bi kevirê reş ê bazalt hatiye çêkirin. Di heman demê de ev dêr ji sedsala 11an heta sedala 19an ji patrîkên Suryaniyan re bûye cih û war. Ev dêr berê ji aliyê Suryaniyan ve weke 'Mabeda Tavê' dihat bikaranîn ji ber ku Suryanî beriya ku bibin Xrîstiyan baweriya xwe bi tavê dianîn. Li dêrê hîn jî stûnên ji kevir ê ji mabeda tavê mayî hene. Keşeyê dêra Suryaniyan Yusuf Akbulut di derbarê dîroka dêrê, girîngiya wê bo Suryaniyan, Suryaniyên ku li Diyarbekirê dijîn, cejna "Bilindbûna Dayika Meryem" ku weke 'Cejna Tirî' jî tê binav kirin de ji Heftenameya Basê re axivî.

**''Geştiyar weke berê nayên dêrê"**

Keşeyê Dêra Qedîm a Dayika Meryem Yusuf Akbulut, di derbarê dîroka dêrê de agahiyan dide û dibêje: "Dêra Suryaniyan a Dayika Meryem di sedsala 3an de hatiye avakirin û xwedî dîrokeke 1750 salî ye. Ji dema Romayê maye. Ev dêr gelek caran xera bûye û hatiye restorekirin lê gelek cîhên dêrê resen in. Ev dêr her tim aktîf bûye û her tim ayîn lê hatine kirin. Rojên yekşeman ayîn tên kirin û cejnên olî jî em her tim li vir pîroz dikin. Ji ber bûyerên sala borî geştiyar nayên dêrê. ''

> Dema em li dîroka Suryaniyan dinêrin û dixwînin ti carî şer nekirine ti kes nekuştine. Suryan bêhtir bi hûnerê re eleqadar bûne. Ji dîrokê û heta niha bi karên; xişirfiroşî, zîvkerî, têlkarî û bi çêkirina şerabê re mijûl bûne.

**''Li dêrê stûnên kevir ê ji mabeda tavê mayî hene"**

Keşeyê Dêra Suryaniyan di derbarê baweriyên Suryaniyan de wiha axivî: "Dêra Dayika Meryem, dêreke dîrokî ye, di raboriya xwe de ji patrîkên Suryan re bûyê wargeh. Suryanî gelê herî kevn ê Diyarbekirê ne. Jixwe dema ku behsa Suryanan tê kirin dibêjin gelê qedîm. Suryan ji nîjadê Samiyan in, ji sedsala 5-6an ve li ser vê axê dijîn. Mesela em wek Xirîstiyan ji 2 hezar sal berê ve li ser vê xakê dijîn. Suryaniyan berê baweriya xwe bi tavê dianîn. Li dêrê hîn jî çar stûnên kevir ê ji wê demê mayî hene. Suryanan beriya Îsa, baweriya xwe bi tavê dianîn. Piştre Suryaniyan Xirîstiyanî qebûl kirine û nas kirine. Wexta Suryan bûne xirîstiyan mabedên xwe yên tavê jî vegûhastine dêran. Li ser vê xakê gelek mînak hene. Ev dêra ku niha ez lê dimînin, dêra li Mêrdînê, Dêrzahferan û dêrek li Xarpûtê jî heye em dikarin van mînakan zêde bikin.

**''Li Diyarbekirê 40-50 Suryanî mane ''**

Akbulut di derbarê Suryaniyên li Diyarbekirê dijîn de jî dibêje: "Suryaniyên Diyarbekirê li nav Sûrê diman, ji xwe beriya 50-100 sal berê Diyarbekir bi her awayî ji navçeya Sûrê pêk dihat. Roj bi roj hejmara Suryaniyên ku li Diyarbekirê dijîn kêm dibe. Ji xeynî Suryaniyan xirîstiyanên kêmatî jî hene li Diyarbekirê lê wekî Suryanan roj bi roj hejmara wan jî kêm dibe. Suryaniyên li vir dijîn gelekan jê berê xwe bi Amerîka, Kanada, Swêd û Stenbolê ve kir û koçî wir kirin."

**''Suryan li aliyê aştiyê disekinin"**

Keşeyê dêrê di dirêjiya axaftina xwe de dibêje, gelê Suryan her tim li aliyê aştiyê sekiniye û wiha pê de diçe: "Dema em li dîroka Suryaniyan dinêrin û dixwînin ti carî şer nekirine ti kes nekuştine. Suryan bêhtir bi hûnerê re eleqadar bûne. Ji dîrokê û heta niha bi karên; xişirfiroşî, zîvkerî, têlkarî û bi çêkirina şerabê re mijûl bûne."

**"Dêr alîkariya xizanan dike"**

Yusuf Akbulut di derbarê jiyana xwe û malbata xwe û derbarê jin û mêrên Ermenî yên berê ku li dêrê diman de jî van gotinan dike: "Ji sala 1993an ve ez li vê dêrê ez keşe me û hîn li vir karê xwe berdewam dikim. Ez û malbata xwe em karê dêrê dikin. Demeke dirêj jin û mêrekî Ermen Beyzar Alata û Sarkis Sıtkı Eken li cem me diman. Tu kesê wan li Diyarbekirê tunebû, li dêrê me xanî dabû wan û hemû pêwistiyên wan ji aliyê dêrê ve dihat dabîn kirin. Beyzar Alata di sala 2014an de Sıtkı Eken jî di sala 2016an de jiyana xwe ji dest dan. Jiyana wan di belgefilman de jî cih girt. Li Diyarbekirê tu kesekî ku ew nas nedikirin tunebu. Li dêrê em bi hev re diman. Kevneşopiyeke dêrê heye ku ew jî ev e; kesên xizan ku rewşa wan a aborî nebaş e û cihekî wan ê mayinê tunebe dêr alîkariyê bi wan dike û wan tîne cem xwe."

**Bilindbûna Dayika Meryem a ber bi asîman ve...**

Keşeyê dêra Suryaniyan Akbulut di derbarê cejna Bilindbûna Dayika Meryem a ber bi asîman ve jî wiha axivî: "Her sal ev cejn bi rêkûpêk tê pîroz kirin. Xrîstiyanên cîhanê, 15ê Tebaxê roja ''Bilindbûna Dayika Meryem a ber bi asîman ve" pîroz dikin. Dayika Meryem ji bo me pîroz e. Binêrin ev dêr jî li ser navê wê hatiye ava kirin. Ev cejn ne tenê ji bo Suryaniyan ji bo hemû Xrîstiyanan girîng e." Akbulut ji dîrokê û heta niha di derbarê pîrozkirina vê cejnê de jî agahiyên wiha dide: ''Roja Cejnê Suryaniyan di sîtilên mezin de Keşkek û Lebenî çê dikirin û li kesên ku dihat cejnê belav dikirin. Her wiha di cejnê de tirî jî cîhekî girîng digire. Di dema ayînê de tirî jî li mêvanan dihat belavkirin. Ev kevneşopî hê jî berdewam dike. Hejmara me kêm be jî em hê jî vê cejnê pîroz dikin û tirî li mêvanên xwe belav dikin. Êdî ev cejn carinan weke cejna tirî jî tê binavkirin û dibêjin cejna tirî.

## "Tirî ji bo Suryaniyan gelekî girîng e"

Akbulut, girîngiya tirî bo Suryaniyan jî wiha vedibêje: ''Dema em li dîrokê dinêrin tirî ji bo Suryaniyan gelekî girîng e. 5-6 hezar sal berê rezvanî cîhekî girîng di jiyana Suryaniyan de digirt. Kesê ku şeraba yekem çêkiriye û rezê yekem çandiye Suryan e. Tirî ji bo mirovahiyê jî cîhekî girîng digire wek mînak ji tirî; şerab, dims, bastîq û sincoq tê çêkirin. Dema em li Încîlê dinêrin behsa tirî û rezvaniyê tê kirin.

Keşeyê dêrê di derbarê koçberbûna Suryaniyan de diaxife û axaftina xwe wiha bidawî dike: ''Ji destpêka dîrokê heta niha Suryaniyan tu carî bi kesî re şer nekiriye û li cihê ku şer lê heye jî qet nemane û ji ber wê her tim koç kirine. 100-150 sal e Suryaniyan her tim koç kirine. Ji ber ku ew li hember şer in li aliyê aştiyê ne. Daxwaza wan her tim ev e ku di nav aştî û aramiyê de bijîn. Di Încîlê de Îsa Mesîh dibêje; 'Heta ku ji we tê bi mirovahiyê re di nav aştiyê de bijîn, dema ku rewş ji bo mayinê ne guncaw be tu maneya ku hûn li wir bimînin tune.'

Akbulut dibêje, ''Berê li Diyarbekirê dêr zêde bûn; Dêra Suryaniyan, Dêra Qedîm a Dayika Meryem û Dêra Keldaniyan hene. Li paş minareya çarling li kêleka Dêra Ermeniyan a Surp Giragos heye. Wek mînak Mizgefta Mezin a Diyarbekirê berê dêra Suryaniyan bû."

---

Hunermend Îssa Hassan:

# Amûra muzîkê jiyana muzîkjen bi xwe ye

■ NÛJÎN ONEN

Dema hûn li stran û muzîkên wî guhdar dikin, ewil dengê buzukiyê tê. Motîfên Kurdî xwe li dora we dipêçin, piştre dengê piyanoyê berê we bi rojavayê Ewropa vedike. Dengê her du amûran dibin yek û gîtara Flamenko dema lê dide mirov dibêje dê jineke cilsor bi qondereya xwe ya bi kabik derkeve ser dikê û mirov mest bike. Îssa Hassan hunermendê Kurd bi eslê xwe ji gundê Cebilgirawê girêdayî navçeya Omeriyan e. Lê di dema Osmaniyan de kalikê wî sirgûn kirine û çûne Lûbnanê. Îssa Hasan di sala 1970î de li Beyrûdê ji dayik bûye. Dema 14 salî bûye hatiye Parîsê û li Fransayê bicîh bûye. Yek ji hûnermendekî Kurdan ê xwedî tarzeke cûda ye. Di stran û muzîkên xwe de bi piranî Buzukiyê û li gel wê jî gelek amûrên din lê dide. Li Ewropa tevlî sedan konsertan bûye. Heta niha 6 albûmên wî derketine. Îssa Hassan di derbarê jiyan û muzîka xwe de ji Heftenameya Basê re axivî.

> "Xerîbî hergav zaroktiya mirov, xortaniya mirov û bêhna bêtawaniyê ji mirov didize. Lê her wiha gelek tiştên teze ku mirov ne li bendê ye jî tîne pêşiya mirov. Dîsa bi saya wê, meriv kes û dezgehên ku gava mirov li welatê xwe be nikaribe bibîne dibîne."

Îssa Hassan çîroka xwe ya destpêkirina muzîkê wiha vedibêje: "Nizanim gelo hûn dizanin, lê Omerî hemû ji muzîk û govendê hez dikin. Ez jî di zaroktiya xwe de, di bin bandora vê yekê de mame. Muzîk, govendê tîne û govend jî bê muzîk nabe. Bi awayekî xwezayî ez di nav muzîkê de bûm, bêyî ku bizanibim. Piştre min dît ku gelekî kêfa min tê ku karibim wek mezinan, stranan bibêjim, li amûrekê bidim û govendê bigirim. Bawer dikim hîn deh salî bûm, gava dê û bavê min ji min re gîtareke zarokan kirin. Ji wê rojê û pê ve amûrên muzîkê ji destê min neketine.

**"Min hêza xwe bi temamî da vî warî"**

Hin kes hene, ji zaroktiya wan diyar e ku mezin bibin ew ê berê xwe bi ku ve bikin. Îssa Hassan jî yek ji wan kesan e ku berê xwe bi muzîkê ve kiriye: "Di wan salên zaroktiyê de, kurekî xalê min hebû. Carekê tevî tembûra xwe hatibû mala me. Min jê xwest ku tembûra xwe li mala me bihêle da ku ez karibim hinekî pê bilîzim. Wî jî negot na û ji min re hişt. Min jî her roj serê maliyan bi tinge-ringa xwe dibir, heta ku têra xwe ji heq derketim. Dema ez hatim Parîsê û min gelek kesên ku berê hatibûn vir nas kirin. Di nav wan de jî hunermendên ji deverên cihê yên Kurdistanê hebûn. Carinan di nava xwe de, carinan ji bo şahiyan û carinan jî li ser daxwaza malbatê, me muzîk çêdikir û govend digirt. Gelek dem derbas nebû ku min û malbata min jî dît ku ez tenê ji muzîkê re zîrek, jêhatî me. Wan zor li min nekir lê min hêza xwe bi temamî da vî warî. Deriyên hînbûna muzîkên cûr bi cûr jî li pey vê daxwaz û azweriyê hatin."

Hin hûnermend hene dûrbûna welêt ji bo wan dibe derfeteke baş ji bo pêşketinê. Hassan bandora dûrbûna ji welêt a li ser hûnera xwe wiha vedibêje: "Xerîbî her gav zaroktiya mirov, xortaniya mirov û bêhna bêwetaniyê ji mirov didize. Lê herwiha gelek tiştên teze ku mirov ne li bendê ye jî tîne pêşiya mirov. Dîsa bi saya wê mirov kes û dezgehên ku gava mirov li welatê xwe be nikaribe bibîne dibîne. Dewlemendiyeke wiha ye ku divê mirov bijî da ku jê fêm bike. Gelo hemû xerîbî wiha ne, ez bi xwe nizanim lê li Parîsê mirov her dem tişt û kesên ku kêm caran dikare bibîne dibîne. Ev yek ji muzîka min jî xuya dibe."

**"Amûrê muzîkê jiyana hunermend bi xwe ye"**

Îssa Hassan di derbarê albûmên xwe û amûrên lê dixe de wiha dibêje: "Heft albûmên min hene. Wek hemû muzîkhezan ez jî çend amûran lê didim lê ya ku pê re herî rihet im buzukî ye, jê re tembûr jî dibêjin. Ji deverên din ên Kurdistanê bêtir, li ba Kurdên Sûriyê û Libnanê zêdetir tê naskirin. Lê dengê wê gelek bi awaza Kurdî re li hev dike û dikare xemgînî û xweşhaliyê bi hêsanî bi mirov bide hîskirin. Teybetiyeke tembûrê heye ku ew li ser zikê mirov e û bi hejandina noteyên muzîkê, mirov wê di nav û dilê xwe de his dike. Amûra muzîkê tu tiştekî nade mirov lê ew jiyana muzîkjen bi xwe ye. Lê li gel min amûrên din jî hene, piyano "yê awayê cazê", gîtara flamenko, doublebass (kemana herî mezin), rîtim û dengê xwe jî bi kar tînim. Albûmên min hinek ji wan enstrumental û hinek stran in. Ez bi xwe distrêm û gelek stranên xwe jî ez bi xwe diafirînim (compositoriya wan dikim)"

Dema em li stranên Îssa Hassan guhdar dikin motîfên Flamenko jî tên guhê mirov. Stîleke cûda di muzîka wî de heye. Hûnermend Hassan wiha qala vê stilê dike: "Xerîbî gelek caran fêydeyê li mirov dike. Ez di sala 1992an de rastî muzîkvanekî Îspanî hatim, gîtara flamenko dijenî. Me li cem hevalan li Parîsê, di gel hev perçayek lê da û me dît ku amûrên me û hestên muzîka me li hev dikin. Ev yek ji bo min pir balkêş bû! Lê helbet, piştre me gelek kar bi hev re kirin ji bo ku em vê hevdîtinê bi pêş ve bixin."

**"Ez dixwazim bi muzîkê me nas bikin"**

Hassan li ser helwesta biyaniyan a li hember muzîka Kurdî jî van tiştan dibêje: "Piraniya konserên min di festivalan de an jî di sahneyan de dibin û miletên ku zêdetir beşdar dibin biyanî ne! Ji ber armanca min ew e ku ez muzîk û hunera xwe (Kurdî) bi kesên din bidim nasîn. Belkî hûn bawer nekin lê gelek kes hene ku navê Kurdan jî nebihîstine. Ji ber vê yekê, ez bi muzîkê dixwazim ew me nas bikin. Ne tene bi bûyerên xemgîn an jî bi siyasetê û mêrxasiyê! Muzîk dilê xelkê nerm dike û bi riya vê, ji ber xwe ve xwe nêzîk dikin û dixwazin zedêtir alikariya miletê me bikin."



## "Heta niha derfet mîna îro li ber me venebûye"

Îssa Hassan nêrînên xwe yên di derbarê muzîka Kurdî de wiha tîne ziman: "Bi dîtina min, rewş ber bi başiyê ve diçe. Ev jî ne tenê bi hunermendan ve girêdaye, giradayê rewş û îmkanên civata Kurdî bi xwe ne. Gava ku Kurd ji bombe û agir birevin, wê hunera Kurdî çawa karibe pêş ve biçe? Lê gava ku mirov hinekî aram dibe û xema wan a yekem ne 'çawa li jiyanê mayîn' be wê gavê hemû tişt, huner jî, dikare baştir pêş ve biçe. Rewşa niha ya Kurdan (taybetî jî ya Kurdên Başûr, aqûbet li serê yên din jî be) ya herî baş e. An jî ez wiha dizanim. Ji ber vê yekê jî bê guman pêşveçûnên baş û mezin hene."

Hassan di dawiya axaftina xwe de dibêje, "Rehetî û berfirehiya ku îro li Kurdistanê heye dikare rê li ber hunera Kurdî jî veke û ew jî dikare xwe baştir îfade bike" û wiha pê de diçe: "Heta niha derfeteke weke ya îro li ber me venebûye. Divê em bi hunera xwe wê biparêzin ku karibin bêtir jê fêydeyê bibînin."

---



FIRAT CEWERÎ

## Ez dinivîsim loma ez heme

Gotina ''çima tu dinîvîsî?" herçiqas pir hêsan bixuye jî, yek ji pirsên herî zehmet e. Çima ez dinivîsim? Çima min nivîsand? Çima min bi kurdî nivîsand? Ma mamosteyê min ez teşwîq kirim? Na! Ma rîspiyên malbatê halan di min hildan, gotin Firatê min, binivîse? Na! Ma rêxistina min, partiya min, eşîra min got, binivîse? Na! Ma min bi kurdî binivîsanda ez ê navdar bibûma? Na! Ma ez ê bi nivîsandina kurdî dewlemend bibûma û pê bibûma xwediyê mal û milk? Dîsa na.

Gava min nivîsand, ev hemû gotinên ku min li dû hev rêz kirin li dijberî min radiwestiyan. Bi nivîsandinê girtin, koçberî, heta kuştin li benda min bûn. Ji ber ku ên berî min di wê riyê re bihurîbûn. Ên ku berî min bi kurdî nivîsandibûn di nav xelatan de nemabûn. Wan ji ber nivîsandinê tenê êş û elem kişandibûn.

Ya rastî gava min nivîsand, haya min zêde ji wan jî tunebû. Tenê mîna ku dengek diket guhên min û digot binivîse! Min jî nivîsand. Ev nêzîkî çil salî ye ez di vê riyê re dimeşim. Carina riya min teng, carina fireh dibe. Ez carina mîna bi serkaşekî ve hilkişim, diwestim, lê ranawestim û bi jor ve radipelikim. Ez carina diêşim, carina ên ku ez bi zarê wan dinivîsim min diêşînin, lê wê êşê jî dinivîsim. Gava nanivîsim aciz dibim, gava nikarim binivîsim dinya li ber çavên min reş dibe. Nivîsandin hertim ji min re bûye gopalê hêviyê û min xwe daye ser. Her cara ez bêhêvî bûme nivîsandin hatiye hawara min. Gotina ''Berê gotin hebû" di dil û mêjiyê min de rûniştiye û loma min hertim xwe spartiye gotinê. Min hêrsa xwe, evîna xwe, bêrîkirina xwe, bêhntengiya xwe bi gotina nivîskî daye der. Nivîsê carina cîhana fireh li min teng kiriye, carina jî cîhana teng li min pir fireh kiriye. Cîhanek kiriye du, sê, çar cîhan. Bi xêra nivîsê min gelek caran xwe ji vê cîhana heyî daye alî û li cîhanine din geriyame. Ez ji rastiya heyî bi dûr ketime û min li gora xwe rastîne din ava kirine. Ez di cîhana xeyalan de li dû xeyal û fantaziyan beziyame. Ez carina bi dû nêçîra mirovên belengaz ketime, min bi destê wan girtiye, ew ji quncikên wan ên xalî derxistine û xwestiye balê bikişînim ser wan. Ez carina pêrgî hin gernasan hatime ku ji wan re xerab ketiye û di quncikên xwe de hatine jibîrkirin. Heta ji min hatiye min ew jî derxistine rûkala dinyayê. Ez carina keniyame, carina jî ewrekî xemgîniyê bi ser min de girtiye û bi qûre qûr giriyame. Ez carina bi rojan li dû gotinekê geriyame, carina jî mîna ku yek di guhên min de bike pistînî, gotin li dû hev rêz bûne. Min carina jiyanek, carina bajarek, carina cîhaneke din ava kiriye. Carina jî min jiyanek, bajarek, cîhanek bi du rêzan ji navê rakirine. Ez hingî bi hêza gotinê hesiyame. Gava min ew hêz di xwe de dîtiye ez ji xwe tirsiyame. Lê ez ji tu hêzeke din netirsiyame. Min cesareta xwe ji nivîsê standiye. Min bi nivîsa xwe tu carî nexwestiye ez kesî pîs bikim an biêşînim. Min pê pesnê pîsan jî nedaye. Ez bi aqilê xwe şêwirîme û min daye dû dilê xwe.

Nivîsandin wek vîrusekê ye, di hemû laşê min de geriyaye, ez bixwazim jî nikarim jê pak bibim. Min di jiyana xwe de nexweşî mîna nexweşiya nivîskariyê nedîtiye. Gava tê, mirov nema jê pak dibe, heta mirinê dev ji mirov bernade. Loma, nivîsandin nexweşiyeke şexsî ye. Gava mirovê nivîskar nenivîse, diêşe, bi nivîsê êşa xwe sivik dike. Ez ê nebêjim ji bo ez êşa mirovatiyê kêm bikim ez dinivîsim û ez ê nebêjim armanca nivîsandina min ji zilmê rizgarkirina xelkên dinyayê ne jî. Ez dikarim tenê vê bibêjim, dibe ku bi nivîsandinê ez êşa xwe kêm dikim. Ez yek im, gelek kesên din jî dikarin xwe di min de bibînin. Bi nivîsandinê, ez gelek jiyanan di jiyanekê de dicivînim. Gelek kesan di kesekî de. Ez dibêjim, mirovek nikare xwe di jiyana hezar kesî de bibîne, lê hezar kes dikare xwe di jiyana yekî de bibînin. Loma, divê ew yekê ku ji destê nivîskar hatiye afirandin dereweke ji rastiyê rastir be ku xwe dirêjî dil û mêjiyê bi hezaran bike.

Herçiqas hezar jî xwe tê de bibînin, divê ez bi durustî bibêjim ku di gava pêşî de ez ji bo xwe, ji bo liva di hudirê xwe de, ji bo dermankirina birînên dil û ruhê xwe dinivîsim. Ev helwest carina dikare bi kêrî dermankirina birînên dil û ruhên ên din jî bê.

Dîsa jî armanca nivîsê ne bi tenê dermankirina êş û janan e. Mirovan bi hezar salan, bi hezar armancan nivîsandine. Ya min jî bi tenê nixteyek ji wan e, dilopek ji deryaya bêbinî ya gotinê ye…


# Îran li ser qonaxa piştî referandûmê jî kar dike

ESKENDER CEIFERÎ

Di dema birêveçûna Konferansa Aboriyê ya Cîhanî de li Tehrana paytexta Îranê, şandeya Kurdistanê jî li wir amade bû û du protokolên aborî li gel berpirsên wî welatî îmze kirin. Lê tişta balkêş ev bû ku di dema îmzekirina protokolan de, ala Kurdistanê jî weke welatekî li cem ala Îranê hatibû danîn. Tevî ku Komara Îslamî bi rengekî eşkere ragihandiye ku ew li dijî encamdana referandûma li Başûrê Kurdistanê ne, lê di konferansê de ala Kurdistanê hatibû hildan bê ku ala Iraqê bê danîn.

Di navbera şandeya Kurdistanê ya Yekitiya Hawirde û Henardeyê û Odeya Bazirganiya Hewlêrê û berpirsên aborî yên Îranê de protokolên berdewamiya alîkariyan hatin îmzekirin. Dibe ku êdî Îran di fikra qonaxa piştî referandûmê de be. Eger xelkê Herêma Kurdistanê biryara serxwebûnê bide, Îran naxwaze bazar ji dest wan derkeve. Di protokolê de hatiye destnîşankirin ku wê bazirganî di navbera Hewlêr û Tehranê de berdewam bike û wê ofîsa bazirganiyê ya Îranê jî li herêma Kurdistanê bê vekirin û ofîsa bazirganiya Kurdistanê jî wê li Îranê bê vekirin. Rast e ku Îran bi eşkere dijatiya






referandûmê dike lê di konferanseke aborî ya cîhanî de ku nûnerên 24 dewletên cîhanê jî tê de beşdar bûne, Tehran nikare giringiyê nede Herêma Kurdistanê.

**Li Herêma Kurdistanê zêdetirî 200 kompaniyên Îranê hene**

Sadiq Zîbakelam siyasetvanê Fars ku bi xwe li Tehranê dijî, dibêje divê Komara Îslamî vê rastiyê bibîne ku zimanê xelkê Herêma Kurdistanê ne zimanê xelkê din yê Iraqê ye û çandên wan jî, ji hev cuda ne. Eger Komara Îslamî bixwaze, dikare rê li ber bandora zêdetir a gelek dewletan li Herêma Kurdistanê bigire. Elî Ekber Haşimî Refsencanî berpirsê berê yê Civata Destnîşankirina Berjewendiyên Komara Îslamî, dema ku biryar bû Iraq bibe dewleteke federal, ragihand ku ew qet îtirafê bi Herêma Kurdistanê nakin û Iraqa federal jî qebûl nakin. Lê dema ku biryar hate standin, Îran ji yekemîn dewletan bû ku li wir nûnertî vekir. Zîbakelam teqezê jî dike ku eger Komara Îslamî ji nêzîkî 200 kompanyayên xwe li Herêma Kurdistanê mifahê bistîne, dikare bandora aboriyê di siyasetê de jî bibîne.

**"Em tu caran êrişî hêzên Pêşmerge nakin"**

Piştî ku Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, daxwaza DYA ya ji bo paşxistina dema encamdana referandûmê red kir, êdî gotara hemû aliyên Iraqî yên nêzîkî Îranê di derbarê serxwebûna Kurdan de nermtir bûne. Hadî Amirî sekreterê saziya Bedr ya şîeyan ku nêzîkî Îranê ne, ragihandiye ku ew ti caran êrîşî ser hêzên pêşmerge nakin lê Kurd nabe ji Iraqê veqetin û ew ê kêşeyan bi riya danûstandinan çareser bikin. Tevî ku 42 saziyên çekdar û 28 saziyên din ên nêzîkî Sipaya Pasdaran li Iraqê hene, lê daxuyaniyên wan ên vê dawiyê, ji yên berê nermtir bûne. Selîm Cebûrî serokê Parlamentoya Iraqê jî ragihandiye ku ew ê rêzê li biryara xelkê bigirin.

Elî Xamineyî Rêberê Komara Îslamî gotiye ew li dijî referandûma parçekirina Iraqê ne lê ji xeynî vê gotarê, yên din weke berê xurt nemane. Îran dixwaze ji Îsraîlê zêdetir nêzîkî Başûr bibe lê li gor ku Îran dibêje, her kesek ku alîkariya Kurdên Rojhilatê Kurdistanê bike ku li hemberî hikûmetê serî hildin, ew dijberê Komara Îslamî ne. Beriya çend mehan şandeyeke bilind a Yekgirtiya Îslamî ya Kurdistanê serdana Tehranê kir û bi Elî Larîcanî serokê Parlamentoya Îranê, Elî Ekber Wîlayetî Şêwirmendê Elî Xamineyî û her wiha hejmareke din ji berpirsan re civiyabû. Wê demê, Tehranê ragihandibû ku eger pirsgirêk bi riyên aştiyane bêne çareserkirin, serxwebûna Kurdistanê ji bo Îranê nabe gef û ew dikarin xweşbîn bin. Ji bilî Xamineyî, Muqteda Sedr Serokê Tevgera Sedr jî li hemberî dewletbûna Kurdan hinek tundiyê nîşan dide. Ew Nurî Malikî rexne dike û dibêje ku Kurdan ji ber siyaseta şaş a hikûmeta Malikî daxwaza dewletbûn û serxwebûnê kirin.

Partiyên Rojhilatê Kurdistanê jî dibêjin planên Tehranê bi ragihandina serxwebûna Kurdistanê asteng dibin lê nabe rê bê dayîn ku Tehran di nava Kurdistanê de van zêdegaviyan bike.

**"Asta henardeyê ji vê xala sînorî, ji sedî 26 bilind bûye"**

Tevî ku hin aliyên Kurdî ku dijatiya serxwebûnê dikin, îdia dikirin ku Îran wê deriyên xwe yên bazirganî li ser Herêma Kurdistanê bigire, Cehangîr Bexşî rêveberê Gumrika Başmax ya Merîwanê ragihandiye ku asta henardeyê ji vê xala sînorî, ji sedî 26 bilind bûye.

Ji destpêka biharê ve heya niha bi qasî 100 milyon Dolaran kelûpel ji Gumrika Başmaxê û bi qasî 170 milyon Dolaran jî, ji xalên din ên sînorî ji Îranê derbasî Herêma Kurdistanê hatine kirin.

Dibe ku berpirsên Partiya Demokrat a Kurdistanê jî, ji qonaxa piştî referandûmê piştrast bin ji ber ku li gora PDKê, ne merc e ku Herêma Kurdistanê piştî referandûmê rastî krîzên mezin bê. Dibe ku çend pirsgirêkên biçûk derkevin lê pêwendiyên Herêma Kurdistanê li gel Tirkiye û Îranê wek du welatên cîran di rewşeke asayî de dimîne û ti yek ji wan welatan jî di pratîkê de li dijî serxwebûna Herêma Kurdistanê nabin.

> Di protokolê de hatiye destnîşankirin ku wê bazirganî di navbera Hewlêr û Tehranê de berdewam bike û wê ofîsa bazirganiyê ya Îranê jî li herêma Kurdistanê bê vekirin û ofîsa bazirganiya Kurdistanê jî wê li Îranê bê vekirin.

# Amara tuşbûyên HIV li Îranê bilind dibe

AIDS an jî nexweşiya HIV, nexweşiyeke pir metirsîdar e û dibe sedema mirina mirov. Di demên derbasbûyî de rêjeya tûşbûyên wê li Îranê bilind bûye. HIV qelskirineke xurt a sîstema parastina canê mirov e û sedema wê vîrûsek e ku xeliyeyên taybet ên sîstema parastinê dikuje. Karê herî baş ji bo xweparastin li hemberî vê nexweşiyê ev e ku kesên ku bi gelek kesan re seksê dikin, kondoman bi kar bînin.

Perwîn Efser Kazirûnî rêvebera Saziya HIV ya Wezareta Tendirustiyê ya Îranê dibêje li gor pêşbîniya wan, zêdetirî 66 hezar kes li Îranê tûşî nexweşiya HIV bûne ku tenê 35 hezar kes ji wan ji aliyê dewletê ve hatine tomarkirin û nêzîkî 9 hezar û 500 kes jî bi vê sedemê mirine. Wezareta Tendirustiyê jî piştrast kiriye ku heya destpêka bihara 2017an, 66 hezar û 359 kes li wî welatî tûşî AIDSê bûne ku dewletê tenê karîbû navên 34 hezar û 949 kesan tomar bike lê nehatiye xuyakirin ka gelo plana dewletê çawa hatiye bicîkirin. Tevî ku tê gotin ew amar tenê hatine pêşbînîkirin, lê nayê zanîn pêşbîniya tûşbûyan li gor kîjan standardê bûye û nayê zanîn amara wan kesên ku mirine, ya çend mehan e.

Kazirûni got ku ji sedî 84 tûşbûyî zilam û ji sedî 16 jî jin in ku temenê ji sedî 53ên ji wan kesan di navbera 21 heya 35 saliyê de ye û piraniya wan ne di bin çavdêriya tendirustiyê de ne.

Wê berpirsa Îranî, salekê beriya niha ragihandibû ku 30 hezar û 727 nexweşên AIDSê hatine tomarkirin ku idîa dike bi qasî ji sedî 30 hejmara tûşbûyên wê û ji sedî 70 tûşbûyan jî hîn nezanîne ku HIV hene.

**"100 hezar tûşbûyên vê nexweşiyê li wî welatî hene"**

Her sal ew amar li Îranê bilind dibe lê amarên ku têne ragihandin, hemû li dij in û ji ber tinebûna saziyên serbixwe di vê derbarê de amareke rastîn tine ye. Mînû Muhrez berpirsa Navenda Lêkolînên HIV li wî welatî, sê salan beriya niha ragihand ku 100 hezar tûşbûyên vê nexweşiyê li wî welatî hene ku nêzîkî 30 hezar kesan hatine tomarkirin. Bi vî rengî xuya dibe ku her sal gelek kes tûşî HIV dibin lê amara tomarkirî, zêde nayê guhertin.

Her wisa Mesûd Merdanî endamê Komîteya Giştî ya HIV li wî welatî daye xuyakirin ku tevî nebûna lêkolînên hûr, li gor pêşbîniya saziya Tendirustiyê ya Cîhanî, 80 heya 90 hezar tûşbûyên vê nexweşiyê li Îranê hene ku 70 hezar kes ji wan, bixwe jî nizanin ku HIV hene yan jî nexweşiya xwe vedişêrin.

Çalakvanên serbixwe, ji xixmetguzariya dewletê ji bo nexweşên AIDSê bi gazin in lê rêvebera Saziya HIV ya Wezareta Tendirustiyê ya Îranê îdia dike ku di salekê de 12 hezar û 360 kesan ji bo şêwr û dermanê serdana navendên pêwendîdarî bi rêxistin û saziyên wan kiriye û ji vê hejmarê, 9 hezar û 880 kesan dermanên pêwîst ji bo lihemberderketina vê nexweşiyê wergirtine.

Li tevahiya Îranê, hezar û 500 navendên haydarkirin ji HIV hene. Ew dibêjin li gor rêkeftinên navdewletî, divê heya sala 2030an navên ji sedî 90 tûşbûyên vê nexweşiyê li Îranê bên tomarkirin û ji bo dermanê




serdana navend û cihên pêwendîdar bikin. Her wisa Komara Îslamî hatiye erkdarkirin ku rê li ber giştgirbûna AIDSê li wî welatî bigire.

Li hemû cîhanê nêzîkî 37 milyon kesan tûşî vê nexweşiyê bûne. Di 2012an de 10,6 mîlyon kesan derman bi kar anîn, di 2013 an de ew hejmar bû 13 milyon. Yên ku nekarîn derman bibin jî li welatên xizan dijîn û piranî ne xwedî derfet in.Tenê 19 mîlyon kes ji hejmara giştî dizane ku bi vê nexweşiyê ketine. Ji ber kêmbûna derfetên Tibbî bi mîlyonan kes ji bo nexweşiya xwe teşîs bike ji testan bêpar dimîne.

**30 sal beriya niha hat dîtin**

Yekemîn car 30 sal beriya niha HIV li Îranê hat dîtin. Wê demê xwîna ku ji kompaniyeke Fransî hatibû Îranê, dabûn zarokekî berketî bi nexweşiya Hêmofîlî. Piştî çend salan hejmara tûşbûyên vê nexweşiyê li wî welatî gêhişt 200 heya 500 kesan. Pişt re di nav wan kesan de ku bi gelek kesan re seksê dikin û di nav tûşbûyên madeyên hişber de jî hate dîtin. Ji 12 sal beriya niha ve para herî zêde ji seksê û pişt re ji derziyan ji aliyê bikarhênerên madeyên hişber ve bûye û ti tûşbûneke HIV bi xwîna hawirdekirî nehatiye tomarkirin.

Di derbarê xwîna pîs de dosyeyek li dadgehê hat vekirin û saziya Veguhestina Xwînê ya Îranê bi dayîna xerameyê bi malbatên 974 kesan hat cezakirin lê vê biryara dadgehê nekarî rê li ber bilindbûna amarên tûşbûyên HIV bigire û ne jî tendirustiya tûşbûyên ji ber xwîna pîs a hawrirdekirî ji Fransayê vegeriya.

Ji kesên ku bi nexweşiya HIV dikevin ji sêyan du li wan welatan in ku dikarin xwe bigihînin dermanan. Tenê di sala 2013an de mîlyonek û nîv kes ji AIDSê mirine. Hejmara kesên ku derman dibin zêde bûye.

Li gorî raporên UNAIDSê bi taybetî ev nexweşî li Rojhilata Navîn û li welatên Ewropaya Navîn bilind dibe.

> Li hemû cîhanê nêzîkî 37 milyon kesan tûşî vê nexweşiyê bûne. Di 2012an de 10,6 mîlyon kesan derman bi kar anîn, di 2013 an de ew hejmar bû 13 milyon. Yên ku nekarîn derman bibin jî li welatên xizan dijîn û piranî ne xwedî derfet in.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Piştî du meh û nîvan girtinê, Mîlad Deştî ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve li bajarê Nexede serbest hat berdan. Mîlad Deştî ji dema binçavkirinê ve ji bo lêpirsînê ji bo girtîgeha taybet a Îstixbaratê hatibû veguhestin.

Sê welatiyên Kurd bi navên Umêd Seydepûr, Yûsif Seydepûr û Enwer Ebdullahî ji girtîgeha Îstixbarata Îranê li Ormiyê ji bo girtîgeha bajarê Şinoyê hatin veguhestin. Ew sê welatî nêzîkî sê mehan beriya niha bi kesekî din ê bi navê Feran Seydepûr re hatibûn girtin û Feran piştî lêpirsînê, serbest hatibû berdan. Tometa wan çar kesan ji aliyê hêzên ewlehî ve endametî di partiyeke Kurdî de hatiye ragihandin.

Dadgeha Zahidanê, welatiyekî Kurd ê bi navê Ebûbekir Rustemî bi darvekirinê ceza kir. Rustemî xelkê bajarê Kirmaşanê ye û du salan beriya niha li Zahidanê hatiye girtin. Tometa wî Şerê li dijî Xwedê hatiye ragihandin.

Kolberekî Kurd ê bi navê Izedîn Xalidî xelkê gundê Badikê yê Nazlûya Ormiyê ji aliyê hêzên sersînor ve hate kuştin.

Li navçeyên sînorî yên Şinoyê, komeke kolberan rastî êrîşê hatin û di encamê de kolberekî bi navê Fercad Cesîmî xelkê gundê Sîdanê yê Somayê jiyana xwe ji dest da.

Kolberek bi navê Necîb Azadî li navçeya Mirgever ya Ormiyê ji aliyê hêzên sersînor ve hate birîndarkirin û ji bo nexweşxaneya wî bajarî hat veguhestin. Li gor ku bijîşkan ragihandiye, rewşa wî nebaş e.

Dadgeha Xoyê, welatiyekî bi navê Husên Eskenderzade bi tometa kuştina heft kesan ji endamên malbata hevjîna xwe bi pênc caran îdamê û 14 salan girtîgehê ceza kir. Husên Eskenderzade daxwaza pêdeçûnê radestî dadgehê kiriye lê ji parêzerê wî re hatiye ragihandin hikma wî nayê kêmkirin û dibe ku di demeke nêzîk de were darvekirin.

Çend kesên nenas agir berdan avahiya navenda Çandî û Wêjeyî ya Vejîn li Merîwanê. Mehmûd Mubarekşahî rêveberê navenda Vejîn ragihandiye ku ew di riya yasayê re mijarê dişopînin. Hatiye ragihandin ku endamên saziyeke dewletê, agir berdane avahiya vê navendê û ji wir reviyane. Heya niha polîsan pêwendîdarî li mijarê dosye pêk neaniye.

Li Seqizê şeş welatiyên Kurd ên bi navên Nadir Mecîdiyan, Şehram Mecîdiyan, Saman Paşayî, Fatih Dûndarî, Bêhrûz Rîşesahib û Mihemed Şemsî bi tometa propagende li dijî hikûmetê hatin dadgehîkirin. Tometa wan şeş kesan beriya niha alîkariya partiyeke Kurdî hatibû ragihandin. Ji wan kesan, Nadir Mecîdiyan rojnamevan e û Saman Paşayî jî mamosteyê zanîngehê ye.

Li girtîgeha Îlamê kesekî bi navê Ebdulla Reşîdpûr bi tometa kuştina kesekî din, Tohîd Heqmuradî li girtîgeha Şîrwanê bi tometa kuştinê, Hemze Rehîmpûr xelkê Serdeştê li girtîgeha Zencanê bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber û li girtîgeha Ormiyê Xalid Emînî xelkê Mehabadê bi tometa kuştinê hat darvekirin.



Li Şinoyê welatiyekî bi navê Xelîl Şahî xelkê navçeya Hê bi şeş salan girtîgehê hate cezakirin. Tometa wî endametî di partiyeke Kurdî de bûye û beriya salekê ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve bi kesekî din bi navê Zekeriya Safkar re li wî bajarî hatibûn girtin û heyameke dirêj di bin lêpirsînê de man û pişt re bi danîna kefaletê hatin berdan.

Li Serdeştê welatiyekî Kurd bi navê Têymûr Xizirpûr kurê Mustefa ku 44 sal temenê wî ye, bi tometa alîkariya endamên partiyeke Kurdî hate girtin û ji bo lêpirsînê ji bo cihekî nediyar hate veguhestin.

Li bajarê Qurwe, jineke çalakvan bi navê Sara Rizayî ku avakera kampanya Na Ji Bo Destdirêjiyê bû, ji aliyê hêzên ewlehî ve rastî lêpirsînê hat. Sara Rizayî bi îmzekirina belgeyekê hatiye erkdarkirin ku divê karûbarên kampanyayê bi dawî bînin û bi vê mercê serbest hatiye berdan.

Li gundê Sînganê yê navçeya Nelasê, kur û bavek bi navên Sidîq û Xelîl Eynî bi tometa propagende li dijî Komara Îslamî di riya pêwendî bi partiyeke Kurdî re hatin girtin û ji bo lêpirsînê ji bo cihekî nediyar hatin veguhestin. Tevî ku malbata wan serî li saziyên ewlehî û dadê dane lê heya niha cihê ragirtina wan nediyar e.

Dehan hiktar ji erdên daristanên Zagrosê li parêzgehên Îlam, Ormiye, Kirmaşan û Sine ji ber topbarana hêzên Sipaya Pasdaran ji nav çûn.

> Kolberekî Kurd ê bi navê Izedîn Xalidî xelkê gundê Badikê yê Nazlûya Ormiyê ji aliyê hêzên sersînor ve hate kuştin. Kolberek bi navê Necîb Azadî li navçeya Mirgever ya Ormiyê ji aliyê hêzên sersînor ve hat birîndarkirin û ji bo nexweşxaneya wî bajarî hat veguhestin. Li gor ku bijîşkan ragihandiye rewşa wî nebaş e.

## Nifşê winda;

# Penaberên ji perwerdehiyê bêpar



■ DERYA KILIÇ

Bi hevkariya Navenda Lêkolînên Siyaset û Koçberiyê ya Zanîngeha Hacettepeyê (NVSKZH-HUGO) û Nevanda Lêkolînên Koçberî û Penaberî (NVKP-ÎGAM) û bi piştevaniya Balyozxaneya Brîtanyayê ya li Enqereyê bi navê “Elite Dialogue: Lêkolîna Hêvî, Kêşe û Rewşa Xwendarên Zanîngehê û Akademîsyên Penaberên Sûriyê li Tirkiyê – 2017” hate çê kirin.

Serokê HUGOyê Doç. Dr. Murat Erdoğan serokatiya projeye kiriye. Seroka Navenda Vêkolînên Hîndekariya Bilind a Zaningeha Zanistên Civakî ya Enqereyê Doç Dr. Armağan Erdoğan û Cîgira Serokatiya Navenda Lêkolîn û Pratîka Siyaseta Cîvakî ya Zanîngeha ETÜ-TOBBê Doç. Dr. Alk. Başak Yavçan beşdarî projeyê bûne. Herwiha Tülin Haji Mohamad, Yudum Kavukçuer ve Gözde Sancı weke asîstan di projeyê de cih girtine.

Lêkolînê 8 mehan berdewam kiriye û ev lêkolîn bi taybetî li kesên ku weke elît tên binavkirin, hatiye çê kirin. Herwiha zanyariyên dawî yên di derbarê xwendekarên lîse, dibistana seretayî û navîn de jî hene. Bi vê lêkolînê, hejmara zêdebûn û mayîna penaberên Sûriyeyî yên li Tirkiyê, bihêzbûna perwedehî û polîtîkayên entegrasyonê nîşan dide. Lê herî zêde penaberên ku bi wesf, di vekolînê de cih jê re hatiye dayîn. Di vê çerçoveyê de li ser 600 Akademîsyênên xwediyê asta doktorayê ku li welatê xwe zanîngehek qedandine û weke mamoste li zaningehê kar kirine, xwendekarên Sûriyeyî yên li zaningehê dixwînin sekinîne. Piştî Adara 2017an hejmara xwendekarên Sûriyeyî yên li zaningehê gêhiştiye 14 hezar 747an.

Herwiha projeya Elît Dialogue, bi anket û lêkolînan projeya herî berfireh a li Tirkiyê ye.

**“Mafê rûniştinê, tesîrê li qadên xebatê dike”**

Cîgira Serokatiya Navenda Lêkolîn û Pratîka Siyaseta Cîvakî ya Zanîngeha ETÜ-TOBBê Doç. Dr. Alk. Başak Yavçan, di derbarê lêkolîn û projeyên zanyarî de agahî dan Heftenameya Basê.

> “Akademîsyênên Sûriyeyê îro herî zêde li Zaningeha Artukluyê hatine bi cih kirin. Li Dîlok û gelek zaningehên din beşên Erebî vebûn. Hin beş bi zimanê Erebî vebûn. Em di demên dawiyê de dibînin ku gelek akademîsyenên Sûriyeyê li zanîngehan hatine bi cih kirin.”

Başak Yavçan diyar dike ku bi vê projeyê armanca wan ew bû ku nişan bidin ku penabarên Sûriyeyî ne di asteke biçûk de ne. Yavçan axaftina xwe wida didomîne: “Lê dema ku em di qadê de dixebitin, em bi Sûriyeyên cur be cur re rûbirû tên. Kesên ku xwediyê perwerdehiya baş û bilind in hene. Em jî fikirîn ku divê haya raya giştî ji van hebe. Herwiha me ev jî fikirî; ev kes bi gelek kêşeyên re rûbirû tên. Weke destûrwernegirtina karkirinê, gelek problemên wan hene. Ji ber vê me jî girîngî da wan mirovên xwende û xwedî îhtîsasekê. Ji aliyê din ve ev mirovên têgihiştî, pêwendiyên her du çandan çê dikin. Erkeke wan a wisa heye. Dema ku em li xebatên derveyê welat dinêrin, alîkariya entegrasyonê dibin. Ev problem tesîrê li ser çêkirina pêwendiyan dikin.

**“Herî zêde li Zaningeha Artukluyê hatin bi cih kirin”**

Yavçan balê dikişîne ser kêşeyên wan ên hevpar û eşkere dike ku divê akademîsyen her sal destûra mafên rûniştinê û xebatên nû bistînin. Ji ber kêşeya wan a nediyarîbûna destûrê, ji wan gelek kes nikarin kariyerê bikin û bigihêjin asteke bilind. Yavçan di dewama axaftina xwe de diyar dike, dema ku wan ev lêkolîn pêk anî dîtine ku gelek akademîsyenên ji Sûriyêyê kar peyda nekirine û wiha pê de çû: “Ji ber ku zanîngehên Tirkiyê kadro gelek kêm in. Ev rewşeke xwezayî bû. Hevrîkî zêde ye. Bandoreke wisa jî heye. Lêbelê di demên dawiyê de rewş guherî û gelek akademîsyen li zanîngehan hatin bicihkirin. Akademîsyenên Sûriyeyê îro herî zêde li Zaningeha Artukluyê hatine bi cih kirin. Li Dîlok û gelek zaningehên din beşên Erebî vebûn. Hin beş bi zimanê Erebî vebûn. Em di demên dawiyê de dibînin ku gelek akademîsyenên Sûriyeyê li zanîngehan hatine bi cih kirin. Ji aliyên din ve gelekî wan ji ber ku kar peyda nekirine, ji Tirkiyê koçî welatên din kirine. Herwiha akademîsyenên Sûriyeyî herî zêde di beşên Erebî û îlahiyetê de hatine bi cih kirin. Lê weke beşên endezyarî, bijîşkî jî hene. Dema em li entegrasyona derveyî welêt dinêrin herî zêde li ser çîna navîn tê kirin. Peydabûna çîneke navîn a Sûriyeyiyan pir girîng e. Ji ber ew him ji komên xwe re dibin mînak, him jî di nêrîna gelê herêmê de xweşhaliyekê didin.”

### “Ji sedî 49ê xwendekaran perwerdehiyê nabînin”

Cîgira Serokatiya Navenda Lêkolîn û Pratîka Siyaseta Cîvakî ya Zanîngeha ETÜ-TOBBê Doç. Dr. Alk. Başak Yavçan di derbarê xwedekarên lîse, dibistanên seretayî û navîn de zanyarî parve kirin û axaftina xwe wisa domand: “Ji sedî 49ê xwendekaran perwerdehiyê nagirin. Ev jî rê li ber îzolasyona zarokan vedike. Her wiha ji ber vê zarok weke karker tên şixulandin. Ji ber ku perwerdehî wernegirtine, dibe ku di siberojê de bibin komên marjînal. Ev hemû rîsk in. Lêbelê roj bi roj rêjaya perwerdehiyê zêde dibe. Nêzîkî 450 hezar zarok diçin dibistanê. Li gorî salên çûyî ev hejmareke mezin e. Lê ev jî heye ku hewce ye ev hejmar bê parastin. Ji ber ku hejmara zarokên dibistanê her sal zêde dibe. Rêjeya zarokan jî her ku diçe zêde dibe.”

**“Hejmara xwendekarên Sûriyeyî zêde dibe”**

Yavçan rewşa xwendekarên Sûriyeyî yên li Zanîngehê jî nirxand û wiha axivî: “Hejmara xwendekarên Sûriyeyî yên li zaningehê di demên dawiyê de ber bi zêdebûnê ve diçe. Lê li Tirkiyeyê problema herî mezin kêşeya hemahengiya dîplomayê ye. Ji ber ku di navbera Tirkiyê û Sûriye de pêwendiyên dîplomatîk tune, kesên ku li Sûriye xwendine û xwediyê dîplomayê ne nikarin nîşan bidin ku dîploma wan orjînal e û Tirkiyê jî nikare rastbûna wan tespît bike. Ev hemû, ji bo tespîtkirina hemahengiya dîplomayan kêşeyan çê dikin. Di nav her du welatan de pêwendiyên ragihandinê tune. Bo mînak; di navbera her du welatan de têkiliyên dîplomatîk tune. Di navbera her du welatan de konsolê Perwerdehiyê tune ye ku bawernameyan kontrol bike gelo rast e an ne rast e. Li welatên Erebî ku têkiliyên wan ên dîplomatîk li gel Sûriyeyê hene ev pirsgirêk gelekî kêm in. Ji bo xwendekaran di van demên dawî de ev kêşe kêm bûne. Alternatîfeke wiha ji wan re pêşkeş kirin: ‘Her sal bo qedandina lîseyê ezmûn hatin kirin. Ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Netewî ve li bajarên ku Sûriyeyî lê dijîn ev ezmûn pêk hatin. Ew kesên ku lîse diqedînin dikarin biçin zanîngehê.’ Ew îdîayên ku dibêjin Sûriyeyî gelekî zêde pereyan distînin û bêyî ezmûn dikevin zanîngehan ne rast in.”

**“Kêşeyên aborî ji bo çûyina zanîngehê problemên mezin derdixe”**

Yavçan eşkere dike ku divê xwendekarên penaber berî çûyina zanîngehê, fêrî Tirkî bibin. Bi biryara lijneya wezaretê xwendekar xerca perwerdeyê nadin û dikarin ji sedî 25 burs jî wergirin. Bi gelek xwendekaran re fikara peydanekirina kar heye û ev rêje di mêran de zêdetir e.

Başak Yavçan, di derbarê penabarên ku koçî Ewropayê kirine de jî dibêje: “Gelek Sûriyeyiyên ku xwastin perwerde bigirin, derbasî Ewropayê bûn. Dibe ku ev weke ku li Tirkiyê perwerde tune ye bê dîtin. Lê wisa nîn e. Ji bo ev xwendekar li Tirkiyê bixwînin û bibin xwediyê statûya xwedenkariyê, di mewzûata Tirkiyê de gelek tişt hatin guhertin. Her wiha Wezareta Perwerdehiyê ji bo dibistanê gelek xebatên girîng pêk anîn, dibistanên nû çê kirin. Lewre di warê xwendinê de pêşketin û fersendên baş çê bûn. Berê rêjaya xwendekarên dibistana seretayî û navîn ji sedî 25 bû û lê niha ji sedî 50 ye. Berê hejmara xwendekarên zanîngehê 3-5 hezar bûn. Lê niha gihêştiye 15 hezaran. Hîn jî rîsk û kêşe hene. Nîvê xwendekarên ku beşdarî anket û vêkolînan bûbûn, li Sûriyê zanîngehek xilas kiribûn. Nîvê din jî li vê derê perwedehiya xwe didomînin.”

## Îzlanda

# Mînaka bêîtaatiya sîvil û serxwebûnê

■ DÎLSAH AMEDÎ

Îzlanda, tevî avûhewaya xwe ya dijwar, Îzlanda, tevî avûhewaya xwe ya dijwar, welatekî biçûk, bireng û cizîreke volkanîk e. Mezinahiya Îzlandayê weke bajarokekî masiyan e. Ev welat bi sedsalan hatiye dagir kirin. Lê xelkê wê li dijî vê dagirkeriyê rawestiyaye û serxwebûna xwe bi dest xistiye.

**Prosesa dîrokî û siyasî ya Îzlandayê**

Ji ber ku Îzlanda piştî teqînên volkanîk pêk hatiye, cizîreke ciwan e. Li gor xebat û kifşên arkeolojiyê, cizîr cara yekem di qirnên 9 û 10an de ji aliyê Vîkîngan ve ku ji Norwayê hatine, hatiye kişf kirin û Vîkîng li vê derê bicih bûne. Serokên komên ku hatine wê derê û bi cih bûne, di sala 930î de tên cem hev û bi navê Althingê parlamentoyekê saz dikin. Althing, yekemîn mînaka parlamantoyê tê qebûl kirin. Ew hemû kom her sal di demsala havînê de li Althingê kom dibûn û qanûn nîqaş dikirin. Lê ew qanûn nehatine nivîsandin. Di şûna nivîsê de berdevkê qanûnan dihat hilbijartin. Tiştê herî girîng ev e ku di van civînan de tenê hêzek tune bû. Lewre xelkê biryara yaseyan dida.

Her wiha ji ber bandora Vîkîngan, xelkê cizîrê pagan bûn. Lêbelê xelkê di salên 1000î de baweriya mesîhiyê qebûl kirine. Di sedsalên 11 û 12an de rewş diguhere. Ji ber ku Athing êdî ketiye nav destên malbatên kêmînê û yasayên yekîtiya hêzan winda bûne. Pê re gengeşiyên navxweyî derdikevin û pişt re jî serxwebûna cizîrê jî bi dawî dibe.

Piştî ku cizîr ji ber aloziyên navxweyî serxwebûna xwe winda dike, di sala 1262an de dikeve bin hikûmraniya Norwayê. Pişt re Norway bi Denimarkayê ve tê girêdan û wê çaxê Îzlanda vê carê dikeve bin serweriya Denimarkayê. Denimarkayê di destpêkê de cizîr ji bo berjewendiyên xwe yên bazirganiyê bi kar anîye. Lê pişt re kontrola tevahiya Îzlandayê digire. Îzlanda di sala 1551an de bi referandûmê mezheba protestaniyê qebûl dike û di sala 1662an de jî sond dixwe ku giredayê Qraltiya Danimarkayê ye.

Li Îzlandayê di sala 1783an de volkana Lakî teqiyaye û ji cizîrê 3 mîl kup lav belav bûye. Di encama vê de gelek laser û xwelî çêbûne, 9 kes mirine û ji sedî 80ê xwarinên depoyên cizîrê têk çûne. Ji ber vê sedemê birçîbûn çêbûye û nîvê nifûsa cizîrê têk çûye. Di vê qirnê de rewşa cizîrê roj bi roj xerabtir bûye û xelkê wê di serî de Manîtaba û Kanada koçî welatên cur bi cur kirine. Lê di encama vê de di sedsala 18an de li Ewropayê bi bandora netewperwerî û romantîzmê têgiştineke neteweperweriya nû derketiye. Di serokatiya Jon Sigurdsson de şerê azadiyê derketiye. Li Reykjavikê di sala 1838an de parlamentoyeke ji 10 kesan pêk dihat, hatiye damezirandin û ev weke berdewamiya Althingê hatiye hesibandin. Denimarkayê piştî hezar salî di sala 1874an de destûr daye Îzlandayê ku di karê hundirê welat de serbixwe bibe. Ev maf di sala 1904an de hatiye berfireh kirin. Herwiha destûra bingehîn a ku di sala 1874an de hatiye nivisîn di sala 1903an de hatiye berfirehkirin û êdî Altingê berpirsyarê karê navxweyî yê Îzlandayê bûye. Bi Yasaya Yekîtiya ku di 1 Kanûna 1918an de hatiye îmzekirin, Îzlanda di bin Qraltiya Danimarkayê de welatekî xweser bû.

**Û serxwebûn...**

Îzlanda, piştî encama îdeolojiya neteweperweriyê di sala 1918an de dîsa bi Danimarkayê ve hat girêdan. Tevî van rûdanan, Îzlandayê di heman salê de ala xwe çêkir û ji Danîmarkayê daxwaz kir ku di warê karên derve û parastinê de nûnertiya Îzlandayê bike. Yasaya Yekîtiyê heta sala 1940î hatiye bi cî kirin û eger her du alî li hev nekin, ev yasa dê di 3 salan de bihata betal kirin.

Lê piştî ku Almanyayê di 9ê Nîsana 1940î de Danimarkê dagir kiriye, pêwendiyên Îzlanda û Danimarkayê jî ber bi xerabûnê ve çûne. Di encama van hemû bûyeran de Îzlandayê di 10ê Nîsanê de Altingê weke parlamentoya xwe fermî ragihand û Sveinn Björnsson weke serokwezîr hilbijart û biryar da ku êdî di karê derve de serbixwe ye.

Îzlanda di destpêka Şerê Duyem ê Cîhanê de hem li dijî Brîtanya û hem li dijî Almanyayê derketibû û bi vî awayî polîtîkayên bêalî meşandibûn. Lê dema ku şer derket, Îzlanda ji aliyê stratejîk ve xwediyê nirxeke giran bû. Brîtanya jî bi hinceta parastinê, 10ê Gûlana 1940î ev dagir kir. Pişt re Brîtanyayê Îzlanda radestî DYAyê kir. DYAyê bi peymana Parastina Îzlandayê re di Tîrmiha 1941an de parastina vê derê bi dest xistiye.

Althingê di sala 1941an de biryar da ku pêwendiyên xwe yên bi Denimarkê re bi dawî bîne. Îzlandayê di 31ê Kanûna 1943an de biryar daye ku ji bo Yasaya Yekîtiya Denimarkayê, piştî 25 salan, bi dawî bîne, monarşiyê rake û komariya xwe damezirine. Ji bo vê armancê li Îzlandayê di 20ê Gûlana 1944an de dengdayîna serxwebûnê dest pê kiriye û 4 rojan berdawam kiriye. Xelkê Îzlandayê ji bo serxwebûnê gotiye ‘êre’ û Îzlanda jî bi awayekî fermî di 17ê Hezîrana 1944an de serxwebûna xwe ragihandiye.

DYA yekemîn welat e ku di 17 Hezîrana 1944an de serxwebûna Îzlandayê nas kiriye.



### Taybetmendiyên Îzlandayê

Navê fermî yê Îzlandayê, Komara Îzlanda ye. Reykjavik, paytexta vî welatê biçûk e. Nifûsa Îzlandayê nêzîkî 317 hezaran e.

Îzlanda, li bakurê Okyanûsa Atlasê li ser cizîra volkanîk cih digire. Li başûrê rojhilatê wê Îskandinavya û li bakûrê rojavayê wê Cizîra Brîtanya cih digirin. Îzlanda, welatekî Ewropa ye.

Li Îzlandayê gelek cizîrên volkanîk hene û ev hemû hê jî aktîv in. Hejmara wan jî 200 e. Ji van cizîrên volkanîk ê herî girîng Hêkla ye û bilindiya wê 1490 metre ye. Hin cihên cizîra Îzlandayê di encama lavên volkanîk de pêk hatine.

Piştî çiya û cizîrên volkanîk, taybetmendiya din a herî girîng gayzer in ku ji ava germ a enerjiya elektrîkê tê bidestxistin û ji bo germahiyê tê bikaranîn. Îzlanda îro xwediyê 30 volkanên aktîv û jêderkên termalê ye.

Cîrana wê ya herî nêzîk Gronland e û ev jî ji wê 350 km dûr e. Ciranên wê yên din Norway 1050 km, Skotland 800 km ne.

Zimanên fermî Îzlandî û Îngîlîzî ne. Îzlanda ji sedî 93 ji Îzlandiyan û ji sedî 7 ji xelkên din pêk tê û ji wan jî ji sedî 76 protestan in û ji sedî 3 katolîk in.

Li Îzlandayê parlamentoya herî kevn a cîhanê Althing hatiye sazkirin.

Îzlanda di sala 1949an de bûye endamê NATOyê. Ji aliyê din ve Îzlanda yekem welat e ku artêşa wê tune ye û endamê NATO ye.

Her wiha Serokê DYA Ronald Reagan û Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Sowyetê Mihail Gorbaçov di 11-12ê Cotmeha 1986an de li Reykjavikê civîna lûtkeya dawîlêanîna çekên nûkleerî li dar xistiye û ev lûtke weke destpêka hevdîtinên çekên nûkleerî tê qebûlkirin.

# Kurdên dîasporayê dê çawa deng bidin?

■ SARA PIRANIJ

Dema ku roja referanduma serxwebûna Herêma Kurdistan wek 25 Îlonê hat diyarkirin, wê çaxê proseya dengdayîna Kurdên dîasporayê ketibû rojevê. Komîsyona Bilind a Hilbijartin û Referandumê ya Herêma Kurdistanê di nava vî hefteyê de da zanîn ku hemwelatiyên Herêma Kurdistanê yên ku li derveyê welat dijîn, dikarin bi rêya elektronîk dengên xwe bidin.

Endamê Komîsyona Bilind a Hilbijartin û Referandûmê Karwan Celal, di daxuyaniyekê de diyar kiribû ku ew ê ji bo dengdayînê sîstemeke elektronîk saz bikin û hemwelatî jî dê li ser vê sîstemî dengên xwe bidin. Celal wiha gotibû: “Dengdayîn dê di meha Îlonê de dest pê bike. Hemwelatiyên ku dixwazin deng bidin, dê li ser malpera Komîsyona Bilind a Hilbijartin û Referandumê kontrol bikin ku navê wan di lîsteyê de heye yan tune ye. Heger navê wan hebe, dê dengê xwe bidin. Kesên ku navê xwe di lîsteyê de peyda nekin, dê ji me re maîl bişînin. Em jî dê ji wan re şîfre bişînin û bi vê şîfreyê dê dengê xwe bidin.” Herwiha Celal zanyiriyekê din jî parve kir û eşkere kir ku şîfre dê tenê di roja dengdayînê de aktîv bibe û li ser sîstemê tenê carekî dê deng bê dayîn

**“Dengdayîna elektronîk dê di 23ê Îlonê de aktîv bibe”**

Endamê Komîsyona Bilind a Hilbijartin û Referandumê ya Herêma Kurdistanê Dr. Jutkar Adil, di derbarê dengdayîna elektronîk de zanyarî bi heftenameya Basê re parve kirin. Adil da zanîn ku xebata dengdayîna elektronîk dê di 23ê Îlonê de aktîv bibe û diyar kir ku hemwelatî, bi rêya sîstemeke elektronîk beşdarî bibin. Adil axaftina xwe wiha domand: “Sîstem ji aliyê komîsyonê ve jî hatiye qebûl kirin û 2 kompaniyên nivîsbariyê li ser vê bernameyê dixebitin. Ev nivîsbar dê di nava 30 rojan de amade bibe. Pisporan hê jî bername xilas nekirine û xebata xwe berdewam dikin.

> “Dengdayîn dê di meha Îlonê de dest pê bike. Hemwelatiyên ku dixwazin deng bidin, dê li ser malpera Komîsyona Bilind a Hilbijartin û Referandumê kontrol bikin ku navê wan di lîsteyê de heye yan tune ye. Heger navê wan hebe, dê dengê xwe bidin.”



Piştî ku bername xilas bû, dê li ser malpara komîsyonê bê aktîvkirin. Kesên ku deng didin, dê têkevin malpara komîsyonê bi pasaport, navê bikarhêner û şîfreya xwe daxîlê sîstemê bibin û dengê xwe bidin. Sîstema dengdayîna elektronîk dê di 23ê Îlonê de aktîv bibe û hemwelatiyên derveyî welat wê dengê xwe bidin. Prosesa dengdayînê tenê rojek ango 24 saet in.”

Adil di axaftina xwe de bal kişand ser welatan û aşkere kir ku welatiyên derveyê Kurdistanê, li DYA, li Brîtanya, li Fransa yan jî li welatekî din ên cihanê bijîn jî dikarin dengê xwe bidin. Qet ferq nake ku welatiyên me li kîjan welatê bijîn, hemû dikarin beşdarî sîstemê bibin û dengê xwe bidin. Herwiha Adil di derbarê vê mijarê de ev zanyarî jî dan: “Ji bo sîstemê qanûn hatiye çêkirin û plansaziya budçeya vê hatiye çêkirin.”

### “Em ê bi xelkê Kurdistanê re di vê xebatê de serbikevin”

Adil, diyar kir ku ji ber ewlehiya referandumê navê her du kompanyayên nivîsbaran tên vêşartin û nikarin navên wan aşkere bikin. Dr. Jutkar Adil di derbarê sîstema dengdayîna elektronîk de axaftina xwe wiha domand: “Çend kes dê beşdarî bibe û deng bide nediyar e. Lê ev qonaxeke dirêj e. Piştî ku hemwelatiyên me yên derveyê welat, dengê xwe dan, deng dê bên hejmartin û bên tespîtkirin. Xebata jimartinê dê wext bigire. Herwiha kesên ku mafê wan ê dengdayînê tune ye û beşdarbûne jî dê bên tespîtkirin. Kompanyayên ku vê sîstemî çê dikin, di qada xwe de şarezane û dê destûr nedin ku ti mexdûriyetek çê bibe. Heger kêşeyek pêk bê, dê demildest bê çareserkirin. Pişt re jî xebat dê berdewam bike. Em ê bi xelkê Kurdistanê re di vê xebatê de serbikevin.”

# “Ji bo xwedîkirina mirîşkan sermayeke baş divê”

■ BERFO GILÎDAX

Li bajêrên Kurdan gelek cûre çandinî û bazirganî tên kirin. Em her hefte çend ji van karan tînin ber xwînerên xwe. Yek ji van cûreyan jî xwedîkirin û firotina mirîşk û hêkên mirîşkan e. Xwedîkirina mirîşkan her çiqas li malê hêsan be jî xwedîkirina li çêwlîgan gelekî zehmet û bi kêşe ye. Ev kar, him wek karê taybet tê hesibandin him jî divê ev kar bi pisporî bê kirin. Xwediyê çêwlîgên mirîşkan balê dikişînin û diyar dikin ku xwedîkirin û mezinkirina mirîşkan naşibe ajalên din ji loma divê mirov baş bizane bê ka mirîşk çawa tên xwedîkirin. Abdulkerim Yıldızê li gundê Dirbêsa ku girêdayî navenda Batmanê ye, bi zarûzêçên xwe ve li çêwlîgê bo hêkan mirîşkan xwedî dike û dibêje mirîşk ajalên pir narîn in. Ji lewma jî divê baş bên xwedîkirin. Abdulkerim Yıldız û Sedat Kerimoğlu di derbarê xwedîkirin, dermankirin û firotina mirîşkên çêwlîgan de ji Heftenameya Basê re axivîn.

**Rojekê ji Hezar û 200 mirîşk, 700-800 hêk çêdibe**

Abdulkerim Yıldız destnîşan dike ku li gundê Batmanê ev ji salekê zêdetir e li çêwlîgê mirîşkan xwedî dike û cara yekem e ku vî karî tecrûbe dike. Yıldız diyar dike ku çêwlîga wî ji konan pêk tê û dirêjahiya konan 20 mitro û firehiya wan jî 7 mitro ye. Ji bo mirîşk baş hêkan bikin û bi nexweşiyê nekevin divê kon, zivistanan germ û havînan jî hênik be. Abdulkerîm Yıldız axaftina xwe wiha didomîne: “Li çêwligê tenê mirîşk hene, bo hêkan tên xwedîkirin. Ne mirişkên malan ne yên ziraatê ne lê belê ev mirîşk yên bexçe ne, yanê digerin. Di destpêkê de li çêwligê hezar û 200 mirîşk hebûn. Ev hezar û 200 mirîşk ji me re rojane 700- 800 hêk dikirin. Lê belê niha ji ber hin sedeman him hejmarên mirîşkan û him jî hêkên wan hindik bûne. Ev rewş jî ji ber ku an hewa germ e an jî ji ber nexweşiyê û sedemên din çêdibe. Niha dora 800 mirîşk hene û ji vî 800î jî di rojêkê de bi qasî 200-250 hêk tên berhevkirin. Li aliyê din mirîşkek li rojê dora 100-120 gr êm dixwe. Ev dike ku hezar mirîşk di rojêkê de 120 kîlo êm bixwe. Ev yek jî barekî giran e li ser xwediyên çêwlîgan. Germî û neyîna tecrûbeya me di vî karî de wisa kir ku ji sedan zaftir mirîşkên me mirar bibin.”

**Heba hêkan 50 qirûş, kolî 15 Lîre**

Yıldız amaje pê dike ku hêkên çêwlîga wî dernakevin derveyî bajêr û tenê li Batmanê difiroşê. Diçe marketan, lojmanan û ku her kî bixwaze hêkan difiroşe wan. Heba hêkan 50 qirûş e û koliya hêkan jî bi 15 lîreyan e. Di koliyekî de 30 heb hêk heye. Yıldız axaftina xwe wiha didomîne, “Yê ku ji vî karî fêm bike dikare bi rehetî debara xwe pê bike lê belê ev kar zanînekê dixwaze. Her wisa mirov divê her wext di nav mirîşkan de be û xwedîkirina wan baş bike û eleqeyê nîşanî mirîşkan bide ji ber ku mirîşk ajalên narîn in û naşibin ajalên din.” Abdulkerim Yıldız diyar dike ku bo vî karî divê sermayeke baş hebe û ne karekî hêsan e ku li gorî xwe zehmetiyên wî jî hene û wiha pê de diçe: “Em her roj hêkên xwe hildigirin û dibin marketan, bazaran, yek bi yek an jî di ser hev de difiroş in. Ji bo profesyoneliya vî karî û bazirganiya li gor normên cîhanê divê pêşî tu mişteriyan ji xwe re amade bikî. Heke ne wisa be dema mirîşkên te hêk kirin û te hêk birin bazarê, tu destevala vegerî malê tu nikarî di dahatûyê de êmê mirîşkan bikirî û wan têr êm û av bikî. Ji ber ku mirîşk ajalên narîn in, hûn tenê danekî jî êm nedin wan, nexweş dikevin, bêxêr dimînin û hêkan nakin. Ev yek jî dibe sedema berdewamnekirina bazirganiyê.”

> Li çêwlîgan xwedîkirina mirîşkan, wek karekî taybet û zehmet tê bi navkirin. Abdulkerim Yıldızê ku xwediyê çêwlîga mirîşkan e dibêje, “Mirîşk heywanên narîn in ji loma eleqa û lênerîneke baş ji bo mirîşkan lazım e.”

**“Mirîşk ajalên narîn in”**

Sedat Kerimoğlu ku ew bi xwe jî di çêwligên mirîşkan de dixebite dibêje mirîşk heywanên narîn in. Kerimoğlu balê dikişîne ser dayîna êmê mirîşkan û dibêje di rojekê de, dan bi dan êm didin mirîşkan û wiha pê de diçe “Êmên ku em didin mirîşkan, emên bi qelîte û biha ne. Hezar mirîşkên me hene em di mehê de 3 ton êm didin mirîşkan. Bihayê torbeyê êmê bi qelîte 95 lîre ye lê ji ber ku em di carekî de zêde dikirin 3 ton êm ji me re, bi 5 hezar lîreyan tê.”

## Mirîşk ji muzikê zehf hez dikin

Kerimoğlu destnîşan dike ku xwedîkirina mirîşkan eleqeyeke baş dixwaze, heta heke di zivistanê de piyên mirîşkan şil bin hêkê nakin û wisa pê de diçe, “Mirîşk ji muzikê, melodiyê zehf hez dikin, me tecrûbe kiriye. Dema ku em muzikê vedikin mirîşk zêdetir hêkan dikin lê belê eger ku em muzikê venekin wê demê mirîşk kêm hêk dikin. Her wisa dema ku em binê mirîşkan di mehekê de paqij nekin mirîşk hêkan kêm dikin, lê dema ku her hefte binê wan paqij bikî mirîşk zêde hêkan dikin. Ez dixwazim vêya bibêjim mirîşk zehf jî hewyanekî hişyar e. Gava ku rovî werin nêzikî van, hema dest bi girtegirtê dikin û wisa rovî nikarin nêzikî wan bibin û haya me jî wisa pê çê dibe.”

Sedat Kerimoğlu diyar dike ku dema kiryar hêkan dikirin divê gelek hişyar bin, di pîyasayê de bo hêkan kontrol tune ye û wisa pê de diçe, “Ez dixwazim tiştekî bibêjim lê vêya kes zêde nizane. Niha emrê hêkekê bo xwarinê 28 roj in. Ger 28 roj derbas bibe divê ev hêk neyê xwarin. Hêka ku wextê wê derbas bûyî dibe sedema nexweşî heta dibe sedema mirinê jî. Niha li ser hêkan roj tê nivîsin lê ev roj ne rast in, hema wisa têne nivîsin. Em di vê mijarê de gelekî hesas in. Hêkên me di destê me de zêde namînin û em zû difiroşin.”



Dicle Boru:

# Li Mêrdînê kargeheke pilebilind!

■ GÖNÜL GÜN



Deşta Mêrdînê ango Deşta Mezopotamya ji bo kar û berhemdanînê xwedî derfetên gelek dewlemend e. Li Mêrdînê gelek cûre kargeh xebata berhemdanînê dikin. Yek ji wan kargehan jî kargeha Dicle Boru ye ku berhemên xwe ji Mêrdînê heta Stenbolê, ji Enqere heta Hewlêrê difiroşe. Serokê kargeha Dicle Boruyê Şaban Altın di derbarê kar û xebatên wan û pêwendiyên wan ên li gel Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivî.

**“Me di nava salekê de karê xwe gihand asta cîhanê”**

Şaban Altın çîroka destbikarkirina kargeha xwe dike û wiha dibêje: “Di2009an de hat ava kirin. Me di sala 2013an de dewr wergirt. Ji wê demê ve jî em bi kar tînin. Dema me wergirt û vir ve me tenê ji bo avdaniya axê borî çêdikirin. Me kar mezin kir û kapasîteya xwe jî bilind kir. Xebatkarên me jî gelek zêde bûn piştî me stend. Me di nav kargeha xwe de beşa ARGE (Vekolîn û Pêşxistin) damezirand û em niha bi hemû şêweyên boriyan hildiberînin. Em boriyên 219 mm, heta 3660 mm firehiya wan jî 3mm heta 30mm li Tirkiyeyê li gor TSEyê em boriyên herî fireh çêdikin. Qistasa hilberandina Enstîtûya Standartên Tirkiyeyê (TSE) heye. Li gor wan qistasan (qalinbûn, firehbûn) em xwedî belgeya hilberandinê ne. Em boriyên xwe difiroşin hemû deverên Tirkiyeyê. Bi giştî em boriyan ji bo kar û berên bingeha şaristaniyê çêdikin. Her wiha boriyên avê, yên bendavan, yên çelîkan û boriyên ji bo di lîmanan de bên bikaranîn çêdikin. Beriya 2014an bi Herêma Kurdistanê re jî bazirganiya me hebû. Gelekî baş bû lê niha mixabin bazirganiya me li gel Herêma Kurdistanê qut bûye.”

**“Handîkapa herî mezin tunebûna pergala bankayan e”**

Şaban Altın li ser têkilî û danûstandinên wan ên bi Herêma Kurdistanê re jî dibêje: “Tunebûna pergala bankayan karkirina me bi Herêma Kurdistanê re kêm dike û wisa didomîne. Handîkapa herî mezin ew e ku tunebûna pergala bankayan e. Bazirganiyeke ewlehî tune ye. Li karên li wir li gor welatên din temînata pergalê tune ye. Bazirganiya di navbera Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê de pir caran li deriyê sînorî jî disekine. Eger ev pirsgirêka pergala bankatiyê, ewlehiya deriyê sînorî û têkiliyên siyasî baş bibin wê geştir bibe. Dema hûn li Herêma Kurdistanê kar dikin ji neçarî hûn heqdestê xwe an jî mafê bazirganiya xwe bi ser dovîzfiroşan dikin. Dema hûn wî pereyî tînin Tirkiyeyê divê hûn li gor yasayên Tirkiyeyê tomar bikin. Li gor qanûna bazirganiyê ya Tirkiyeyê divê firoşkar dema bi ser 8 hezar lîrayî bazirganiyê kir divê wê firotinê di ser bankayan re bike. Nebûna pergala bankatîtiyê li hember karkirina me bi Herêma Kurdistanê re dixe astengiyê. Bankayên Tirkiyeyê ku li Herêma Kurdistanê kar dikin jî ji hemû karsaz û kargehan re nabin kefîl. Ev yek jî karkirinê gelekî zehmet dike. Teqez divê pergala fînansê li Herêma Kurdistanê bê avakirin.

**“Li Tirkiyeyê karê avakirina avahiya bingehîn bi deste dewletê tê kirin”**

Şaban Altın di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, bi giştî li Tirkiyeyê avakirin û başkirina avahiya bingehîn bi destê dewletê tê kirin û wiha pê de diçe: “Ev yek jî li ser bazirgan û mûtehîtan tê kirin. Em ji van projeyan re jî boriyan amade dikin. Boriyên me di projeyên avahiya bingehîn, çêkirina bendavan û hwd. de tên bi kar anîn. Niha boriyên me di projeyên Deryaya Spî, Îzmîr, Stenbol û Herêma me de tên bi kar anîn. Ev yek jî ji bo îstîhdama li welatê me gaveke erênî ye.”




> “Tunebûna pergala bankayan karkirina me bi Herêma Kurdistanê re kêm dike û wisa didomîne. Handîkapa herî mezin, tûnebûna pergala bankayan e. Bazirganiyeke ewlehî tune ye. Li wir li gor welatên din temînata pergalê tune ye.”

> “Bazirganiya di navbera Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê de pir caran li deriyê sînorî jî disekine. Eger ev pirsgirêka pergala bankatiyê, ewlehiya deriyê sînorî û têkiliyên siyasî baş bibin wê geştir bibe.”

### “Têkçûna proseya çareseriyê karê me anî ber sekinînê”

Şaban Altın ku ji 2005an û vir ve di vê sektorê de kar û xebatên xwe didomîne, derbarê bandora şer, pevçûn û qedexeyên li bajarên Kurdan li ser karê wî û bazirganiya herêmê bi giştî, dibêje, “Sektora me jî sektoreke dînamîk e. Cara yekem em neçar man ku karê xwe bisekinînin. 3 mehan kargeha me rawestiya û kar nekir. Hemû mişterî, peydakarên me karê xwe sekinandin. Rewşa me niha baş e. Em dîsa bi serketin lê mixabin hin karsaz di wê demê de hê jî bi ser xwe ve nehatine û têk çûn. Rewşa wê demê gelek xerab bû. Em weke Dicle Boruyê niha li ser lingan ne û hêvîdar in ew karsazên ku di wê demê de gelekî zirar dîtine jî werin ser hemdê xwe û cardin bazirganiya xwe bikin.”

# Petêxên Midyadê û yên Cafenê di qayişkêşanê de ne




■ DILDAR DÎROKÎ

Petêxên Mîdyadê bi tama xwe ya şêrîn û tirş navdar in. Ji nîv kîlo heta10 kîloyan giraniya petêxan heye. Gelek cotkarên Kurd di demsala havînê de piştî dirîtina çandiniyên xwe petêxan datînin. Beriya meha Hezîranê cotkar petêxan diçînin û di dawiya meha Tirmehê de berhev dikin. Yek ji kevintirîn fêkiyê Kurdistanê petêx e. Em wek Heftenameya Basê ji bo vê cûre fêkiyê, li gel cotkarê Kurd Selamî Ever li ser petêxên Mîdyadê û bazara wê axivîn.

**“Em bi malbatî di vî karî de ne”**

Selamî Ever destnîşan dike ku ew petêxan di dawiya meha Gulanê de diçînin û dibêje, “Petêx di meha Tirmehê de derdikevin. Em bi malbatî di serê şefeqê de, hê saet li sê an jî sê û nîvan diçin nav parêz û petêxên xwe berhev dikin. Bi tirimbêlan tînin navenda Mîdyadê û difiroşin market û dikandaran. Yên dimînin jî em dişînin Edene û Stenbolê. Gelek daxwaz ji bo petêxên me hene. Eger em xwe girêdayî bazirganan bikin petêxên me hinek bi erzanî diçin. Lê ji bo ev yek nebe jî em bi xwe petêxên xwe difiroşin. Di destpêka derketina petêxan de kîloya wan bi du lîrayan diçe. Niha heta pêncî qirûşî jî daketiye.”

**“Yên me ji yên Cefanê xweştir in!”**

Cotkar Selamî Ever di dewama axaftina xwe de petêxên Midyadê û Cefanê dide ber hev û wiha pê de diçe: “Petêxên me ji yên Cefanê çêtir in û bi tama xwe jî xweştir in. Petexên Cefanê biçûk û bêtam in. Lê yên Mîdyadê him mezin in him jî cûre bi cûre bitam in. Mişteriyên me yên taybet hene. Ji Batmanê, Diyarbekirê û bajarên der û dora me ji me dixwazin da ku em petêxan ji wan re bişînin. Rojane bi qasî 40 tirimbêl petêx dikeve Mîdyadê û ji wir jî ber bi bajarên din ve diçe. Serê van tirimbêlan jî ji 750 kîlo heta 2 ton petêx hene. Ev yek jî daxwaza ji petêxên me re nîşan dide.”

**“Hûn ji tama petêxê Cefanê têr nabin”**

Mihemed Eliyê Cefanî jî li ser vê mijarê wiha diaxive; “Dema hûn petêxê Cefanê dixwin hûn ji tama wê têr nabin. Ez ne ku îdîa dikim ez rasterast ji we re dibêjim di cîhanê de petêx li ser petêxên Cefanê re tune ye.” Mihemed Elî axaftina xwe li ser taybetmendiya petêxê Cefanê wiha didomîne: “Tama petêxê Cefanê mîna kîvî ye. Weke hûn jî dizanin li herêma Misirca ya Sêrtê digihîje û gelekî navdar e. Ez bi xwe hewce nabînim bikevim van nîqaşan ji ber ku petêxê Cefanê di cîhanê de yê herî xweş e.”

**“Em pê re nagihîjin”**

Yek ji petêxfiroşê Batmanê Metîn Şen jî di derbarê bazara petêxê Cefanê de ji Basê re diaxive. Metîn Şen destnîşan dike ku; “Daxwazake pir mezin heye ji petêxê bi tama kîvî yê Cefanê re. Li gor daxwaza gel petêxê Cefanê hemû petêxan derbas kiriye. Wisa bûye ku em êdî pê re nagihîjin. Mişteriyên me gelekî daxwaz dikin. Kîloya wê niha ji 75 qirûşan heta milyonek û nîvan diçe. Tama petêxê Cefanê hinek tirş e hinek jî şêrîn û ev tam gelekî tê ecibandin.”

### “Debara me li ser firotina petêxan e”

Şerîf Omer jî pesnê petêxê Cefanê dide û wiha pê de diçe: “Ez bi firotina petêxê Cefanê debara xwe dikim. Ev petêx ji Cefanê tê Batmanê. Ji ber ku li wî gundî çê dibin, navê vê cûre petêxê jî bûye Cefan. Her roj serê sibê bi barekî mezin tê ber destê navbeynkaran û em jî diçin ji navbeynkaran dikirin. Kolan bi kolan, sûk bi sûk digerin û firotina petêxê Cefanê dikin.” Omer dibêje; “Şêniyên Batmanê ji petêxê Cefanê re dihelin. Tameke wê ya tirşok heye. Gelê Batmanê jî ji vê tamê hez dike. Gel herî zêde petêxê Cefanê dixwaze. Em ji eleqeya gel pir kêfxweş in. Ev heftiyek e derketiye bazarê û gelekî daxwaz jê re heye.

# Çekuyê Veşayeyî

**LORÎN DEMÎREL**

Nika Dêrsim de dar-ber, kemer-kuç jîveno û kes nêeşnaweno. O cayo ke kitabê şima yo muqeddesî de ci ra sey cenet behs keno, Uca Dêrsim o. Dêrsim cenetê ma yo. Cayê her kesî, cayê her rûhî Dersim de esto. Şima ke rûhê şima zereyê adirî de veşeno; şima nêzanenê ruh çî yo, veşayîş senîn o. Çend cayî ra adir kewto mîyanê koyan, ê daranê ternan veşneno. Xezalî, vergî û teyrî veşenê.

Şima ke her şodir destanê xo verê tîje de kenê ra, bi xatirê nê vergan û yebanan Heqî ra miradê xo wazenê, nika zereyê şima dejeno. Şima ke heqê her kesî, her mehluqatî hesab kenê. Nika şima damaranê xo de germinîya adirî hîs kena. Koyanê şima ser o Xizir fetelîno (gêreno). O, wayîrê nê koyan o. Ya Xizir, ti ma bîvîne.

Dûyo sîya ame û vejîya serê koyan. Kesî, kewîya asmênî nêdîye. Her kes gina rayan ro, ame verê adirî. Adirî, her çî veşnaybî. Şima bermayî. Zereyê zerrî ra; sey çemê Muzirî. Hesîrê çimanê şima ameyî war û rişîyayî serê adirî. Adir ame rê ziwanî û va; ez se bikerîne? No ke bîyo, ez ey ver ar kena. Şima ke wexto ke verê sacî de nan pewjenê eke bîy têşan verê cû awe danê mi (mi ser o rişnenê) û dima bi xo şimenê. Heyf ke destê mi ra çîyê nêno. Destê înan de her çî beno çeke.

Xezalî, teyr û turî, verê adirî de vinetî. No ke ameyo sereyê ma ser kes nêdîyo. Bese nêkenîme ke vengê xo biresnenîme asmenî; asmen xeniqîya, hewa bêsolix mend. Veşenîme. Ma bêsolix, bêomid mendîme. Şima ke ziwanê ma nêzanenê, vengê ma nêeşnawenê, vengê ma kî esto. Ruhê ma, canê ma kî esto. Hawarê ma kî esto. Kewîya ma de, sipî, sûr û gewrê ma de keskûsûre esta. Nika şodir o, tîje mîyanê dûyî ra vejîna. Her kes destê xo kerdo ra û xo rê dua keno. Sey miloçikanê Îbrahîmî destê ma ra çîyê nêno. Tena wa terefê ma bellî bibo.

Yew esto yew çin o. Heqî benîademî qasê genimî zaf xeliqna. Vewre varaye koyan ser, vewrês ame war û rayîr girewt. Şarê nê şaristanî bêhêvîyîya xo vewran rê qal kerd çunkî hêvîya înan kî sey vewre bîye. Eke erd hît bo hêvîya înan zî vîndî bena, eke erd ziwa bo vewre kom bena. Pey ra na vewre bena top û sey vewrêsî yena rayan û keyeyan ser.

Yew estbî yewna estbî. Qulê Heqî sey vewrêsî zulimkar bîy. Serê nê koyan de hawar kerdene qedexe bî. Kamcîn teyrê kê vengê xo de wend, ame kiştene. Kamcîn dare ke koka xo ser o resye û ameye birnayene.

Yew estbî yewna estbî. Dima ra vîndî bî. Wisar ame serê koyan, vewra serê erdî helîyaye, bîy awe û resaye çemî. Çem resa deryayî û qulê Heqî vindî bîy deryayo bêpeynî de.



Şima ke her şodir destanê xo verê tîje de kenê ra, bi xatirê nê vergan û yebanan Heqî ra miradê xo wazenê, nika zereyê şima dejeno. Şima ke heqê her kesî, her mehluqatî hesab kenê. Nika şima damaranê xo de germinîya adirî hîs kena. Koyanê şima ser o Xizir fetelîno (gêreno). O, wayîrê nê koyan o. Ya Xizir, ti ma bîvîne.

*Çi pêrs kena mi ra bira' m'*
*Welatê mi soja sûr a*
*Adir vora Dêrsim ser o*
*Dar-ber, kemer-kuç jîva*

Şima nêzanê ke Dêrsim de verê cû seba rizqê verg û yebanan destî abenê. No şar dima ra kî vano ke: "bi xatirê înan rizqê mi kî bide ya Heq". Ey Dêrsim, ti her kesî sey xo zanena, ney ra yo ke her kesî rê hem zî zerrîya xo kena ra. Veşena pel bi pel... Veşena. Keyeyê mi, welatê mi, erdê mi. Her çi yo ke seba mi pîroz o nika pêro o veşeno. Vanê ya "kotî şima ke dejeno, ruhê şima uca der o." Nika ruhê mi/ ruhê ma aza/gilê mazêrî ra yo, perra milçikan ra yo û dirbeta/birîna xezalan û pezkovîyan de. Nika ruhê mi zereyê adirê koyanê Dêrsimî der o. Koy veşeno, erd veşeno, asmên veşeno û tîje veşena. Hewrî kom bîy sey sîyayî dumanî. Oyo ke destê şima ra nêno destê asmênî ra yeno. Şilîye varena. Adirê koyê Dêrsimî şanîno we. Welat, dar, xozan û merdimîye... Çimê mi de nê çekuyî veşenê, veşenê û şilîye varena înan ser o, û ginenê erdî ro. Erd çitur (senî) kewe beno? Reyna çitur wisar yeno?

Ez erd a, erdê dewrêşî ya; wazena biqirîye Veng mi ra nêvejîno. Na bêvengîye, bêvengîya goristanan a, bêvengîya mergî ya.



**ÎSMAÎL GUVEN**

## Parafîlî

Mudeyêko dergî ra dima reyna merheba embazê hêcayî. Eke îmkanê mi bibo û edîtorê beşê kirdkî/kirmancî yê rojnameyî zî munasîb bivîno, ez do ewroyî ra dima zî rey-rey tîya de binusa. Seke şima zî texmîn kenê, ez hîna zaf wazena derheqê psîkolojî de binusa. Psîkologbîyayîşê mi hetêk de, babetê psîkolojîkî yê gelekî balkêşî estî. Coka ez nê babetan ser o wendiş û cigêrayîş ra hes kena û wazena bare zî bikera. Ez do no hewte, derheqê babetêka balkêşe û mixerîbe de binusa: Parafîlî yan zî Xerabetîyê Vîjnayîşê Objeya Cînsî. Seke nameyê xo ra zî dîyar beno, nê kesî seba çalakîya cînsî objeyêka şaşe vîjnenî. Yanî kesê parafîlî seba ke bieşkê hetê cînsî ra tehrîk bibê yan zî orgazm bibê, îhtîyacîya înan bi obje, rewşe yan zî kerdenanê mixerîban esta. Eke nê objeyî çin bê yan zî rewşe goreyê înan nêba, nêeşkenî tehrîk bibê û seba orgazmbîyayîşî nêeşkenî konsantre bibê. Yanî êdî ê çîyê mixerîbî seba cuya înan a cînsî benê çîyêkê mecburî. Tîya de peyme "mecburîyet" o. Zaf merdimî cuya xo ya cînsî de objeyanê mixerîban bikar anê yan zî rey-rey seba tehrîkbîyayîşî îhtîyacîya înan bi rewşanê anormalan esta. Eke na rewşa înan wina dewam bikere û mudeyêk ra dima biba perçeyêko mecburî yê cuya înan a cînsî, êdî ma eşkenî ê kesan ra vaje parafîlî. Labelê bikarardişê objeyan nêreso sewîyeya mecburî, ma nêeşkenî ê kesan ra vaje parafîlî. Ma nika zî bîyere tewiranê parfîlîyan ser.

Egzîbîsyonîzm: Merdim organê xo yê cînsî nîşanê kesêkê xerîbî yan zî kesêkî ke tira çîyêko winasî nêpaweno, dano. Merdim na kerdena xo ra zewq geno. Nêeşkeno na kerdena xo kontrol bikero. Reyayîş ra dima merdimî de hîsê poşmanîye û xosucdarkerdiş asenî. Kesê ke xo teşhîr kenî, hema-hema pêro camêrd î.

Fetîşîzm: Eşyayê ke têkilîya xo bi wucudê merdiman estê ( sey solî, tumangewreyî, lepikî…) dîqetê fetîştan ancenî. Nêweşî bi nê eşyayan tehrîk benî. Her çend kerdenê fetîştî bi zafane dewranê gedeyîye de dest pê bikere zî sey xerabetî dewrê biluxî de dest pê kena. Na xerabetîye zî hema-hema tena camêrdan de asena.

Frottorîzm: Nê merdimî bi zafane metro yan zî otobusan de, yan zî mîtîngan de asenî. Hema-hema pêro camêrd î. Organê xo yê cînsî sawenê wucudê ciniyan ra. Merdim tena bi na kerdena xo tatmîn bebo. (Not: Na babete ser o hîkayeyêka Mamosta Roşan Lezgînî esta.)

Mazokîzm: Nê merdimî têkilîyêka normale ra zewq nêgenî, ganî partnerê înan înan bidejno, heqeret bi înan bikero, înan bikuto. Fantazîyê nê kesan wina yê. Tîya de zî camêrdî goreyê cinîyan hîna zaf ê.

Sadîzm: Eqsê mazokîzm, nê kesî wazenê partnerê xo rê heqeret bikerî, dejêko fîzîkî yan zî psîkolojîk bidî ey. Xora tîya de zî zafê nêweşan camêrd î.

Voyerîzm: Nê merdimî têkilîya cînsî ra hes nêkenî. Tena wazenî kesanê bînan temaşe bikerî. Labelê eke bizanî hayîya qurbanî (keso ke ho temaşe beno) bi xo esta, heme heyecan qedîyena.

Travestîk Fetîşîzm: Nê merdimê heteroseksuelî piragirewtişê kincanê cinîyan ra hes kenî. Seba aktîvîteya cînsî îhtîyacîya înan bi kincê cinîyan estî. Wexto zereyê kincanê cinîyan de bê xo hîna rehet-keyfweş hîs kenî.

Nekrofîlî: Nê kesî merdeyan reyde kewenê têkilîya cînsî. Kesê ganî dîqetê nêweşan nêancenî. Nê merdimî bi xeternak ê. Çimkî îhtîmal esto ke bibê serî-qatîl.

Zoofîlî: Nê merdimî heywanan reyde kewenî têkilîya cinsî. Labelê seke ma cor de zî vatbi, eke na kerdena înan seba tehrîkbîyayîş yan zî reyayîşê înan biresa sewîyeya mecburî, o wext ma eşkenî vaje zoofîlî.

Pedofîlî: Nê nêweşî bi taybetî ê gedeyî ke hema nêkewtê dewrê biluxî yan zî hema newe kewtî, înan ra tahrîk benî. Temaşekerdiş yan zî temas heyecanêka pîle dana nêweşan û bi no hewa zewq genî. Zafê nêweşan gedeyîya xo de rastê îstîsmarî ameyî. Goreyê cigêrayîşan nêweşê pedofîlî weş nêbenî. Dareyo ke dîyeno, tena waşteyê înan o cînsî keno kung-kişeno.

Kerdenê parafîlîkî bi zafane 18î ra ver asenî û 25 ra dima hêdî-hêdî kêmîyenî. Parafîlî zî hetêk ra maneno Xerabetîya Kontrolê Împulsan. Çimkî tîya de zî zeîfîya kontrolî esta. Merdim tahrîk beno, xeletîya kerdena xo ra haydar o; labelê nêeşkeno bikewo vernî. Reyayîş ra dima zî poşman beno, xo sucdar keno. Tedawîyê parafîlîyan goreyê kesayetîya nêweşan vurîyeno. Eke nêweş, nêweşîya xo û tedawî qebul bikero, şansê serkewtişê tedawî zêdîyeno. Heto bîn ra eke sewbîna nêweşîyê merdimî bibê, ancîya tedawî beno zehmetin. Eke dormaleyê şima de zî parafîlîyêk esto, hêverî seba tedawî îqna bikerîn. Çimkî nê nêweşî tedawî qebul nêkenî. Coka zafê nêweşan hetê dezgehanê edlî ra sewqê psîkîyatrî benî. Tedawîyê nêweşan hem bi psîkoterapî hem zî bi dareyî beno.

Pers û Cewab:

# Harûn Bozkurt

**Kam o?:** Harûn Bozkurt çêrmûgi o û aktîvîstê kirmanckî yo.
**Çirê o?:** Nê serranê peyênan de tayê embazê neweyî ke kirmanckî reyde "zerrîya zerrî ra" eleqedar benê vejîyayî. Û ê waad kenê ke seba ziwan û kulturê ma xebatan bikerê. Bozkurt zî înan ra yew o.

**Ma wazenê verê to nas bikê. Harûn Bozkurt kam o?**

Ez serra 1987î de dewa Çêrmûge Hesto de ameya dinya. Heta çar serreyîya xo dewe de ciwîyaya. Mi lîse Osmanîya de wend. Lîse ra dima mi Unîversîteya Balikesîrî de beşê mamostatîya ziwanê tirkî wend. 2014 ra heta ewro Dîlok (Entap) de mamostayîya tirkî kena. Zewecîyaye ya û yew lajê mi esto nameye ey Mizafer Roşan o.

**Eleqeyê to bi kirmanckî senî dest pêkerd?**

Wexto ke ez unîversîte de bîya kitabxaneyo ke ez û embazanê xo ya ma tim şîyê uca de ez raştê yew ferhengê kirmanckî amebîya -xora ma tim nê tesadufan ser o kewtê ziwanê xo pey ra -Mi hema ferhengî girewt destê xo yew bi yew rîpelê ci wendî. Ê çekuyê ke mi qeçeqîya xo de dapîra xo û maya xo ra eşnawitê tamê ê çekuyan reyna kewtbî bi fekê mi. Û dima yew kila adirî kewt zerrîya mi. Sereyê mi ra cêr ereqî mîyan de mend. Ziwanê dayîka mi bi feqet mi her rîpelê ferhengî çerx kerdê çekuya ke mi heta o wext qet nêeşnawitbî çimanê mi verde bîye. A roje mi o ferheng hêrîna û a kila ke kewt zerrîya mi bi sayeyê aye mi bala xo daye ziwanê xo ser.

**Qaso ke ma zanê to merkezê MAUZEMî yê Unîversîteya Artukluyî ra bi perwerdeyê dûrî kursê kirmanckî dî û serrêk dima eynî unîversîte de mastero bêtez qezenc kerd. Ti şênî biney qalê nê prosesan bikî?**

Sera 2014î de Unîversîteya Artuklî de seba lîsansê berzî ez kewta yew îmtîhan. Feqet o wext melumatê mi kirmanckî ser o zaf nêbi û mi nêşa îmtîhanî qezenc bikerê. Tabî dima MAUZEMî a serre bi perwerdeyê dûrî kursê kirmanckî akerd. Yew mamostayê ma yo gimgimijî no kurs da- tabî mi heta o wext gimgim kotî yo nêzanayê- Ez bi sayeyê nê roportajî mamostayê min o gimgimijî (M.C.) rê reyna zaf teşekur kena. Na raywanîya ziwanê ma de mi rê hetkar bi. (Tabî MAUZEMî sertîfîkaya mi bahdê dîna serî şawitbî. O zî sey mi tim înan rê meîl şawitbî seba sertîfîka. Ez wunî hêvî kena ke merdêkî mi ra ecizyayê hema bi nameyê "Kusrê Kurmanckî" yew sertîfîka mi rê şawitbî. Wa qe bibo a zî lehçeye ma ya.) Seke şima zî va serrêk dima mi lîsanso bêtezo kirmanckî qezenc kerd.

**Ti kamcîn nuştox û şaîranê ma ecibnenî? Rewşa kirmanckî û sewîyeya xebatanê kirmanckî ser o fikrê to çi yo?**

Nê seranê peyênan de kes nêşêno vajo ke kirmanckî de xebatê edebîyatê ma tay ê. Verî kovar û rojnameyan de di-hîre rîpelan de kirmanckî zar-zor ca girewtêne. Feqet newe welat de kovar û rojnameyê ke tena kirmanckî çap benê estê. Weşenxaneyê ke tena kitabe kirmanckî çap kenê ronîyay. Şîîre, roman,hîkaye,estanik û hîna zaf kitabê kirmanckî weşanîyay. Nê seba kirmanckî kare zaf baş ê. Labelê çi heyf ke şarê ma yo ke nê xebatan ra îstîfade kene zaf nîyê. Û zafê ci zî nê xebatan ra bêxeberê. Ma rê wendoxê kirmanckî lazim ê!

Seba mi nuştox û şaîrê ma yê kirmancî pêro zî qiymetin ê. Yew nuştoxê ma yo erjaye wuna vatbi : ''Kamo/a ke kirdkî (kirmanckî) rê xizmet keno/a, kamo/a ke kirdkî rê xizmet kerdo, ez hemîne rê hurmet kena, cayê hemîne ha yo sere û çimanê mi ser!" (M. Nêşite) Îşte felsefeya mi tam zî no yo. Ez pêrune rê zî hurmet kena. Feqet tayê nuştox û şaîrê ma estê ke cayê înan sewbîna yo. Verê verkan nuştoxê ''Mewlidê Kirdî" Ehmedê Xasî, dima mamosta Malmîsanij, J.Ihsan Espar, Murad Canşad, Denîz Gunduz, Bedrîye Topaç, Nadîre Guntaş Aldatmaz... Hîna edebîyatê ma de zaf nuştox û şaîrî estê la mi tena nameyê çend kesan tîya de zikir kerd. Tabî ez tîya de bi musadeyê şima seba yew nuştoxê ma yo erjaye rê yew parantez akera. Mi ke çi wext yew xebata kirmanckî nuşte mi hema şawite nê nuştoxê ma rê. Ey tim nuşteyê mi bêmînet wendî, kerdî raşt, yew bi yew mi rê xeletîyanê mi vatî û mi rê tim moral da. Roja ke mi o nas kerd a roje ra heta ewro mi tim xebatanê ey ra îstîfade kerd û eke Ellah emr bido ez hewna zî îstîfade bikerî. Seba emeganê ey, mamosta Roşan Lezgînî rê reyna zaf teşekur kena û ci rê hurmet kena.

**To demo peyên de kamcîn kitab wend? Xebatê ke to kerdê yan bikê estê? Eke estê çi yê? Warê kirmanckî de xeyalê to çi yo?**

No demo peyên de mi kitabê Mihanî Lîcokicî ke Weşenxaneyê Roşna ra çap bîyo wend. ''Meymanê Homayî" seba kesê ke mîzahî ra hes kenê, ez şêna înan rê tewsîye bika. Ez zimistanî ra nata şîîrê kirmanckî ke rojname û kovaran de nusîyayê înan arê dena. Ez wazena ke ''Antolojîyê Şîîranê Kirmanckî" bîyarî meydan. Warê kirmanckî de xeyalê min o gird no yo: Seba şarê ma xebatê erjaye pey de xo verdayîş. Ez tena ney vazena. Peynîya nê roportajî de ez şima rê zaf teşekur kena û bi nê misrayan şima rê selamî kena:

...

"Pê zûn' xo wa aw bid', dar û gilê ma
Zûn' xo welat bizan, şad bik' dile ma
Adir di veşa, hewn a bik' kile ma
Xorto, keyna biwan,bimus zazakî!"*

...

*Umer Farûq ERSOZ ''Bimus Zazakî",Newepel,Rojnameyo kulturî yo 15 roje, Hûmare 18,Dîyarbekir,01-15 Kanûne 2012, r.8





# Şima zanayêne ke...?

*Ansîlopedîyê franskî ke serra 1799î de çap bîyo de ameyo nuştiş ke Dîyarbekir paytextê Kurdîstanî yo.*

*Bajarê Kurdîstanê Başûrî Hewlêr bajarêko zaf kehen o û naye ra şeş hezar serrî verê cû awan bîyo.*

*Nameyê 22 dewanê Azerbaycanî de çekuya "kurd" esta.*

*Goreyê bawerîya Xaçatûr Abovyan o ke bingeyê edebîyatê armenîyan ronayo, kurdî comerdê Rojhelatî yê.*

*Ziwanzano amerîkayij Michael Chyet, 29 ziwanan zano. Hîrê lehçeye kurdkî; kurmanckî, kirmanckî û soranî zî tede.*

*Keyeyê Bedirxanîyan ra Kamil Beg (Bedirxan) emrê xo paytextê Gurcîstanî Tiflîs de vîyarnayo û uca averşîyayîşê kulturê kurdan de rolêko pîl kay kerdo. Heyf ke mezela ey vîndî bîya (bîya kor), bi serran dima wextê virazîyayîşê rayîrî de bi hawayo tesadufî ameya dîyayene.*

*Tirkîya de cuntaya leşkerî ya 1980î zafê dewanê kurdan ê ke nameyê înan bi kurdkî bîy kerdî tirkî. Nimûne; Agirî de 376, Wan de 426, Mûş de 289 û Bidlîs de 229 dewî.*

*Kurdan, weşangêrîya televîzyonî de tewr verî serra 1992 de Kurdistanê Başûrî de û bi hîrê televîzyonan (TV Kurdistan, Gelê Kurdistan, TV Xebat) cayê xo girewt.*

*Keso ke Diwanê Herbî de derheqê Mustafa Kemalî de qerarê îdamî dayo bi nameyê Mustafa Yamulkî Paşa yew kurd bî.*

*Serekwezîranê Pakîstanî yê verênan ra Benazîr Butto ke 2007 de netîceya yew suîkastî de kişîyaye kurd bîye.*

*Ala kurdan Bakur de reya verêne wextê serewedaritişê Şêx Seîdî yê 1925î de Gimgim (Varto) de, qonaxê hukmatî ra ameye dardekerdiş*

*Şîrketa hewarayîrî ya yewine ya kurdan Kurdistan Airlines 2005 de ronîya. Çar teyarayê şîrkete bi ala Kurdîstan û amblema şîrkete ameybî xemilnayene. Firrayîşo yewin Hewlêr û Dubaî mîyan de bî.*

*Hetê kurdanê vakurî ra serrnameyo (teqwîmo) tewr verên1986 de Swêd de hetê KOMKARî (Komelaya Karkerên Kurdistan Li Swêdê) ra ame vetene.*

*Bi nameyê Şêxmus El Zeynî yew kurdî 1988 de Musebaqaya Golfî ke Lubnan de virazîya de Xelata Zerrnêne girewte.*

*Tirkîya de albumê kurdkî yo tewr verên o ke sey cd (compact disc) vejîyo albumê "Dûrî" yê Ciwan Hacoyî yo.*

*Kitabê kurdkî yo tewr verên o ke metbaaya modernî de çap bîyo Mewlîdê Kirdkî (Mewlîdê Nebî) yê Mela Ehmedê Xasî yo. No kitab eynî wext de esero tewr verên yê lehçeya kurdkî yo û 1899 de Dîyarbekir de Çapxaneyê Lîtografya de 400 nusxayê ey çap bîyê.*



## Yew Mamostayê Kurdçitîye:

# Xelîl Xeyalî -I-

PÊŞAR BEXTEWER



Goristanê Asrî yê Cebecî / Anqara

Destpêkê seserra vistine dewrê xurtbîyayîşê fikrê kurdpewerî yo. Nê serran de çi legal çi îllegal cemîyetê kurdan abenê û çarçewa miletperwerîya kurdan de xebatê kulturî û komelkî benê. Roşnvîr û wendeyê kurdan meselaya miletê xo ser o sereyê xo dejnenê. Gelek şexsîyetê ê demî bi fikir, pratîk û eseranê xo ewro bi hurmet û mînet yadkerdişî heq kenê û heta bi heta zî bikê. Qet şik çin o ke nê şexsîyetan ra yew zî Xelîl Xeyalî yo.

Xelîl Xeyalî eslê xo de modanij o (Bidlîs), mensubê eşîra Modanî û kurdêko kirmanc o. Goreyo ke mezela ey ser o nuseno Xelîl Xeyalî serra 1864î de ameyo dinya. Wendişê xo yo verên Dîyarbekir de temam kerdo, dima şîyo Îstanbul û uca unîversîte wendo. Xelîl Xeyalî Beg, dewrê osmanîyan de kadroyanê cîya-cîyayan de memurî kerda, terw peynî de hesabdarê (muhasebeci) Mektebê Zîreetî yo Berz yê Halkaliyî bîyo û nê karî ra teqawut bîyo.

> Xelîl Xeyalî eslê xo de modanij o (Bidlîs), mensubê eşîra Modanî û kurdêko kirmanc o. Derheqê serra mayaxorabîyayîşê ey de yew qeydo qetî çin o labelê îhtîmalo pîl mabênê serranê 1848 û 1850 de ameyo dinya. Wendişê xo yo verên Dîyarbekir de temam kerdo, dima şîyo Îstanbul û uca unîversîte wendo.

**Rêxistinê ke Xelîl Xeyalî tede ca girewto**

**a)Kürt Teavün ve Terakkî Cemiyeti:** No cemîyet, 19 êlule 1908 de hetê Şêx Ebdulqadir û Emîn Alî Bedirxan ra Îstanbul-Veznecîler de ronîya. Gelek endamê ey estbîy û fikrê cîya-cîya binê banê ey de ameybî têlewe. Bi kilmîye amancê Kürt Teavün ve Terakkî Cemiyetî nê bîy; mekteban akerdene, wezîfeyanê îdarî û muhakeme rê tayînbîyayîşê kurdan temîn kerdene, kurdkî sey ziwano fermî dayena qebul kerdene. Cîya-cîya barajaranê Kurdîstanî de unîversîteyan akerdene, bi ziwanê dayîke rojnameyanê sîyasîyan û kovaran vetene, meclîs de bîyayîşê temsîlkaranê kurdan temîn kerdene û ekonomîya Kurdîstanî aver berdene. Zinar Sîlopî (Qedrî Cemîl Paşa) nuşto ke Xelîl Xeyalî ronayoxanê cemîyetî ra yo. Goreyê neqilkerdişê Celîlê Celîlî zî, o îdarekeranê cemîyetî ra yew o.

**b)Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti:** Ancîya goreyê vateyanê Zinar Sîlopîyî Xelîl Xeyalî ronayoxanê nê cemîyetî ra yo. Talîmnameyê Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti de nusîyayo ke Xelîl Xeyalî Efendî ronayaxonê nê cemîyetî ra yew o.

Mektebê Kurdan (Kürt Okulu): Ancîya goreyê îfadeyanê Sîlopîyî eynî dewir de netîceya lebat û keda roşnvîranê kurdan yê ê demî semtê Dîvanyolu yê Îstanbulî de bi nameyê Meşrutiyet Mektebi (Mektebê Meşrutîyetî) yew mekteb abî. Mektebo ke mudirê ci Kurdîzadê Ehmed Ramîzo Licêyîj bî, kesê ke abîyayena ey de rol û keda înan esto, Xelîl Xeyalî yewê înan o.

**c)Kürt Talebe - Hêvî Cemîyetî:** Tayê wendekarê kurdî ke Îstanbul de Mektebê Zîreetî yo Berz yê Halkaliyî de wendêne amey têhet û 1912 de bi nameyê Hêvî yew komele ronaye. Goreyê vatişanê çend ronayoxan yê na komele, ronîyayîşê nê cemîyetî de tesîrê teşwîq û ardimanê Xelîl Xeyalîyî zaf gird bîyo. Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopi) xatirayanê xo de wina behsê rolê ey kerdo:

"Ez 1911 de ez şîyêne Mektebê Zîreetî yo Berz yê Halkaliyî. Ma tayê wendekarê kurdî ke mekteb de wendêne bi hawayo xorîn eleqedarê meselaya milî bîy û ma aye ser o soxbet kerdêne. Xelîl Xeyalî Begê muhterem o ke ê wextan memurê hesabdarîye yê mektebî bî, îrşad û teşwîqkerdişê ey hîsanê ma yê milîyan zaf kerdêne xurt. Ma embazan reyde bi hawayo îtîfaq qerarê ronîyayîşê yew cemîyetê talebeyan yê kurdan da. Ez, Omer Cemîl Paşa, Tewfîq Bego ke mebusê Wanî bîy, lajê ey Fuat Temo, Cerrahzede Zekîyo dîyarbekirij pîya bi rojan camîya mektebî de kom bîy û nîzamnemeyê Hêvî tanzîm kerd, dima 1912 de ruhsato fermîyo ke luzum kerdêne hukmatî ra girewt û ronîyayîşê Hêvî îlan kerd."

Ancîya derheqê Xeyalî de vatişê Ekrem Cemîl Paşayî hem muhîm hem zî balkêş ê:

"…. 1912 de Cemîyetê Talebeyan yo Hêvî bi hawayo fermî ronîya. Ez do derheqê kesêkê ruhêxoberz û xîretin de; derheqê kurdêkê zaf pîlî ke ey Îstanbul de talebeyanê kurdî rê bi hawayo cidî û sexlam mamostatîya kurdçitîye kerdêne de çend vateyan vaja. No keso ke ez do qalê ey bika, no kurdo pîl, Xelîl Xeyalî Begê Motkîyij o. Nê zatî tehsîlê xo Dîyarbekir de kerdbî. Kurdperwerêko roşvnvîr û bixîret bî. Kurmanckî, zazakî, tirkî, fariskî û erebkî baş zaneyêne. Franskî sewîyeya wendiş û nuştişî de zanayêne. Ma ciwananê kurdan, no zato muhterem Îstanbul de 1909 de nas kerd. Ê wextan emrê ey pancasî ra zêdeyêr bî. Hesabdarê Mektebê Zîreetî yo Berz yê Halkaliyî bî. Rojanê îneyan ameyêne Qewexaneyê Dîyarbekirî yê Dîvanyolu û ma dormayê xo de kom kerdêne. Ma rê kurdçitîye, tarîxê kurdan, egîdî û mefarîhê kurdan ra zaf çî vatêne. Peynîya qiseykerdişê ey ê tarîxî, milî û edebî nêameyêne. Ma ciwanan o bi eleqeyêko gird, bizewq û biheyecan goşdarîya nê qiseykerdişan kerdêne û ci ra zaf çî musayêne. Nê zatî ciwananê kurdan ê ke Îstanbul de mendêne rê vîst serrî mamostatîya kurdçitîye kerde. Gama ke naye kerdêne zî bêzarî û rincan nêbîyêne. Ez wexto ke 1929 de hepisxaneyê Kastamonu ra vejîya, ey ra dima mi zaf rey o zîyaret kerd. Vanê di serrî yo ke nêweş bîyo û cile de rakeweno. Gama ke mi 1929 de Îstanbul terk kerdêne ez şîya ey het û mi dî ke neweşîya nê kurdê pîlî hîna giran bîya."

**d)Kurdistan Teali Cemiyeti:** Zinar Sîlopî wexto ke ronayoxanê nê cemîyetî hûmareno wina vano:

Wexto ke herb bi mutarekeya Mondrosî qedîno welatperwerê ke Îstanbul de manenê seba ke huqûqê milî yê Kurdîstanî temîn bikê bi nameyê Kürdistan Teali Cemiyeti yew cemîyeto sîyasî teşkîl kerdbî. Bedîuzzeman Mela Seîd, Hemzê Begê Muksî, Xelîl Xeyalî Bego Motkîyij began dest bi fealîyetan kerd û înan cemîyetî rê endamî qeyd kerdêne.

### Warê Ziwanê Kurdkî de Xebatê Xelîl Xeyalîyî

Xebatê Xelîl Xeyalî ke ey kurdkî ser o kerdê tewir bi tewir ê. Her çîyî ra ver ey alfabeyêka kurdkî nuşta. Hetta merdim eşkeno vajo ke çend kesanê ke albeya kurdkî ya verêne nuşta înan ra yew zî o yo. Goreyê vatişê Zinar Sîlopîyî Xelîl Xeyalîyî yew ferhengê kurdkî zî amade kerdo. Eke no zanayîş raşt o, çend kurdanê ke reya verêne ferhengê kurdkî nuşto yewê înan zî Xeyalî yo.

Goreyê nuşteyanê Saîdê Kurdî û Zinar Sîlopîyî Xeyalîyî gramerê kurdkî zî amede kerdo. Ancîya ma nuşteyanê Sîlopî ra musenê ke Xelîl Xeyalî seba ke gramerê kurdkî amade biko demêk Zîya Gokalp reyde xebitîyo. Çend kesê verên ê ke ke tirkî ra metnî çarnayê kurmanckî ser, înan ra yew zî o yo. Hûmara dîyine ya kovara Rojî Kurd de yew şîîra şaîrê tirkan Mehmed Akif Ersoyî ke hetê Xeyalî ra çarnîyaya kurmanckî ser ameya weşanayêne. Heto bîn ra nuşteyê ey ê kurdkî ke Rojî Kurd de (1913) de weşanîyayê, nimûneyanê tewr verênan yê nesîranê (düzyazı) kurmanckî ra yê.

Nînan ra teber çend nuşteyê cidîyî ke Xelîl Xeyalî derheqê ê ziwanê kurdkî de nuştê resayê destê ma. Nê nuşteyê ke tayê înan bi kurdkî û tayê înan zî bi tirkî nusîyayê kovaranê Rojî Kurd û Jîn de neşr bîyê. Tayê cigêrayîşê ey yê derheqê kurdkî ke ey dayê Musa Anterî senî ke ma cêr ra behsê ci bikê heyf ke vindî bîyê û şîyê.

Ma nê heme xebatan ra girêdaye eşkenê vajê ke çend kurdê verên ê ke kurdkî ser o xebitîyayê, Xelîl Xeyalîyî yewê înan o.

*Dewam keno.*

# Referandumê Kurdîstanî ho se Beno?

EHMEDÊ DIRIHÎ




Seke zafînê şima wendoxê ma zanî, seba ney hûmara 24. ya hewtenameyê 'bas' de mi vateyê xo nuştbi. 7 hezîrane de serek Mesud Barzanî, mîjdanî dabi ma kurdan û dinya alem pêhesnabi. "25 êlule de Referandumê Xoserîyîya Kurdîstanî virazîyeno"! A roje ra pey yew het ra şarê kurdî, heto bîn ra dost û dişmenê kurdan; her kes ha vateyê xo vana/vanê, kerdene xo anê ca.

Ewro dinya de, seba ney hîrê per hê asenî:

Mileta Kurdî : Wayîrê erdê Kurdîstanî yî.

Tirkîya, Îran, Îraq û Sûrîye: Çar heme dewlete zî, degirewtoxê Kurdîstan î.

DYA (Dewletê Yewbîyayeyî yê Amerîka) û dostê nînan î.

Hîrê heme hetî, safê xo vera – vera hê şedînenî, vateyê xo roj bi roj zelal kenî.

Kurdî wazenî erdê bawkalanê xo de, sey her milet dewleta xo pîyeranî û tede biciwîyî. Degirewtoxê Kurdîstanî zî, çi rey ney qebul nêkenî. Wazenî heta bi heta erde ma ser o serdest bibî û ma zî bindestîyê înan bî. Çar hemin vateyê xo kerdo yew şêdînayo, yew heta ma kurdan xapînenî û verdenê yewbînan, heto bîn ra vera dinya-alem hema zî xo heqdar vejenî.

Verfekê Hukmatê Tirkîya, Bekir Bozdag o Kurd, vateyê hemîne ano ziwan: Referandûmê Xuserîyê Kurdistanî:

. Pêroyîyê erdê Îraqî nêpaweno.

. Yewîya sîyasîyî ya Îraqî xeripneno.

. Qanûnî nîyo !

Eke ma bala xo bidi înan ser, ma vînenî ke no vate seranser xap o, xapik o. Û pê kurdînezan o yozgatij, hê ma ser o dek û dolaban çarnenî.

Çunke erdo ke pawîyeno, erdê kurdan o. Yewîya sîyasîyî ke xerepîyaya, yewîya ma kurdan a. O ke qanûn nêşinasneno, barê kurdan nêdano degirewtox o. La çarnenî çepernenî, yew heta ma tersnenî, heto bîn ra ma xapînenî û verdenê yewbînan, heto bîn ra vera dinya alemî xo heqdar vejenî.

> Kurdî wazenî erdê bawkalanê xo de, sey her milet dewleta xo pîyeranî û tede biciwîyî. Degirewtoxê Kurdîstanî zî, çi rey ney qebul nêkenî. Wazenî heta bi heta erde ma ser o serdest bibî û ma zî bindestîyê înan bî.

Êdî hîn serekê ma esto, kesek rew – rew nêşkeno ma bixapîno. Vera vateya nînan, eke ma mîyanê xo ra sînoran wedari, mileta kurdan rasena têhet û dewleta Kurdîstan awan kena.

Yew het ra erebê serdestî, heto bîn ra kurdên bindestî yew dewlete de pîya biciwîyî, uca de yewîya sîyasîyî qeyîm nêbeno. Ma kurdî se serre beno ke hê ney vînenî û pa no derd û kula ciwîyenî. No yewîya sîyasî ke hê vanî, roj bi roj ho beno sist û rojêk yeno xo bi xo ci qerefîyeno, peynî de ma benê cîranê yewbînan. La çîyo ke ma seserra hê vînenî: Degirewtoxan seserre cuwa ver ra nat, pa peymana Syces Pycot a, erdê ma kerde di cay, ney ra pey kerdî çar lete. Eke ma kurdî bieşkê pîyerasî, hem welatê ma beno yew, hem zî dewleta ma bena yew.

**Kurd hê se kenî ?**

15 temmuze de Hereketa Azadî, partîyê PAK, PDK Bakur, PDKT, PSK, OSP Dîyarbekir de amey têhet û komxebate viraşte. Komxebate de paştgirî dîya Referandumê Xoserîya Başûr. Seba ney qerar dîya ke, rêze-konferans bivirazîyî û sefaretê dewletanê cîhanî pêbihesnîyî û paştgirîya înan zî biwazîyo.

Verfekê Ciwanê Netewî yê Kurdistanî, Jîyan Tîmurtaş seba referandumê Kurdîstanî beyan da û va ke; Ma hê verî Dîyarbekir de, dima ra verê berî Îbrahîm Xelîlî de yenê têhet û kom benî. Uca ra 11 êlule de pîyor pîya, peyatî danî rayîr û 24 êlule de vernîya banê parlamentoyê Kurdistanî de seba referandûmê xoserîya Kurdîstanî, beyan danî çapemenîye. Ma paştgirê na xebate nîyî, hetkarê na xebate yî.

Ez raşt vajî, verfekê ciwananê ma, ca ra yê zerrê mi ardo ziwan. Homa kemaney şima ciwanan, çi rey nêdo mileta ma!

Sîyasetmedarên kurdanê Ewropayî, 'Referandumê Xoserî seba heme Kurdîstanîyan, hêvîyêka zaf pîl a'. Homa hêvîya şima çi rey nêşikno, terkwelatên ma.

Verfekê HDP / PDŞ (Partîya Demokrat A Şarî / HDP) Osman Baydemîr serê de va " sandiq de reyanê Ê. Ê bidên ke, moralê şarî kurdî wa berz bo". Dima ra Qendîl ra pêdima şeqezîya û hêna zirtabozê xo cibirna.

Belê, ewro hel aya hel a. Bakûrê Kurdîstanî, zerrî ra paştgirî dano referandumê Xoserbîyayîşî yê Başûrê Kurdîstanî.

Elî Qazî : 'Referandum mehsulê gonîya şehîdanê çar parçayanê Kurdistanî yo'.

Kurdê Surîye bîlê xo bîyî, ewro siba hêna kuwenî bindestîya ereban.

Kurdanê Başûrî ser o Elî Ewnî çi weş salix dayo: "Nê kamî hê vera xoserîyê ma (Kurdistan) vindenî ? Êyê ke kampanyaya nêxêr saz kenî, êyê ke vera referandumî kuwenî kuçeyan û êyê ke seba ney gureyan pereyan xerc kenî, perey pîrbabê înan vera Şêx Mehmûd bîy, vizêr babî înan vera Mela Mistefayî bî, ewro zî torinê înan hê vera Serek Mesud Barzanîyî vîrace kenî.

Bajarê Silêmanîye de qefleyêkê sîyasî, rojnameger û aktîvîst seba referandumê xoserî, dest bi kampanyaya nêxêr kerdo. Verfekê hereketê referandumî ra eka nê/nî, Rabûn Maruf, kombîyayîşê çapemenîyî de vano "Ma ewro ra pey xebata kampanyaya xo bi hawayo fermî dest pêkerdo".

Maruf vano, 'Ma xebitîyenî ke, wa referandumê 25 êlule betal bo. Eke herêma ma de seba xoserîyê şert bêrî ca, o mehel ma ke bieşkî referandum bivirazî'.

La şertê înan çî yo, senî yeno ca nimtikî yo, hema zî eşkera nêbîyo.

Endamê Hereketê Goran, Nizar Mehmûdî, Rûdawî ra vato: "Parlamenter Rabûn Mehmûd sey parlamenter nê, sey hemwelatîyek kampanyaya nexêr de ca girewto. Hereketê Goran, o nêşawito û nêvato kampanyayêka winayin de ca bigîrî. Çinke eke Goran biwazo kampanyayêka nexêr bivirazo, naye eşkera keno û ney ra nêşermeyeno, nêke haya keno"!

Ez zî vana, "Homa hîşê înan bîyaro pîyeser û mera rayîro rast bivînî".

### Dostê kurdan

Ê ke vera çar dewletan, timûtim eşkera ma de dostê xo hê ramojnenî, cihûd î. Roja verêne ra nat, qij ra pîl heme cihûdî hetkarê ma kurdan î. Seke ma ra yew ! Homa kemaney înan çi rey nêdo ma. Xasîya şima estî, cîranê ma yê erjayeyî!

Dişmenê kurdan hê se vanî ?

HeyderEbadî :

"Referandumê Kurdîstanî, qanûnî nîyo; ma nêşinasnenî"!

'Bina hayeyê ey pê çîn o ke, referandum ra pey eke rayê erê/ê hîna zaf bo, çewê Kurdistanî hîn serwezîrê dewleta Îraqî zî nêşinasneno. Ti qet meraq meke Heyderê ma'.

Rojhelatê Mîyanên de nameyê tengasîyî yo neweyî : 'Seba awe şerkerdiş o'! Dewleta Îran, ziwayî mahne kerd û çemê awa Zêyî ser o, qapaxê hîrê heme bendawan (Dokan, Derbendîxan û ...) pa da. Awa ke şina bendawanê Kurdîstanî cibirna.

Referandûm taloqkerdiş/peydeeştiş

Verfeka wezîrîya teberî ya DYA Heather Nauert çapemenî rê beyan dayo û vato: "Ma feh mkenî ke kurdî çira hê referandumê xoserî wazenî. La çîyo ke ma aswasî de verdano, peynîya referandumî de gefê DAÎŞ î bîyaro vîrakerdiş".

Serek Mesud Barzanîyî, wezîrê teberî yê DYA, Rex Tilersonî rê cewab dayo û vato: "Referandum eke nika nêbo, hîn çi mehel beno? Tek yew şert a, ma Referandumê Kurdîstanî ra ravîyarenî. Eke alternatîfê referandumî, rasterast îlanê Kurdîstanî bo"!

### Qala peyene

Serê dinya û alemî de kemaneya dewleta Kurdîstanî, kemaneyêka zaf pîl a. Heq a rojek vercê herindê na kemaney de bo. Gedeyê Kurdistanî zî sey miletanê bînan, NY de cayê xo bigîrî û vateyê xo vajî. Ma raşt vajî, gonîya pêşmergeyan a ke rişîyaya, rewna ney kerdo heq.

Birayê erjayeyî û wayên delalî yê Kurdîstanê Başûrî: Hêvîya ma heme kurdan şima yî. 25 êlulê de şêrê serê sandiqan. Reyê xu yê Ê/Erê bidên, wa dinya alem hîn ma kurdan bişinasno. Û ma pîyor pîya şabibî ke, mîyanê dewletan de cayê ma zî ho abeno û ma hîn kitimê ra xelesiyenî!

Û ma gazîn kenê heme dinyayî rê: Bes o hîn, hawara azadîya mileta ma kurdan hîn beşnawên û dest bidên Kurdîstanî.

Wa her kes ney hol bizano ke: Kurdîstan welatê ma wo û ma qet dizerîyê nêkenî. Homa bîyaro wêrî, rojek vercê nê erdê xo ma degirewtoxan ra tepîya gênî.

Awa ma esta,
Petrol û gazê ma estî,
Koyan ser o baxçe û daristanê ma estî.
Deştê ma hê robarana ma wa, aw dîyenî.
Ma xemê kesî nêkenî.
La ma heme kurdî, hema zî kitim î.
Ma rojek vercê na şarmezarê xo ser ra wedarenî û benî wayîrê nasnameyî.
Dima ra ma benî wayîrê dewleta Kurdîstanî.
Wa şikê kesî tede nêmano !

# Ji her aliyî ve referandûma Kurdistanê



DENİZ ÇİFTÇİ

Dema ku em dîroka gelan dixwînin dibînin ku dîrok her dem xiyanetê li gelan nake, heta gelek caran gel xiyanetê li dîroka xwe dikin. Ev cara yekem e ku Kurdistana Başûr bi rengekî cidî biryara referandumê daye. Lê ev referandûm bû sedema gelek nîqaşan û heta bû sedema krîzekê jî. Nêzîkbûna Tirkiyê, Îran, Bexda û gelek dewletên din wek dihate texminkirin bû ku jixwe fikrên wan diyar bû. Lê mixabin hin partiyên Kurdan an bi zimanekî eşkere an jî li paş deriyan li dijî referandûmê siyaseteke gelekî qirêj dimeşînin. Baş e, sedema van rexneyên navxweyî çi ne? Eger referandûm neyê îlankirin gelo talûkeyên çawa li pêşiya Kurdistanê ne? Ji bo çi partiyên Kurdan referandûmê li ser naverok û wateya wê nanirxînin û referandûmê dixin mijara siyaseta rojane? Di vê nivîsê de ez dixwazim mijara referandûmê ji her aliyî ve binirxînim.

Kêşeya herî mezin a di derbarê referandûmê de nêzikbûna partiyên Kurdan û propagandeya wan e. Wek baş tê zanîn ku YNK û Goran her çiqas dijî serbixwebûna Kurdistanê nebin jî, dijwariyeke zexm li dijî dîroka referandûmê û siyaseta PDK nîşan didin. Ev partî bi taybetî jî dixwazin meseleyên gendeliyê were çareser kirin û referandûm bi destê parlamentoya Kurdistanê were îlan kirin. Ev daxwaz ji her alî ve di cih de ne û rastî jî gerek bû pêkanîna referandûmê bi rêya parlamentoyê bihata îlankirin. Di vê mijarê de rexne di cih de ne. Ji ber ku ev hem di nava Kurdan hem jî di nav dewletên Ewropayê de dibe sedema rexneyan û dibêjin ku serbexwebûna gelekî divê bi rêya hemû partî û heta saziyên civaka sivîl ve bihata pejirandin û îlankirin. Bi kurtasî ev rê û metodeke demokrasiyê bû. Lê mixabin, her çiqas ev rexne di cih de be jî divê partiyên Kurdan di platformên derve de zimanekî tund li dijî referandûmê bi kar neyînin. Ev partî dikarin rexneyên xwe li dijî PDK û siyaseta wê bînin ziman. Lê dema ku dijayetî an jî rexneyên wan vedigere dijayetiya referandûmê, wê demê rengê mijarê jî diguhere. Heke ev partî bi rastî jî dixwazin PDK têk bibin, dikarin piştî referandûm û serxwebûnê di hilbijartinê de vê yekê pêk bînin. Lê dijayetiya referandûmê destê wan dewletên li hemberî serxwebûnê disekinin bi her alî û awayî xurt dike. Nêzîkbûneke vî rengî referandûmê dike mijareke siyaseta rojane û referandûmê ji armanca wê dûr dixe. Bi gotineke din, ev nêzikbûn hem ji aliyê derûnî hem jî ji aliyê siyasî ve zirareke mezin dide wateya serxwebûna Kurdistanê.

> Miletê Kurd, miletekî aştîxwaz e; welatê miletekî din dagir nekiriye, miletekî din bi darê zorê nexistiye bin desthilatdariya xwe; ew tenê mafên xwe yên neteweyî, demokratîk û însanî dixwaze; ew tenê dixwaze wek her miletî li ser axa xwe bi awayekî serbest û azad bijî.

Eger referandûma serxwebûnê neyê îlankirin talûkeya herî mezin ew e ku, Başûrê Kurdistanê dibe ku careke din konjonktûreke guncav nebîne. Ji ber ku îro Bexda, Tirkiye û Îran hem ji ber pirsgirêkên navxwe hem jî ji ber talûkeya DAIŞê nikarin bi zimanekî leşkerî li dijî referandûmê derkevin. Ev mijareke gelekî muhîm e ji ber ku heke Îran û Bexda talûkeya DAIŞê kêm bikin, ew ê berê çekên xwe bizivirînin Kurdistanê û ew hêza wan heye ku êrişî Kerkukê bikin. Heşd el Şahbî jixwe nêzî 140.000 milîsên xwe li Iraqê bi cih kiriye. Ji ber talûkeya DAIŞê ev hêzên



> Dijayetiya referandûmê, destê wan dewletên ku li hemberî serxwebûnê disekinin jî bi her aliyî û awayî ve xurt dike. Nêzîkbûneke vî rengî referandûmê dike mijareke siyaseta rojane û referandûmê ji armanca wê dûr dixe. Bi gotineke din, ev nêzikbûn hem ji aliyê derûnî hem jî ji aliyê siyasî ve zirareke mezin dide wateya serxwebûna Kurdistanê.

bi Îranê re girêdayê ne îro nikarin bi rêya leşkerî li dijî referandûm an jî serxwebûnê derkevîn, dema ku talûkeya DAIŞê paş ve çû hem Îran hem jî Bexda wê di demeke nêz de hêzên xwe yên leşkerî zêdetir xurt bikin û li dijî serxwebûnê, bi rêya çekdarî be jî, wê bisekinin. Siyaset gelek caran pragmatîst e û pirsa "wext" gelekî muhîm e. Ji destdayîna derfetekê dibe ku bibe windakirina sedsalekê. Lewre, referandûm îro zêdetir muhîm e û konjonktura Rojhilata Navîn îro ew derfet aniye pêşiya Kurdan. Weke ku aniye pêşiya Rojavayê Kurdistanê.

# Pilingê Serhildana Agiriyê: Şêx Evdirehman



MAHMUT BEGIK

Di dîroka Kurdan de destanên mêrxasiyê gelek in. Mêrxasên Kurdan ketine nava gelek qewimandinan û di hemû qewimandinan de, bi dadwerî tevgeriyane. Heya roja me jî navê wan li ser zimanê xelkê ye, xelk behsa wan dike û xelkê li ser wan kilam gotine. Di nava wan qehremanan de yek jî Şex Evdirehmanê birayê Şêx Zahir e.

Şêx Evdirehman, bi malbata xwe ve ji 120 sal û vir ve, li aliyê Qersê, li Qereceelî jiyane. 6 bira bûn. Şêx Zahir, Şêx Ûsiv, Şêx Elî, Şêx Tahar, Şêx Hebîb û Şêx Evdirehman. Dema şerê Agiriyê di sala 1926an de dest pê dike, ji 6 birayan 5 ji wan di şer de şehîd dikevin û tenê Şêx Evdirehman dimîne.

Eslê malbatê, li gor Şêx Mihemed Emîn kurê Şêx Evdirehaman, di bavê heftan de digihîjin malbata Seyîd Tahayê Nehrî û li gor neviyê wî Mustafa Balbal, eslê wan ji eşîra Şêxbiziniyan e. Ew û birayê wî yê mezin Şêx Zahir, li Aralıka bi ser bajarê Îdirê, di karê xwê de dixebitin. Beriya serhildana Agiriyê karê qaçaxiyê dikin lê piştî General Îhsan Nûrî Paşa tê Agiriyê, polîtîze dibin û dibin parçeyek ji tevgera Agiriyê. Beriya serhildana Agiriyê û piştî serhildanê bi sedan car şer dikin û di hemû şerên xwe de biserdikevin.

Ji 6 birayan du ji wan, di nava wêjeya devkî ya Kurdî de ciyê xwe digirin: Şêx Zahir û Şêx Evdirehman. Kilama bi nav û deng ya "Lê lê Hedê" ya her du birayan e. Hedê, jina Şêx Evdirehman e. Bi giştî, behsa her du birayan dike lê dema Şêx Zahir birîndar dibe, bêhtir bûyera birîndariyê dikeve nava termên kilamê. Şerên wan ên bi navê Şerê Gewgewe, şerê Gola Nawirê, Şerê bo tola Biro Rindo û Şerê Kevirê Bûk û Zava, gelek bi nav û deng in û kilamên wan hene. Di Hezîrana 1931an de, Şêx Zahir, di şer de birîndar dibe. Birîna wî xedar e û nafilite. Şerê wan li Kevirê Bûk û Zava ku bêhtir nêzîkê nevçeya Wanê ya Ozalpê ye diqewime. Rojek berê jî tiliyên Şêx Zahir bi guleya topê birîndar dibin. Çiqas leşkerên ku di wê operasyonê de hene, tên kuştin. Piştî Şêx Zahir, Şêx Evdirehman geh derbasî Îranê dibe û geh derbasî aliyê Tendûrekê dibe. Lê di sala 1932an de, efûyek dertê û Şêx Evdirehman tê li Wanê teslîm dibe.

Dema teslîm dibe, cardin tê darizandin. Di serhildanê de leşkerên ku hatine kuştin dixin stûyê wî û birayên wî. Heya sala 1943an di zîndanê de dimîne. Di sala 1943an de efû dertê. Piştî efûyê wî sirgûnê Sazlıköya girêdayî Sökeya Aydınê dikin. Jina wî Hedê jî li wê derê ye. 5 salan li wir dimîne. Di '49 an de tê Wanê. Kinyas Kartal ku mezinê eşîra Birûkiyan bû, nahêle here Îdirê. 5-6 sal li Wanê dimîne. Paşê diçe Îdirê, gundê Hesenxanê. Wefata wî jî her li wê derê ye. Sal 1989 e.

> Şêx Evdirehman mirovekî xwende û zana bû. Tê bîra min ew girtin û anîn dadgeha leşkerî ya Diyarbekirê. Sal 1971 bû. Bavê min jî di dadgehê de dihat darizandin. Bavê min behsa wî ji me re dikir.

Şêx Evdirehman, mirovekî xwende û zana bû. Tê bîra min ew girtin û anîn dadgeha leşkerî ya Diyarbekirê. Sal 1971 bû. Bavê min jî di dadgehê de dihat darizandin. Bavê min behsa wî ji me re dikir. Şêx Evdirehman sûcê xwe ji hakimê dadgehê dipirse bê çima ew anîne dadgehê. Dadger Serpel (Yüzbaşı) Hamdi Sevinç, bi rêya werger jê re dibêje ku ew û her 5 birayên xwe, di Serhildana Agiriyê de, leşkerên Tirk kuştine. Dema werger jê re mijarê dibêje, Şêx Evdirehman wiha bersiva wî dide: "Berxê min! Ew ket ber efûya Ataturk. Te niha bo çi ez anim dadgehê?" Zimanê dadger nema digere û wî berdidin. Şêx di dagehê de bi Tirkî neaxive.

Li ser kesayetiya wî, min ji gelek kesan pirsî bê gelo Şêx Evdirehman mirovekî çawa bû. Bekirê Îdirî wiha got: "Min tim jê dipirsî û wî ji min ra salix dida. Mirovekî kubar bû. Dihat gundê me. Heya te ew dawet nekira, nedihat mala te. Dema tu biçûyayî mala wî, çaya wî ji ser kêm nedibû. Mirovekî efendî û maqûl bû. Ew sirgûn bûbû. Gelek eziyet dîbû. Westiya bû."

Mistefa Balbal: "Dema ez biçûk bûm kalikê min Şêx Evdirehman dihat mala me. Ji bavê min re behs dikir. Wexta dihat gund, belkî sed mêr lê diciviya. Kesên ku 20-30 salan jê mezintir bûn li hember wî li ser çokan rûdiniştin."

Pirtûkek bi taybetî li ser malbata wan hatiye nivîsandin. Ew jî ji aliyê nivîskar Eliyê Evdirehman ve bi navê "şer di çiyan de", di sala 1989an de hatiye weşandin.

Tenê dixwazim behsa bûyerekê bikim ku neviyê wî ji min re gotibû. "Şêx Evdirehman û Şêx Zahir di gundê Dîkme re derbas dibin. Li aliyê Bêgiriyê û Çaldiranê. Birayê wan Şêx Tahir zahf nexweş bûye. Ji mixtarê gund re dibêjin bila li cem wan çend rojan bimîne belkî piçek baş bibe. Mixtar qebûl dike lê yek ji gundiyan diçe giliyê wan li qereqolê dike. Em dewama bûyerê ji devê neviyê wî Mustafa Balbal guhdarî bikin:


"Serpel (yüzbaşı) Îbrahîm fermandarê qereqola Gulesorê bûye. Di qereqolê de 150 leşker hebûne. Radike 150 eskerê xwe û tê dora gundê Dîkme digire. Şêx Tahir digirin û wî dikujin. 2000-3000 gule berdidin bedena wî. Piştî sê rojan Şêx Zahir û Şêx Evdirehman bi ser qereqolê de digirin. Her 150 eskerên di qereqolê de ne dikujin. Ne bi sîlahan li eskeran dixin, bi xenceran wan dikujin. Ji wê derê sînorê Îranê derbas dikin û diçin nava eşîra Milan. Niha gora Şêx Tahir li gundê Dîkme ye."

Jiyana Şêx Evdirehman jiyaneke balkêş e û hêja ye ku li serê lêkolînên berfirehtir bên kirin.

> Ew û birayê wî yê mezin Şêx Zahir, li Aralıka bi ser bajarê Îdirê, di karê xwê de dixebitin. Beriya serhildana Agiriyê karê qaçaxiyê dikin lê piştî General Îhsan Nûrî Paşa tê Agiriyê, polîtîze dibin û dibin parçeyek ji tevgera Agiriyê. Beriya serhildana Agiriyê û piştî serhildanê bi sedan car şer dikin û di hemû şerên xwe de biserdikevin.





KADİR KARAGÖZ

## Mafên ajalan û oldarên me

Do êvar hevalekî min, gelek bi hestîyarî, hema beje kelogirî, dîmenek şanî min da. Di wê dîmenê de mirovekî (navê wî mirov e) noginek bi kendireke kin girê dabû û bi tupê qazê û tehtekî mezin li nava serê noginê dixist. Ne carek ne du car, oreora gayê kezeba min peritand. Cihê revê jî ji wê heywanê kerr û lal re tine bû. Bêçarebûna wê dile min êşand, min video neqedand, nîvco hişt û girt. Me xweza bi awayekî hovane talan kir, daristan şewitand û pirêzeyên genim û ceh ji bo mehsulên duyemîn dan ber agiran. Me cîh û war li ajalan teng kir, herêmên jîyanê li wan serûbino kir, yên ku goşt û şirê wan hebûn kedî û dermal kir îja ev çi zilm û tade ye li van ajalên kerr û lal…

Bi rastî tişta ku ez pir eşandim ev bû ku ev mirovê dilkevir, li gor cil û bergên wî ji Rojhilata Navîn bû û qaşo misilman bû. Li Rojhilata Navîn, li erdnîgariya ola Îslamê ku em dibêjin dînê rehm û hezkirinê ye ev tişt çawa mimkun e, min xwe xwar. Bangeke min heye gelî oldaran; heta hûn karin pesnê pîrozbûna deveyê Pexember Mihemed, kerê Nebî Îsa, hêştira Elî û seyê Eshabê Keyf bidin lê bi rastî hûn li gel ajalên îro gelekî xedar in. Elamet û şopa rehmê di we de tine, xwe rast bikin.

Hûnê bejin; lo lawo rojê bi sedan însan têne qetilkirin li van waran, tu behsa işkenceya li gaye dikî. Rast e, lê bi min ti ferq tine, mirov kîn û xerezên wan bi hev re hene, danûsitendinên wan hene, nakokiyên wan ê menfîetê hene, îja ev heywanê kerr û lal?

Erê ez li ser gotina xwe me, ti ferq tine ye. Binêrin, wek hûn dizanin Daxuyaniya Mafên Ajalan di Cotmeha 1978an de li Parise li navenda UNESCOyê, li Qesra Fontenoy hatiye îlan kirin, di xala yekem a wê daxuyaniyê de dibêje: ''Hemû ajal li gel jiyanê wekhev dizên û xwediyê heman mafê hebunê ne (All animals are born equal and they have the same rights to existence.)" Divê mirov bi ti rengî xwe ji wan bilindtir nebîne. Divê mirov xwedanaqilbûna xwe li ser wan neke amûra tade û zilmê, aqilê xwe ji bo xizmet û parastina wan pêşkeşî wan bike. Ev jî xala duyem a daxuyaniya mafên ajalan e: ''Man, like the animal species, cannot assume the right to exterminate other animals or to exploit them, thereby violating this right. He should use his conscience for the service of the animals"

Mirov, dewlet û saziyên rojavayî di mijara mafên ajalan de di asteke çêtir û bi rûmettir de ne. Bi taybet Awustralya nîmûneyeke bêhempa ye. Hemû tevgerên hikumetê bi xwezayê re bi aheng in, ji bo ku darekê jî ji cîh neke dikare rêyekê li dor çiyayekî re bifitiline. Îro mirovên rojavayî di vê mijarê de ji me pir bêtir xwedî hesasiyet in. Li ser navê xwe bibêjim; dilê min dibije vî halê wan, heta ez ji wan dihesidim. Çi nakokiyeke dijwar e, 1400 sal berî daxuyaniya UNESCOyê di Qurana pîroz de, sebeba helaqkirina qewmê Semûd tadelêdana deveyeke mê tê nişandan. Wek hûn jî dizanin Salih pêxember hişyariyê dide qewmê xwe da ku xerabiyekê bi vê deveyê nekin lê mixabin qewmê Semûd di ser xwe re diçe û lingê devê jê dikin. Li gor kitêbên pîroz Xwedê wan bi ewrekî reş û sewteke bilind helaq dike, vî zilma wan ji wan re nahêle. Ev mucîze çebûye an na mijara bawermendiyê ye, kî bawer dike nake ew zane lê ka em binêrin li Rojhilata Navîn îro bi firokeyên şer ji asîmanan agir dibare, qêrîn belav dibe û ji bajarên me dûmanê qetranî ber bi asîmanan ve hildikişe ma ev bêsebeb e? Kî ji me zane ku ev ne xezeba perçiqandina serê wê noginê kerr û lal e…

Keda 11 salan:

# Weşanxaneya Do

GÖNÜL GÜN

Rewşa sîyasî ya dawîn karîgeriyeke xerab li ser gelek beşên kar û xebatên Kurdî kir. Di nav van kar û xebatên ku rastî bandora nebaş a vê heyamê hatin weşanxaneyên Kurdî ne. Weşanxaneya Do jî ku ev heyameke dirêj e xebat û xizmeta xwe ya ji bo ziman, wêje, çand û hunera Kurdî berdewam dike, ji ber rewşa heyî pirsgirêkên aborî dijî û di rojên zor û zehmet re derbas dibe. Do, ji bo çareserkirina pirsgirêka aborî ev demek e kampanyaya pirtûkan daye destpêkirin. Xwediyê Weşanxaneya Do Hüseyin Gündüz di derbarê xebat, rewşa weşanxaneyê û kampanyaya ku bi rê ve diçe de ji Heftenameya Basê re axivî.

**Keda 11 salan**

Weşanxaneya Do 11 sal berê dest bi weşanê kir û di weşangeriya Kurdî de ciyê xwe girt. Hüseyin Gündüzê ku beriya Weşanxaneya Do ava bike, bi salan di ragihandina Kurdî de kar kiriye, dibêje: "Min di 14 saliya xwe de ku sala 1989an bû bi belavkirina rojnameyê dest bi vî karî kiribû. Salên piştî wê jî dîsa bi belavkirina kovarên wek Rewşen û bi belavkirina kitêbên weşanxaneya Melsa, bi belavkirina kasetên NÇM û rojnameya Azadiya Welat. Piştî re jî bi salan nûçegihanî û berpirsiya -çend caran navê wê guherî nayê bîra min- Özgür Gündemê. Piştî re min li du bajaran pirtûkfiroşî kir lêbelê her min dixwest dest biavêjim weşangeriyê. Ew ji bo min karekî pîroz bû. Bi vê fikrê li Stenbolê sê salan li weşanxaneya Elma xebitîm. Piştî ku Elma jî hat girtin, min biryar da bi serê xwe vî karî dewam bikim û min di sala 2006an de dest pê kir."

**235 pirtûk ji Do yê derçûne**


Do heta niha 235 pirtûk di kategoriyên cuda de bi Kurdî û bi Tirkî gihandine xwînerên xwe. Gündüz di derbarê pirtûkan de van agahiyan dide, "Heya niha di her kategoriyê de kitêb hatine weşandin. Bêhtir kitêbên folklorîk hatin çapkirin. Helbet di Kurdî de roman, helbest, çîrok, kitêbên gramerê, ferheng û gelek xebatên din hatin çapkirin. Lê belê kitêbên ku gelek hêja ne û divê bên çapkirin jî hene lê niha li benda wexta xwe ne. Ji van yek jî ferhengeke Kurdî-Kurdî ye ku her gotinên di nav de bi salan li herêma Botan û Behdînan hatiye berhevkirin, ferhengeke gelek berfireh e. Dîsa wek gramera Mele Yunis ku berî xebatên mala Bedirxanan hatine çapkirin. Û di Tirkî de jî dîsa him lêkolînên baş hatin çapkirin û him jî xebatên edebî." Wekî din, Gündüz wiha behsa pirtûkên ku ji zimanên din hatine wergerandin dike, "Wek mînak me Cîhana Sofî çap kir û di demeke kin de çapa yekem xelas bû. Li ser "Ezdiyên Serhedê" ku ji Rûsî ji aliyê Ezîzê Cewo ve hatibû wergerandin, kitêba Pîr Dîma hate çapkirin. Helbestên Pûşkin hatin çapkirin. Dîsa ji Erebî kitêb hatin wergerandin û li ber destan e ku bên çapkirin."

**Do kampanyaya '40 pirtûk 100 Lîreyê ' da destpêkirin**

Weşanxaneya Do ji ber pirsgirêkên aborî ev demeke nêzik e ku dest bi kampanyaya pirtûkan kir. Gündüz wiha behsa vê kampanyayê dike, "Bi rastî her Kurdek bi Kurdê din ve girêdayî ye û piştî re bi dinyayê re. Ev rewşa aborî ji sala çûyî dest pê kir. Berî hilbijartinên li Tirkiye, me li ser hev gelek kitêb çapkirin. Bi çapkirina van kitêban weşanxane ket bin deynan. Û piştî re ji ber ku ev derbeya li Tirkiyeyê çêbû firotina kitêban jî sekinî. Ev salek e min nikaribû heqê kirê bida û bi biryara dadgehê mecbûr mam ku cihê xwe vala bikim. Bi vê re min biryar da ku karê xwe li Mêrdînê bimeşînim ji ber ku ev salek e li Mêrdînê xwendekariyê dikim. Belê barkirina kitêban ji barekî din li ser milê min danî ji hêla aborî ve. Bi vê re min biryar da ku ne di ser pirtûkfiroşan re, yekeyek xwe bigihînim xwendevanan û kitêban bifiroşim. Bi vê min xwest du tiştan bikim; Yek jê bi erzanî xwendevan bigihêjin kitêban, a duduyan ji bi vê rêyê ji tengasiyên aborî bifilitim û weşanxanê li ser lingan bihêlim. Me ji bo 40 kitêbî pereyekî pir biçûk danî; 100 lirayê Tirkiyê. Yanî bi qasî bihayê çar kitêban. Bi vê rêyê gelek xwendevan niha eleqeder in. Ji xwendekarên beşên Kurdolojiyê heta xwendekarên enstîtuyan. Ev baş bû. Bi vê yekê tiştek derket holê. Ji dêvla ku heqê rê bidim herim fûaran û kitêban erzan bifiroşim ezê li cihê xwe û her sal vê kampanyayê dewam bikim ku xwendekarên Kurd bi erzanî xwe bigihînin kitêban. "

### "Ez bi her kitêbê re giriyam an jî keniyam"

Gündüz pirsa me ya, 'Bo Do yê di weşangeriyê de, tiştê herî zehmet di nav 11an salan de çi bû?' wiha dibersivîne," Ji bo kitêban baştir çap bikim min bi pere hinek kitêbên ne baş çapkirin, ev zehmetiya herî mezin bû. Ji 11 salan 6 salên min ez bê mal bûm û li weşanxanê radizam û radibûm ev jî zor bû. Bi her kitêbê re giriyam an jî keniyam. Lê bi her kitêbê re rexneyên bêwate hatin kirin. Mînak min kitêba Siraç Bilgin a bi navê "Barzanî" çap kir gelek kesan got ev êdî bûye Barzanîcî, min kitêbên li ser hereketa PKKê çap kirin gotin na ev ne Barzanîcî ye Apocî ye, min kitêba Hüseyin Kaytan çap kir tiştekî din gotin. Ev zehmetiyek bû. Ji ber ku gelek weşanxane tenê kitêbên aliyekî çap dikin ev rexne tev ji min re hatin. Wekî din jî gelek nivîskaran gotin weşanxane pir pere qezenc dikin em jî weşanxaneyan vekin û vekirin, nizanim dewlemend bûn an na! Belê zehmetiya herî mezin ev bû ji bo min: Ez ji qîza xwe dûr mam û min ew bi tenê hişt ji bilî ku carcaran wê bibînim. Niha mezin bû, bû 9 salî û di nameya xwe ya dawîn de gotiye "bavo ez mezin bibim ezê jî karê pirtûkan bikim."










Siyajîn Aramî:

# "Çîroka çîroka min, lêgerîna Bîra Kurdan e"

BÎLAL ADLIĞ

Di van heyamên dawîn de çend kesayetên hêja li wêjeya Kurdî zêde bûne. Yek ji wan nivîskarên nû û ciwan jî Siyajîn Aramî ye. Siyajîn Aramî xortekî Batmanî ye û li Zaningeha Akdenîz a Antalyayê beşa hemşîretiyê (Perestar) qedandiye. Siyajîn xebatên kovargerî û şêwira pirtûkên Kurdî dike. Di sala 2016an de di emrê xwe yê 25an de pirtûkeke çîrokên Kurdî bi navê Beranê Çargurcik nivîsand û çap kir. Em weke Heftenameya Basê bi Siyajîn re li ser pirtûka wî û xebatên wî axivîn.

Siyajîn çîroka nivîskarî û çîrokbêjiya xwe wiha vedibêje: "Çîrokên ku min nivisîne, gelek ji wan ne çîrokên min in. Jixwe ti carî min ne xwest ku çîrokên xwe an jî ezmûnên xwe yên jiyanê binivîsim. Ev çîrok hemû çîrokên bîra Kurdan e. Çîrokên ku di pirtûka bi navê 'Beranê Çargurçik' de hatine nivîsîn ên me hemûyan e. Armanca min ji roja pêşî ve ev bû ku ez dosyeyeke 'bîr'ê ('bîr'eke hevpar) amade bikim û bîra civakî cardin zindî bikim. Ez yek ji wan kesan im ên nifşa 90î, ji ber vê yekê min hûnandina çîrokan li ser 'memory/bîr' a wê demê saz kir. Di çîrokan de zêdetirî min xwest berawirdkirin, mûqayesekirina 'bîr'a Kurdan a berê û ya niha bikim, fikir û ramanên me yên civakî, şêweya me ya axaftinê û ya jiyanê jî li gorî rewşan diguhere. Her ku dem diguhere, derfet zêde dibin, li ser navê nûjenbûnê em ji nirxên xwe yên çandî dûr dikevin. Di çîrokên min de leheng du-jiyanî ne, leheng di jiyana xwe ya rojane de her çendî li gorî jiyaneke modern bijîn jî, di jiyana xwe ya rastîn de di lêgerîna jiyana xwe ya zarokatiyê ya saf û pak de ne. Hin deng, tam, bêhn, êş, stran, lîstik, xwarin û kes her tim di bîra mirovî de xwedî cihekî taybet in. Mirov nikare ji van hêma û diyardeyên bîra xwe bireve an jî ji wan dûr bikeve. Çîroka çîrokên min lêgerîna kesayetî û bîra kurdan e."

> Nivîskarî ne ew e ku mirov bi zimanekî giran binivîse, ya baş ew e ku bi zimanekî zelal û mînîmalîzekirî binivîse. Her çendî min berhemek weşandibe û weke bernavk nivîskarî jî li min zêde bûbe, xwînerî zêdetir bala min dikişîne.




**"Dixwazim kevneşopî û nûjeniyê bi hev re bixemilînim"**

Siyajîn di dewama axaftina xwe de dibêje, şêweya nivîsînê ya her nivîskarî li gorî wî/ê diguhere. Min weke ku berê jî got armanca min berawirdkirina çîroknûsiya klasîk û nûjen e. Li ser xeteke gelerî pêkanîna çîroksaziyeke nûjen e û wiha pê de diçe: "Min ew tişta ku xwestiye nîşanî xwîneran bidim bi awayekî vekirî û berbiçav vegotiye. Li gorî min nivîskarî ne ew e ku mirov bi zimanekî giran binivîse, ya baş ew e ku bi zimanekî zelal û minîmalîzekirî binivîse. Her çendî min berhemek weşandibe û weke bernavk nivîskarî jî li min zêde bûbe, xwînerî zêdetir bala min dikişîne. Ji lewre min li ser çîroka Kurdî gelekî lêkolîn kir û xwendineke baş kir li gel wêjeya cîhanê. Bi xwînerîyeke baş ez pêgirî şêweyên nivîsandina çîroka Kurdî û ya cîhanê hatim. Di her çîrokekê de min xwest cûreyek an jî şêweyeke din a çîroka Kurdî bi kar bînim, ji sembolan bigire heta bikaranîna du-sê cûre hemwateyên peyvan. Rast e, sedema vê yekê jî destpêkek û şêweyeke nû ye ji bo çîroka Kurdî. Divê wêjeya me nebe warê 'dubare'yê."

### "Nivîskarî di hundirê xwe de dîlbûnekê dihewîne"

Siyajîn dibêje, ji bo min hin caran nivîsandin azadî ye û hin caran jî malxirabî ye û axaftina xwe wiha didomîne: "Nivîsandin hesteke bêhempa ye. Min azad dike lê ew azadî jî di xwe de dîlbûnekê dihewîne. Her ku ez dinivîsim, ez zêdetir xwe dîl hîs dikim, ji ber ku ez dibim koleyê nivîsên xwe. Peyv min didarizînin di pêvajoya nivîsînê de, ji ber vê yekê ye ku ez xwe bi awayekî vekirî vedibêjim û heta ji min tê zimanekî minîmalîzekirî bi kar tînim." Siyajîn di dawiya axaftina xwe de mizgînî dide xwînerên xwe û wiha pê de diçe: "Em di pêvajoyeke girîng re derbas dibin. Ev nêzî salekê ye ku rewşeke ji bo herkesî bêtam û sekinî li dor me niziliye lê dîsa jî di vê rewşê de xwîneran piştgirî, nirxandin û rexneyên xwe ji min kêm nekirin. Ez jî piştgiriya wan hevalan bi agahiya dosyeyeke nû xelat bikim. Bi heviya rojên xweş û azad."




CIWANMERD KULEK



## Sînor

Argumaneke tevgera Kurd a li Bakur a ji bo dijderketina dewletbûna Kurdan, xwedêgiravî êdî rabûna sînoran e li cîhanê. Li gor vê argumanê sînor mirovan ji hev diqetînin, ji dinyayê qut dikin, di nav xwe de girtî dihêlin fb. Ji ber vê yekê li dinyayê êdî sînor radibin, xwediyê vê argumanê di dûmahîkê de dibêjin.

Ji bilî gerdûnê sînorê her tiştî heye, lê ê gerdûnê jî ne misoger e. Di dinyayê de sînorên hemû dewletan, heta herêm û bajar û gundan hene û du dewletên dinyayê ên sînorê wan herî qehîm di heman demê de du dewletên herî pêşketî ên cîhanê ne: Dewletên Yekbûyî ên Amerikayê (DYA) û Qraliyeta Yekbûyî (Brîtanya). Hetta Brîtanya tevî ku endamekî Yekîtiya Ewropayê bû û xwedî bazara muşterek bû bi vê koma dewletan re, pereyê wan bi kar nediani û wek hin dewletên dîtir ên di vê komê de wê jî pereyê xwe yê cuda bi kar dianî. Vêca pirs ev e: Gelo kîjan welatiyê Amerikayê yan Îngilterê ji Kurdan bêtir ji dinyayê qut e, nikare sînoran bibezîne û here ciyê ku dilê wî dixwaze; ked û pere û pasaporta kîjan ji wan ji a Kurdan bêqîmettir e; kîjan ji wan ji alî azadî, derbirrîn, mafên nasnameyî û kulturî di rewşeke tengavtir de ye; kîjan ji wan ji me Kurdan bêtir mehrûm û mehkûm e? Çima ji kesên xwedî sînor re dinya hemû dikare bibe wek mala wan lê kesên wek Kurdan bê sînor bê mal û war in? Rast e, divê sînor rabin, lê ne sînorên ku te dipêçin, sînorên ku te dabeş dikin divê rabin. Sînorên ku wan biparêzin ji Kurdan re lazim in, ne sînorên ku wan parçe dikin.

Kurdên ku li Tirkiyeyê bê sînor dijîn hê dibistaneke wan a seretayî a bi zimanê wan tine. Lê Tirkên xwedî sînoran li derveyî sînorên xwe ji dibistanên xwe hene. Wezareta Perwerdehiyê a Tirkiyeyê her sal bi hezaran mamosteyan dişîne welatên dereke ên ku Tirk li wan dijîn, ji bo ku li wê derê dersên ziman û kultura tirkî bidin zarokên malbatên Tirkan ên li wan welatên xerîb dijîn, û bi pereyê Kurdên bê sînor vê dike. Dewlet ji bo vê yekê meaşekî li vir meaşekî jî li dewleta ku dişixule dide wan mamosteyan. Gelo di vir de sînor çiqasî mirovan ji hev, ji koka xwe, welatê xwe, rabihuriya xwe diqetîne? Gelo niviskarekî dewleta Luksembûrga nifûsa wê 600 hezar, ê ku here kê derê cîhanê tevî konsulxane û xizmetguzariyên dî di bin parastin, ewlekarî û hêsankariyên dewleta xwe de ye û bi nasnameya xwe tê naskirin û qebûlkirin bêtir xwedî azadî, cîhanîbûn û îtîbarê ye yan nivîskarekî Kurd ê ku saeta ku ji mala xwe derdikeve ne xwedî nav e, ne xwedî nasname ye, ne xwedî xerîte ye, ne xwedî sazî û sazûmaneke welatî ye û ne jî dikare li bin navê xwe navê welatê xwe bide nivîsin –dema bide nivîsîn jî ne dikare wê bike heqîqet ne dikare bide bawerkirin? Gelo kî ewqas kawik e bawer bike ku Kurdistan heye eger di ti balafireke ku hûn lê siwar bûne de bi zimanê we anonsek nehatibe kirin?

Sînor bi têlên direhî, rêsayî, mayîn û dîwaran nîgaşeke sik tîne hişê mirov. Lê gelo sînor têl û dîwar in? Li sînorê me yê Binxetê têl û dîwar û mayîn hene, lê li sînorê Îranê û Iraqê yek ji van jî tine. Gelo em ji kîjan parçeyan bêtir qutbûyî ne, ji ê bi têl û mayîn yan ên rût û tazî? Li sînorê rût û vala ê Îranê her sal bi sedan Kurd tên kuştin, û li piştî wî sînorî jî bi dehan Kurd tên daliqandin, bi sedan tên girtin û îşkencekirin. Gelo we bihîstiye ku rojekê ji bo şermezarkirina van Kurdên li wê derê derabeyên dikanan li Geverê yan Wanê hatine daxistin yan li Diyarbekirê mitîngek bi rê ve çûbe û bi vî rengî di navbera herdu parçeyan de hevxemiyek hatibe diristkirin, nasnameyeke sînortêper hatibe avakirin? Gelo sînor di kê derê re diçe, di erdê re yan di mêjiyan re? Beramberî vê, li ser bûyereke li Tirkiyê ji Ewropayê bigire heta bi Japonyayê jî çalakiyên nerazîbûnê encam didin. Gelo sînor bi têl û mayîn in yan bi dirûşm û partî ne? Gelo dema tu ji warê xwe diqetî û li bajarekî dihêwirî ku newêrî bi zimanê xwe biaxivî û xwe li hember welatiyên dî bi şerm, bi bêbawerî û bêewlehî, bê perr û bask hîs dikî bêtir sînor hene di jiyana te de yan dema li welatekî xerîb ku tu nû hatiyê, çawa ji balafirê dadikevî peyam ji konsulxaneyên welatê te bi zimanê te ji telefona te re tên û dibêjin ku ji bo her pirsgirêka xwe dikarî bi wan re pêwendî daynî? Gelo dema milletek bi saya wezaret, zaningeh, sazî û aboriya xwe piştevaniya pêşdebirina kultur û medeniyeta xwe dike zirarê ji sînorên xwe dibîne yan dema tu bi bê derfetî û bê darûpişt xwe diçirrînî ku tiştina biafirînî, lê çiqas dikî jî ber nagire, xêrê ji bêsînoriya xwe dibînî?

Welhasilî kelam, meseleya azadî, pêşketin û ciyawaziyê ne hema yekser qebeheta sînoran e. Hetta di nebûna wan sînoran de partî, rêxistin û ferasetên ku xwe ji her tiştî bihêztir û meqbûltir û pêwisttir dizanin derdikevin û ji dêvla ku mirov bibe welatiyek mirov dibe partîzanek, ji dêvla ku civak bihêz bibe partî bihêz dibe, ji dêvla ku şexs giring bibe serok pîroz dibe, ji dêvla ku cudatî û rengînî şax vede peyrewî û şopînerî gurr dibe. Gelên bindest zêde luksa wan tine ye ku xetayan bikin. Bi raya min me têra xwe xeta kirin, êdî lazim e em ji xetayên xwe û ên xelkê dersan fêr bibin. Tiştên ku ji me re ne lazim in û ne bi kêr in nekin bela serê xwe. Kengî mirov bibêje bes e tarîxeke nû dest pê dike.

Riha;

# Paytexta sebir û mîstîzmê

MEHMET ALI AYDIN

Mekan, ne tenê ew der e ku em jiyana xwe lê derbas dikin û zikê xwe lê têr dikin e. Mekan xwedî taybetmendiyeke wisa ye ku raborî heta roja me bi xwe re anîne. Teorsîyenê Marksîst ê navdar ku doktoraya xwe li ser avahîsazî û plansaziya bajarwaniyê kiriye, mekanê bi tevnê têkiliyên civakî ve girê dide, watedar dike. Mekan, rasterast jiyan bi xwe ye ku guhertin û şêweyê herî berhemdar e.

Mekan polîtîk e. Li gorî dem û desthilatê guhertin tê de pêk werin jî di navbera wan de têkiliyeke domdarî heye. Nesekin û stabîl e. Bêrawestan diguhere, lê belê raboriyê jî dike hêmana sereke ya guhertinê. Ev hêman in ku hinek ji wan dergûşa pêşvebirina çand, dîrok, hiqûq û hinek ji wan jî ya baweriyê ne. Mîrateya ku ji raboriya xwe wergirtiye ji bo îroj û sibêrojê, li duh zêde û bicih dike. Bajar jî wisa ne.

Bajarên girîng, taybet û qedîm ên cîhanê hene ku binemala Adem serpêhatiya xwe lê neqişandiye. Wek li rojava Roma û Stenbol; li rojhilat jî Medîne, Îskenderiye û Qûdis. Ew bajarên herî kevn ên cîhanê û axa bavûkalan a mirovahiyê ne. Wek Rihayê.

**Bajarê herî kevn ê cîhanê**


Her çiqas heta niha dîroka damezirandina vî bajarî nehatibe tesbîtkirin jî Riha li gor lêkolînên arkeolojîk ji bajarên herî kevn ê cîhanê ye. Li gor rîwayetan Hz. Adem û Hz. Havva li vê derê jiyane û bi çandina genim ji bo cara yekem jî dîroka cotkariyê li vê derê dane destpêkirin. Dîroknasê navdar Ebûl Farac îddîa dike ku piştî tofana Nûh yekem bajarê hatiye avakirin Riha ye. A teqez ev e: Li gor lêkolîn û vekolînên li tevahiya bajêr hatine kirin û encamên ku hatine bidestxistin, ev ji wan herêmên ku mirohavî lê bicih bûye û jiyaye ye. Ji ber wê yekê ne rasthatinek e ku herî zêde vekolînên arkeolojîk li vî bajarî pêk hatibin.


Riha bajarekî qedîm e ku bi dîtina encamên arkelojîk ên nû dîrokê ji nû ve dide nivîsandin. Peykerê herî kevn ê cîhanê li nêzikî Gola Masiyan (Balıklı göl) hatiye derxistin.

Perestgeha heri kevn jî li vî bajarî ye bo nîşanî me bide vehûna mîstîk ya îroj ne rasthatinek e. Wek çawa ku zaningeha yekem a cîhanê di nava sînorên vî bajarî de, li Heranê ye. Dibe ku gelekan ji me ev mîrate nedîtibe lê balê cîhanê kişandiye. Ev her du mîrate di nava Mîrateyên Çandî yên Cîhanê de ne. Bi navdariyeke mafdar, cîhan vî bajarî weke 'Bajarê Muzeyan' bi nav dike.

Riha bûye xaçerêyeke leşkerî û bazirganiyê û bûye pirek di navbera çandên rojhilat û rojava de. Ev erdnigariya wê mîrateyeke giranbuha ya çandî li dû xwe hiştiye û bûye cihekî ku hemû şaristanî lê hatine neqişandin. Ev bajarê rûhanî û qedîm ku lê olên piryezdanî (polîtezîm) û tekperestî (monoteîzm) li hev civiyane, navenda çand û baweriyan, warê pêxember û ewliyayan, hê jî îlhambûna xwe ji bo mîstîsîzm û otantîzmê berdewam dike.

> Riha bûye xaçerêyeke leşkerî û bazirganiyê û bûye pirek di navbera çandên rojhilat û rojava de. Ev erdnigariya wê mîrateyeke giranbuha yê çandî li dû xwe hiştiye û bûye cihekî ku hemû şaristanî lê hatine neqişandin.





**Bajarê pêxemberan**

Li gor dîroknasê navdar ê Ereb Ebûl Farac Riha ji wan yekem bajaran e ku piştî Tofana Nûh hatiye avakirin. Hz. Îbrahîm li Riha ji dayîk bûye, li vê derê bi Nemrûd re ketiye têkoşîneke ewsaneyî. Hz. Yakûb ji xezeba birayê xwe Ays reviyaye û li Heranê bicih bûye, bi keça xalê xwe re zewiciye û 15 salan li vê derê şivantî kiriye, kurê wî Hz.Yusif di du saliya xwe de koçî warên Kenanê kiriye.

Cihûtî û Xirîstaniya rojhilat kesên ku serdana Heranê dikin weke 'hecî' qebûl dike. Ji ber ku Hz. Îbrahîm, Hz. Yakub û Hz Musa li vê derê jiyane, Musewî di wê baweriyê de ku ev der di nav axên hatine weatkirî de dimînin.

Li gor Xirîstiyanan, Hz. Îsa vî bajarî teqdîs dike. Desmala Pîroz ku emaneta herî pîroz ê Xirsîtiyaniyê ye û weke Kefenê Pîroz jî tê zanîn, aîdê Riha ye û li Muzeya Torînoyê ya Îtalyayê tê parastin.

Ji bo misilmanan jî Riha bajarekî Îbrahîmî û Eyûbî ye. Hz. Eyûb ku ji binemala Hz. Îbrahîm e, ji warên Şamê tê, li bajarokê Eyûb Nebî bicih dibe. Li herêmê dibe siltanê sebrê û li wê derê tê definkirin. Hz. Elyesa ji bo ku Hz. Eyûb bibîne tê vê derê, wî nabîne û li bajarokê Eyûb Nebî tê definkirin.

Hz. Musa piştî ku li Misrê Kiptiyekê dikûje, tê bajarê Antîk ê Şuayîb, xwe dispêre vê derê, li cem Şûayîb Pêxember dimîne û şivantiya wî dike. Asayê xwe yê navdar jî ji wî digire û derdikeve çiyayê Tûr.

Bajarê Heranê ku dîroka wê digihije Beriya Mîladê 7000an û 48 km dûrî navenda Rihayê ye, warê Hz. Îbrahîm e ku 3 olên semawî qebûl kirine.

Riha ku ji bo rêberên olî bûye warek, ji ber ku wan cihên pîroz ên li wan tên îstînadkirin jî di nav xwe de dihewîne, weke bajarê pêxemberan hatiye binavkirin.

**Şahbanûyên Amazonê li Rihayê ne**

Li tevahiya bajarê Antîk Edesa ku nêzî gola Xelîl-ur Rehman e, gorên ku nivîsên bi Suryanî û Grekî û rolyef û mizaîkên ji serdema ewilîn a Romayê mane hatine dîtin. Li Baxçeyê Halebî (Haleplî Bahçe) ku nêzî Gola Masiyan e, qesreke 13 odeyî, li tevahiya qesrê zemîna mozaîkkirî hatiye dîtin.

Mozaîkên Şahbanûyên Amazonê ne ku li cîhanê cara yekem di heman dîmenî de hatine nîgarkirin, denvedaneke mezin kiriye. Tê texmînkirin ku ev mozaîk Piştî Mîladê di sedsala 3. de hatine çêkirin. Ev mozaîk bi teknîk, huner, bi mezinahiya xwe ya 4 mm'yî û bi ziraviya xwe xwedî nirxeke giranguha ne. Ji kevirên resen ên Çemê Feradê hatine çêkirin. Mozaîk niha bi awayekî zêde di rewşeke baş de ne.

Di mozaîkên ku hatine dîtin de taswîrên Xwedawenda parêzvan a avahiyan Ktîcîc, Aşîlê lehengê şerê Truva, Kenteor Khîrîon ku mamosteyê Aşîl e û weke 'zilamê ji giha' tê zanîn, Xwedaya deryayan û dayîka Aşîl Thetîs, xwediyê fikra Hespê Trûva Odyesses jî hene.

Mozaîkên herî kevn ên cîhanê ku ji sala 3400an Beriya Mîladê mane li Girikê (Höyük) Haseka girêdayî Sêwregê hatine dîtin û li lîteratûra arkeolojiyê zêde bûne. Hê jî pir zêde mozaîk ku li benda kifşkirinê ne di bin axa vî bajarî de ne.

Em nivîsa xwe ya li ser bajarê qedîm Rihayê ku cihê şaristaniyan, paytexta xweşbînî û mihabetê, cihê ku Hz. Îbrahîm comerdiya xwe lê çandiye, Hz. Eyûb sebra xwe lê avdanî kiriye, bidomînin.

> Bajarên girîng, taybet û qedîm ên cîhanê hene ku binemala Adem serpêhatiya xwe lê neqişandiye. Mîna li rojava Roma û Stenbol; li rojhilat jî Medîne, Îskenderiye û Qûds. Ew bajarên herî kevn ên cîhanê û axa bavkalan a mirovahiyê ne. Wek Rihayê.

## Gencîneyên me yên çandî

Li bajarê Rihayê di serî de 329 malên ku ketine binê parastinê, 39 mizgeft, 12 xan, 15 pir jî di nav de gelek berhemên dîrokî hene. Li bajêr bi giştî 1100 berhemên dîrokî hatine tescîl kirin.

Berhemên giştî yên Rihayê: Keleha Rihayê, Mizgefta Mezin, Dergaha Mewlîd – î Xalid, Gola Masiyan, Şikefta Hz. Eyûb, Xana Gumrikê, Bazarên Girtî, Benda Çemê Karakoyunê, Pira bi Xizma, Xana Dîrokî ya Milet, Dêra Rejî, Mizgefta Selahaddîn Eyûbî, Kûleya Mahmûdbeg, Textê Nemrûdê (Der Yaqûb), Herran û Keleha Herranê, Mizgefta Mezin a Herranê, Girikê Herranê, Tirba Şêx Yahya El – Herranî, Malên Herranê, Tirbên Mela Bakir û Cebir el – Ensar, Kerwanxaneya Han El-Ba'rûr, Şikeftên Bazdayê, Bajarê Şûayb, Xirabeyên Sogmatlarê, Keleha Çimdînlî, Kelaha Bîrecîkê, Kerwanxaneya Çarmelika, Girikê Sultantepe, Girika Titris, Girikê Newalîçorî, Girikê Şaşkan, Girikê Lidar, Girikê Sogutê, Girikê Hasek, Girikê Qurbanê, Girikê Gobeklîtepe- Gurcutepe, Girikê Tilmûsa-Tilbaş çend berhemên dîrokî yên Rihayê ne ku hatine tescîlkirin.

## Navê Rihayê ji ku tê?

Li gor Kamus-ul Alam navê Riha yê berê 'Ur' an jî 'Urelkeldaniyan' e. Piştî fethkirina Îskenderê Mezin, Makedoniyan ev bajar şibandine bajarokê 'Edessa' yanî 'Vodîna' ya li welatê xwe. Bajar weke 'Kalîroe' ku tê wateya 'Çemên wê xweş in' binav kirine. Ereban jî weke 'Ruha' binav kirine.

Li gor Fîkret Işıltan, Riha ku di serdema Îslamê de weke 'Diyarî Mudar' dihat binavkirin, navê 'Osrhoene' ku di serdema Qraltiya Osrhoeneyê de dihat bikaranîn, piştî ku bajarê Rihayê ji aliyê Makedonan ve bi navê 'Edessa' dîsa hat damezirandin, tê texmînkirin ku ji navên beriya wê yên bi zimanê Suryanî 'Urhai/Orhai' û ji navê Erebî 'Er Ruha' hatiye latînezekirin. Li gor salnameyên Helebê bajar heyameke kurt wek Antiokya/Antakya bi nav kiribin jî, li gor Prof. Segal, (Antioch Callirohae) ku li ser sîkkeyên Antiochusê IV. ku Beriya Mîladê 163an de miribû, dibe ku aîdê bajarekî din be.

Li gorî ewsaneyekê jî navê Rihayê ji navê Nemrûd ê din ku tê wateya 'li cihê avî' ji 'Urhai' kurê Hewyayê tê. Wateya Urhai ya 'bajarê çemên xweş', bajarê li ber çemê Edhessaisos ê Makedonyayê û navê vî bajarî ku paşî girt, Vodîna ku di imanê Makedonî de tê wateya avê û her wiha Kalliroe ku tê wateya 'çemên xweş' li holê ye. Her çiqas li ser çavkaniya navê Rihayê encameke teqez bi dest neketibe jî hemû rîwayet 'Av' ê nîşan didin.

Dîroka Rihayê ya belgefîlmî ji Beriya Mîladê salên 2000î ji Hurrî-Mîttaniyan dest pê dike. Paytexta vê dewletê Vaşugan (Resul Ayn) bû. Di vê serdemê de Riha bûye navendeke çandî ya mezin. Paşê bi koçên dîrokî yên mezin re, Sumer û şaristaniya wan serweriya xwe pêk aniye. Li Riha û derdora wê şaristaniyên Sumer, Akad, Elam her wiha Keldanî, Hurî, Mîtanî û şaristaniyên Asûr jî hikûmraniya xwe ava kirine.

Riha ku di bin serweriya Ebla, Akad, Sume, Babîl, Hîtît, Hurî-Mîtanî, Aramî, Asûr, Pers, Makedonya, Roma, Bîzansê de ma, sala 1094an li axa Selçûqiyan hat zêdekirin û 1098an jî ketiye bin îdareya Kontnîşîna Haçiyan.



